MERWAN BEREKAT

# *EFRÎN*
# *DESTANE Û BIRÎN*

**Roman**

Amadekirina qabê: Xelîl Îbrahîm

Çapa yekem 2018z - 2630k

Amadekirina Çapê:
Sersera (Dr. med. Bashar Moustafa)
www.sersera.com

SerSera

Mafê çapê parastî ye.

# Diyarî

*Romana ``EFRÎN DESTANE Û BIRÎN`` diyarî hemû azadxwez, aştîxwez û mirovperwerên cîhanê dikim.*

*Miletê bê azadîxwez mejiyekî pûç e*
*Cîhan bê aştîxwezan daristana dirindeyan e*
*Mirovperwerî jêdera azadî, dadmendî û rastiya cvakê ne.*

Merwan Berekat

*Li JÎNISTNA pîroz*

*Niştecihên erd û ezmên gihane hev*

*Ronahî pevgirêdana wan e*

*Xapînokiya demên berzer*

*Li nava çerxên çavsor hatiye gerandin*

*Di kûzên xewn û xeyalan de*

*Nema hêvî celq dibin.*

Milek Zagros û yek jî Amanos e, du memikên jiyanvejînî Ferat û Dicle. Bihuşta gozemîn, landika şaristaniyê û telbîsê zîldana hebûna mirovahiyê KURDONÎS bû.
Qada xwedêwendên evîn, ceng, siruşt, bahoz û wargeha vejînê KURDIYALÎ bû. Di vê bihuşta pîroz de niştecihên erd û ezmên gihştine heve û ronahî pevgirêdana wan e. Belê Zardeşt ne kurê xeyalê bû.
Li peravên av û çemên pîroz, di nav zêrîniya zeviyên gênim de û di paşela daristanên ku ji hilma dêrîniyê hatine avdan de, xwedêwendan efsan û destane li ser zimanê dîrokê nîgar kirine. Îro jî wek duh dîrok bejna xwe li pêş lawên ronahiyê xûz dike û bûyeran ji nifşên siberojê re dixe berîkên xwe.
Dîrok bi xwe parek ji pîroziya vê axê ye û Kurd jî ji berên dîroka vê axê ne. Belê; rastiya lawên rojê yek ji rastiyên Xwedêyê gewre ye. Gelek ramûsanên Xwedê ji ezmên weşiyan û Kurd ji zîldana wan ramûsan in.
Xwedêwend bûn? Erê... û belkî jî na. Hin bi yeknav û hin jî bi pirnav bûn. Hin dilsoz bûn û hinan jî konikê tirsa jiyana duyem di giyanan de dihûnandin.
Hooo cîhana bêbext! Çendî dîwarên tariyê li pêş pertavên rojê bên bilindkirin û aso bi rengine xalîkî bilewite, lêbelê tucarî berbang û roj bi paş de nazêvirin. Hertim tarî li pêş ronahiyê têkçûye û wê jiyan geş kiriye.

Vedengên dîrokê ne hertim li gor delx û meraqên mirov in. Hertim aliyek ji dîrokê bi xwîn e û gunehê mezin jî di stiwê zordar, nijadperest û xwînrêjan de ye. Li ber deriyên perestgehan mirov jî dibûn qurbanî.

Lawên Rojê ne çîroka dîrokeke bê dîrok in, dîrok di landika KORDONÎSÊ de hate vejandin û hîn jî lêvên wê ji memikên Kurdiyaliyan têr nebûne. Erê; nerastî nikare xwe li nava ronahiyê bigerîne. Lê ku mejiyê mirov bibe dîlê tariyê, hîngê parek ji jiyanê tê nişkekuştin.

Bîna xwînê her di pozê "Adînos" de bû, hîn jî bîn û rengê xwînê ji hin çeman nehatine şuştin. Lê "Eşterûtê"[1] li KARDO[2] tovên evîn, zanîn û aştiyê diçand. Hîn jî li Çiyayê Kurmênc jin (Eşût) tên binavkirin.

Hooo tarîperistino…! Ma mejiyê we ji beravêtina xewnine kufikî hatiye avdan?!

Ew dostaniya we bi tariyê re bila ya we be. Lê pertavên ronahiyê di berîkên reş de sindif nabin û neviyên ronahiyê yên berbanghez baş fêrî jiyanê bûne. Ev der jînistan e.

Ronahîperest ji berê **"K"** û çar xwîşkên wê ne. A: Arî ne…

**R**: Rojperest in…

**D**: Dêrîn in…

**O**: Oxilê şaristaniyê ne. Belê; lawên royê nayên

*1- Aşterût: Xwedêwend Eştar e.*

*2- Kardo: Ji navên Kurdistanê yên kevnar e.*

veçengandin. Ev der hêrsvejîna Kkurdoxiyan e.

Nêçîrvanê zîrek "Temoz"[1] perçak ji xweşikbûna "Eşterûtê" bû. Belê "Gilgamêş" dîdevan bû. Xweşikbûn, bedewî û çelengiya XORIYAN baweriyên Axnaton[2] jî serûbin guhartin. Belê; geliyê Qiralan belgenameya wê firkê ye û firkên dîrokê ji gavên rojperestan peyda bûne. Li gora Nefirtîtiya Mîtanî bigerin, ew perçak ji nasnameya wan firkina ye.

Belkî rast be, ku "Afrodît" ji kefa deryayê hatibe afirandin, lê "Felekan" ji fermandarê êgir, ceng û lêdanê revî. Li KURDONÎS[3] tîrkevanê çavên nêçîrvanê jîr û çeleng "Temoz" dilê wê revand û herdu radestî evîndariyeke bê dawî bûn. Belê; di nav lêvên çiyan û hemêza Kurdonîsê de yekem car evîndariyê çîk da û jiyan bê xwînrijandin hate serastkirin û hîn tarî ji wê serdemê bi tirs e.

Pir caran berazan riya xwe bi vê bihuştê xistin û şopên xwînî li pey xwe hîştin. Pir karwanên talanker, pêjnên revoke û siha dûmanên ziwa û jînkujer jî di newqa welatê bawermendên rojê re bê şop derbas bûn.

*1- Temoz: Navê xwedêwendê ku evîndarê Eşterûtê bû.*

*2- Axnaton: Navê qiralekî Fer`oniyan bû. Wî keça qiralê Mîtaniyan (Nefrotît) ji xwe re xwest û bi wê xwestinê aramî di navbera dewleta Mîtanî û Fe`onyan de çêbû.*

*3- Kurdonîs: Yak ji navên Kurdistanê yên kevnar e.*

Hinan rengê tariyê ji gewriya xwe dadirivandin, hinan bîn ji mejiyên xwe yên kufikî di berîka demê de berdidan û hinan jî hewil didan ku bi kulekoriya xwe deriyê perestgehên pîroz qirêj bikin. Lê tev di geliyê dîrokê yê tarî werbûn û tenê rojperest man hêvanê jiyanê.

Hîn gerdenê çîrokên evîndariya xwedêwendan di stiwê çerx û serdeman de birîn û şahiyan nîşan dide. Fermandarê şer xwe xiste çermê berazekî çolane û jiyana "Temoz" berve nemiriyê têve da. Li vî welatî jiyan ne ji kûzên dîrokeke derewîn hatiye herikandin. Ev der sîngê memikên jiyanheziyê ye.

"Afrodît"[1] bi nênûkan memikên xwe qepirandin û li şûna dilopên xwînê kulîlk bişkuvîn, hîn jî Efrînî dibêjin "bûkmezave"[2] . Belê; ronahîperest nîşana buharan in û hûn dikarin nameyên avdaran bixwînin.

Pîroz e… KURDISTAN. Li ber kaniya Sipî[3] gelawêj xast û tazî meşî û li şûna rawestandina qeyîqa serwerê heft ferişteyên jînafrandinê lêvên xwe pîroz kirin.

Perestgeha Ahoramezde li her sibehê bi ava gola Endarê[4] avdasa jiyanê dikir û Tîşopiyan[5] li ber peravên çemê

*1- Afrodît: Navê xwedêwendekê ye.*

*2- Bûkmezave: Navê kulîlkekê ye û demsala Buharê, meha Avrêlê çêdibe.*

*3- Kaniya Sipî: Li Laleşê ye.*

*4- Gola Endarê: Li başûrê bajarê Efrîn ye.*

*5- Tîşop: Navê qiralekî dewleta Mîtanî ye.*

Efrînê ligel ferişteyan nimêja rastiyê diyarî paytexta ezmên dikirin.

Dilovan e KURDONÎS. Dema ku herdu memikên wê yên jiyanvejînî bûn lêmiştzê, hîngê Cûdiyê pêdar û aştîxwez hemêza xwe ji keştiya bapîrê Birasoz[1] re kire rawestgeh. Gelek name di tomargeha Mezobotamiya de bûn banga jiyaneke nû û helbestên Dicle û Ferêt li ser pertavên rojê hatin hûnandin.

Gavên demê li bejna wê hatin alandin û ji ser herikandina xwe venegerî û hîn jî vedenga wê herikandinê di guhên dîrokê de wek sîmfoniyeke pîr pêl vedide. Ne dûr e; di navkel û paşela çiyan de dîsa siwarên ronahiyê dê nimêja serkeftina jiyanê bikin û ber bi rastiyê rêkevin. Belê; careke din dîrok tê serastkirin.

Hovên sedsala bîst û yekê bi xewnên xwe yên tarî re rêdikevin û hewil didin ku gilîzê hovîtiya xwe di ser pîroziya vê xakê de birjînin û jiyana Kurdistaniyan li gor tariya mejiyê xwe bidin ber dûzanê. Lê navikên wan şaş hatine birîn û di serguyên kîndariyê de hatine veşartin.

Belkî nayê bîra wan ku Nîron[2] di nav serguyê dîrokeke

reş de vegevizî û hîn Roma berve şaristaniyê gav dike.

Dîrok her di hewildanê de ye ku rûpelên xwe ji derew û

*1- Birasoz: Navê neviyekî ji neviyên pêxember Nuh bû.*

*2- Nîron: Navê êmberatorê ku bajarê Roma şewitandbû.*

derewînan paqij bike. Lê hin jî li ber xwe didin ku di riyên derewîn re derbasî dawa dîrokê bibin. Rastiya çîrokên dîrokê bi kirkûtê jiyanhez, rojperest û mirovperweran tên hûnandin. Hîn vedenga Zikreşê[1] Alalaxî[2] ji guhên deşta Hemqê derneketiye… Hîn sirûdên jiyanê yên evîndarên vê axê pîr nebûne… Hîn memikên hebûnê di pêsîra jiyanhezan de pîr nebûne… Hîn, hîn û hîn…

Zagrosî bûn pêlvedana jiyanê û ji zincîra çiyayên Zagros ta zincîra Amanos[3] şaristanî bi xwe re herikandin û hespên xwe yên simkodînî li peravên deryaya Sipî cirîda serkeftinê kirin. Erê… torînên Kurdoxiyan sîngê dîrokê ji xwe re kirin paytext û hevsarê hespên xwe bi koka darên li ser sîngê Toros[4] ve girêdan. Vêca hin guriyên vê serdemê bi bayê xewê re ji xewa zikreşiya bapîrên xwe yên xwînrêj hişyar bûne û dixwezin qirêjiya xwe li ser vê xakê daweşînin.

Bajarê Efrînê di hemêza xwe ya dilovan de zarokên royê ji memikên siberojeke azad dimêjandin. Rojdar ji xwe rabû pencereya oda xewê vekir û bayê destpêka

*1- Zikreş: Navê serleşkerekî Xorî bû. Berî zayînê bi hezar û heftsed sal.*

*2- Alalax: Navê kişwereke Xoriyan bû. Berî zayînê 1700 sal li deşta Hemqê ya dikeve rojavayê herêma Efrînê hatibû avakirin.*

*3- Amanos: Navê zincîra çiyayê Amanos e.*

*4- Toros: Navê zincîra çiyayên Toros e.*

Berfenbarê mîna hilmeke buharî bejna wî radimûsand û derbasî hindurê odê dibû. Rojdêr nêrînên xwe li deşta gundê Turindê û ya Endarê gerandin û çend xulekan li ser girê Endarê di perestgeha Ahromazde de meyandin. Di pişt re wî nêrînên xwe berve deşta gundê Bablît, Keferbetirê û Maratê rêz kirin, bi darên zeytûnê çavên xwe kil dan û ji xwe re got:

- Birastî Efrîn jînistan e. Berî ku pencerê bigire wî nêrînên xwe berve nexweşxaneya Avrînê bi coş rêkirin, berkenî bû û got:

- Ma gelo ferişteya dilovaniyê Bêrîvana çavreş niha çi karî dike?!

Wî bejna xwe da ber tajanan û got:

- Bêrîvan… Nojdara dilovan…! Dilê Rojdêr bê aram e. Ez ji te hez dikim û wî pencere girt.

Bi girtina pencerê re deriyê mala wan hate lêdan û diya wî derî vekir. Du asayîş li ber deriyê malê bûn û wan ji diya Rojdêr re gotin: Em ji bo Rojdêr hatine. Siba li danê sibehê bila were ba me ji bo biçe leşkeriya neçar a"foc". Wan diya Rojdêr agahdar kirin û çûn.

Piştî ku diya Rojdêr deriyê malê girt, bi lez derbasî odeya Rojdêr bû û jê re got:

- Kurê min…! Niha du asayîş hatin û wan ji min re gotin: Divê siba li danê sibehê Rojdar were ba me ji bo

leşkeriya neçar.

Rojdêr bêdeng ma û careke din pencere vekir û nêrînên xwe li zincîra çiyayê Lêlûn gerandin, di bejna çiyayê Berkêt re hilperikandin û ji diya xwe re got:

- Dayê! Virniyên dîrokê bi xewnên xwe pir şa nabin û li pêş pêşewên şoreşan divê serê xwe ranekin. Bila biçin li gora "Morşîlî" yê Hitîtan bigerin belkî ji wan re bipeyive ku çawa "Birtirna" yê Mîtanî bi serê şûrê xwe kembera zordariyê ji nava wî qetand û termê wî bi simên hespan lîskand.

Diya Rojdêr jineke zana û beşê dîrokê xwendibû, ji ber wê jî baş têgihîşt ku Rojdêr çi got. Lê wê jê re got:

- Kurê min! Ma ne sozê te bi Bêrîvanê re heye, ku li bîstê Avdarê hûn daweta xwe bikin?!

Rojdêr pencere girt, serê diya xwe maç kir û got: Dayê…! Pirsgirêk nîne û sozê me li cî ye. Ezê biçim û li dema soz werim û dîsa emê daweta xwe bikin. Lê ji bîr meke hîngê gelek lîliyan ji min re bike û bila giyanê bavê min di gorê de şa bibe.

Dema diya Rojdêr têgihîşt ku kurê wê biryara çûna leşkeriya neçar da, wê serê Rojdêr maç kir û çû taştê amade bike. Di ber amadekirina taştê re diya Rojdêr ji xwe re digot:

- Ev çi leşkeriya neçar e?! Ez tênagihêm ku çawa partiyek

bi darê zorê zarokên me dibe leşkeriyeke neçar? Hîn em têneg ihîştine ku ew doza çi dikin û ji bo kê dikin? Belkî ez nikarim têbigihêm û şaş bim… Belkî.
Ey Afînosê duyem! Kevirên li ser gora xwe veçengîne, careke din girêkên zimanê xwe veçirîne û hewal de ku çawa torînên "Şotrana" yê Mîtanî kelayên zordariyê hildiweşînin. Ji wan re bibêje ku çawa Nefertîtiya çeleng dîwarên perestgehên Fer`oniyan bi pertavên royê xemilandin. Di vê serdemê de jî Nefertîtiyên Efrînî dê çîrokên ronahiyê li ser sîngê zinar û latên Çiyayê Kurmêc nîgar bikin.  Ev der Efrîn e… ha…
Dema ku Rojdêr ligel dê û herdu xwîşkên xwe yên biçûk taştê dixwerin diya wî got:
- Li Rojhilata Navîn; Kurdan gelek şemaqên ji ronahiyê li nav çavên tariya serdeman xistine û riyên jiyanê ji kelemên zordariyê paqij kirine. Ev ne ji xeyala helbestvanekî yan ji çîrokên serxweşan in. Erê… Li "Akbitana" Diyako yê Mîdî dawa tariyê li nava wê gerand û bi agirê azadiyê şewitand. Rast e; hîngê sedsala hevdehan berî zayînê bû û niha jî sedsala bîst û yekê ye, lêbelê roj wek xwe dimîne û ronahî qet pîr nabe.
Rojdar ji ser sivrê vekşî, rabû piştî ku çû destên xwe şuştin, vegerî û hat li tenişt diya xwe rûnişt û got:
- Berî hezar salan hîngê dîsa dîrokê xwest ku piziya xwe

bikumişîne hev û rojperestan bêşîne. Belê; hîngê dîsa li "Kerkemîşê"[1] alên pîlangeriyê hatin hildan û talankerên wê serdemê xwestin ku awaz û sazên Feratê Mîdî ji xwe re bidizin. Lê Kexisrewê[2] roperest sirûdên serkeftinê di guhên bê de berdan û alên ronahiyê li ser bircên "Nînewa"[3] daçikandin. Hîn şopa cirîda hespên Aştiyak[4] ji ser dêmên axa welatê kurdperwer nehatiye şuştin.

Diya Rojdêr pir bi gotin û rewşenbîriya kurê xwe şa dibû. Wê jê re got:

- Kurê min Rojdar! Di nav lêvên zincîra çiyayên Zagaros de Skenderê Mezin lêvên xwe gez dikirin û xwîna poşmamiyê di ser çenga wî re dadirivî ser sîngê wî. Li ber ronahiya heyvê ronahîperestan êrîşên xwe li nava leşkerên wî dalandin û şûrên xwe ji xwîna wan têr sor dikirin. Hîngê Skender çavên xwe li riyên reveke dîrokî digerandin. Lê ronahîperweran mejiyê wî bi tirsê dîl kirin û şemaqên ku li nav çavên wî ketin, Aristo[5] bi zimanê poşmamiyê şemaq dijmartin.

Rojdêr got:

- Dayê! Ezê niha biçim nexweşxana Avrînê, Bêrîvanê

*1- Kerkemîş: Navê Cerablosê bû di serdema Mîdiyan de.*

*2- Keyaxisar: Navê qiralekî Mîdî bû û bi destê wî dewleta Aşûrî şikest.*

*3- Nînewa: Paytexta dewleta aşûrî ya kevnar bû.*

*4- Aştiyak: Navê qiralê Mîdî yê dawî bû.*

*5- Aristo: Feylesofê Yûnanistana kevnar bû. Ew mamosteyê Skenderê mezin bû.*

bibînim û wê bi çûna xwe ya leşkeriya neçar agahdar bikim.

Wê jê re got:

- Kurê min! Silavên min bigihîne Bêrîvana çavreş û jê re bibêje:

- Bila li danê pişt nîvro riya xwe bi mala me xîne. Xwedê we ji hev re bihêle û ez bi daweta we şa bibim.

Rojdêr destê diya xwe ramûsand û ji mal derket.

Piştî ku Rojdar ji mal derket diya wî got:

- Xwezî her kes li dîroka ronahîperestiyê vegere û bibîne ku çendî tarî li pêş wê têk çû ye. Dema ku tarîperestî û zordarî dibin yek, hîngê ronahî bêtir tinazan bi wan dike û têkçûna wan teqez dibe.

Li Efrînê hertim sirûşt berxwedêr û jiyanvejîn e. Çem û kaniyên wê di çavên demê de bi dilpakî û zelaliya Kurdistaniyên mirovperwer diherikin, diherikin û diherikin. Dildarên jiyanê û xemlandina deşt, newal, gelî û sîngê çiyan in. Lê ji tîbûna neyar, xinz û nokeran re jehra reş in.

Ji berê de hin dimrin, hin dibin pakrewan û hin jî çavdêriya sînorên rûmetê dikin. Hin digrîn, hin rondikên dayîkan radimûsin û hin jî zarokên xwe fêrî stranên axê dikin.

Yên ku bi hêminî mirina xwe di dawa rojan de dipelînin,

ên ku parek ji temenê xwe di listeya nîvrevekê de tomar dikin û yên ku xweperestiya xwe kirine silogana jiyaneke derewîn, xwezî ji siha bazaran rizgar bibin û li banga lawên royê xwedî derkevin.

Bihna xwîna law û keçan ji gewdeyê welatê pakrewanan, ji Kurdistana pîroz û bihuşta axê difûre. Tucarî wan ji banga şoreşên Kurdan re negotine na û deriyê comerdiya xwe li pêş berxwedanê negirtine. Efrîn e ha…

Hertim berê law û keçên Efrînê li ronahiyê ye û pişta wan li tariyê ye… Serdemên serxweş xistin berîkên jibîrkirinê û gavên wan yên pêxemberên azadiyê ne… Li ser dêmên avê jî dikarin nameyên ji êgir nigar bikin û demên ku babelîskên xopandinê rê li pêş wan winda dikirin, hertim di bin solên kezîzeran de li kêlîk û xulekên xwe yên xapînok digerin.

Rast e; hinan bi hemû kanebûna xwe deriyên vî welatî li pêş kujer, çavsor û leşkerên tariyê li ser piştê vekirin û li bazaran rûmeta xwe firotine. Her kes dizane ku dizên welatan dixwezin lêmişta xwîna mirovan raneweste û qet bêfilên wan ji bîna kuzûra termê zarokan têr nabin. Lê bila her kes zanibe ku siwarên ronahiyê ji qadên parastina rûmetê venakşin û vîna wan ji hilma axa pîroz têr hatiye avdan. Zeviyên darên zeytûnê tucarî nabin wargeha dûvpişk, gimgimok û maran.

Çiyayên ku bi pozên xwe dawa ezmên rast û çep hildimalin û geliyên ku hemêza xwe hertim ji jiyanê re vekirine, dê her wek xwe bimînin û şemaqên xwe ji ser tarîperestiyê venagerînin.
Mirina di nav pêlên deryayê de dibe çîroka masiyan û navnîşana wê li ser qûmeke livok tê nivîsandin. Dîlana li pişt sînorên bêpişt şahiyeke watepûç e û vedenga wê tenê li guhên ker vedipeke.
Her zinarek tomargeha bêtirî efsanekê ye… Her kevirek vedenga gavên berxwedêrekî di dilê xwe de ji nifşên siberojê re bi dilsozî veşartiye… Her dareke guvîjê bi hezaran çîrokên berxwedana çavreş û simbêlzeran di pêdariya kok û tamarên xwe de ji şahiya mezin û pîroz re parastine. Ger ji darên Çiyayê Kurmênc were pirsîn dê wisa bibêjin:
- Agahdarî; em nasnameya dîrokeke dêrîn in. Semaya şax û pelên me ji dilsoziya bê ye. Em bi destên siwarên bê hatine çandin. Reh û tamarên me giyanê gunehkaran seza dikin û kokên me çîrokên pêdariya kurên rojê li bejna xwe nîgar dikin. Ji Lêlûnê dilkevirî, ji Hawarê enîberz û ji Zoyê Giran pirsa me bikin. Ji bilî Kurmênc em agirê şewtandinê ne. Destaneyên me ji Zinefon û Hîrodots bipirsin. Goristanên Romî û hemû êrîşkerên tariyê ji axa ku tamarên me dimêjîne, bipirsin. Em darên mazî, guvîj û

zeytûnê ne ha…

Kî dibêje ku welat, bajr û siruşt napeyivin? Kî dibêje ku ew jî berxwedanê nakin?

Birînên bêdengiyê yên ku di çavên dayîkan de rojên devkumişî dijmartin û tibziyên kovanan ên ku di nav tiliyên kalemêran de dikirin tîqetîq bûne pêkenoka pênên pêdariyê û hîn destpêka ken e...

Şîrmijên ku ji kizûra landikên nîvşewitî diponijîn û keçên ku tiliya wan a qilîçê bê hene mabûn, îro çavberjêriya demê lêborînê ji wan dixweze... Hîn jî hin ji guhartinan seyr mane.

Rojdar di kolanên bajarê Efrînê re dimeşî û berê wî li nexweşxana Avrînê bû. Bajarê Efrînê mîna hemû rojan jiyanvejînî bû. Rojdêr mobayila xwe veker û li destgirtiya xwe Bêrîvanê gerî. Bêrîvanê jê re got:

- Tu dikarî werî û li çayxana nexweşxanê emê çayê vexwin.

Li çayxana nexweşxana Avrînê û di ber vexwerina çayê re Rojdêr giyanê xwe ji dêm û çavên Bêrîvanê têr dikir û dilê xwe germ dikir. Herweha Bêrîvanê jî nêrînên xwe di dêmên wî de diçêrandin û carina jî wê lêva xwe ya jêrîn bi diranên xwe yên sipî ji Rojdêr re gez dikir. Hîngê dêmên Rojdêr bersorî dibûn û ji xwe re digot:

- Hîn bîstê Avdarê dûr e, lê bêguman dê were û ezê

Bêrîvanê têêêr û têr hemêz bikim.

Rojdêr dixwest ku nûçeya çûna xwe ya leşkeriya neçar ji Bêrîvanê re bibêje, lê hevaleke Bêrîvanê ya nojdar bang kir û got:

- Bêrîvan! Bi lez were karê te çêbû.

Berî ku Bêrîvan xatirê xwe bixweze, Rojdêr jê re got:

- Diya min dibêje li danê pişt nîvro riya xwe bi mala me xîne.

Bêrîvanê got: Soz ezê werim, lê divê tu li mal bî. Ez ji dîtina te têr nebûm.

Dema ku Rojdar diçû mal, wî hin diyarî ji Bêrîvanê re kirîn û nameyeke evîndarî ku di beriya wî de bû xiste nav wan diyariyan. Dema ku gihîşte mal dît ku diya xwe rûniştiye û mirûzê wê ne wek hertim e. Wî diyarî danîn ser masê û ji diya xwe re got:

- Dayê! Ev cara yekem e, ez dibînim ku tu bi xem î, çi heye?

Wê hewil da ji Rojdêr re bibêje ku tiştek nîne û ez ne bi xem im, lê Rojdar têgihîşt ku çima nîşanên xemdariyê di dêmên wê de xuyan e. Wî jê re got:

- Dayê..! Ez dizanim ji bo çûna min tu bi xem î, lê birastî çare nîne. Wek tu dizanî ez ne hevalê tu aliyên siyasî me û tu baş jî dizanî ku ez jî wek te û her Efrîniyekî/ê çendî ji Çiyayê Kurmênc û hemû Kurdistanêc hez dikim û tenê ji

bo vê hezkirinê ezê biçim leşkeriya neçar bikim.

Dayê…! Te dîrok xwendiye, ma ne Tîtos[1] xwest ku hespê wî li ser vê axê cirîda serkeftinê bike û hîrhîra wî di guhên newal û berqefên Çiyayê Kurmênc de bibe vedenga bostek ji demê. Lê sîwarên bê û torînê ronahiyê riyên revê li pêş wî şaş kirin û di pesarên Semendaxê de rim di pişta wî de lîskandin.

Dayê…! Ev ne pesn in. Tenê em aliyekî ji dîroka xwe diqeşêrin û toza kîn û qerezan ji rûpelan dadiweşînin. Çend roj in dengê çavsorên bilind dibe û dixwezin jînistana me bikin wêranistan. Ezê ji bo hezkirina me ji Efrîna jînistan re leşkeriyê bikim. Ma ji bilî wê rê li pêş me hene?

Peyvên celq
Ramanên tewixî
Çengelên xapînokiyê
De ka bila bibêjin
            Ev çi kîn e?
Ev ax
Ev zinar û lat
Ji hevalokên dêpîrên me
                  Avis in... avis.

*1- Tîtos: Qiralekî Roma bû.*

Diya Rojdêr keserek kişand û got:

- Kurê min! Heft sal in serûberê vî welatî bûye lîska dewletên biçûk û mezin û dawiya vê lîskê ne diyar e. Tirsa min ew e ku li dawiyê benê vê lîskê li nava Kurdan bigre û em temenekî giran bidin. Yanê miletê Kurd hertim dibe qurbana pîlanan û li dawiyê temen giran e.

Rojdar: Dayê! Tu rast dibêjî. Lê di baweriya min de vê care ne wek carên berê ye.

- Kurê min Rojdar! Ez hêvîdar im ku ne wek hemû caran be, lê hîn Kurdan sûde ji dîrokê wernegirtine. Ez ji çûna te ne dilrûniştî me. Rast e; penda Kurdî dibêje:

- "Ger şer hate ber derî xwe nede alî". Lê ta niha ez tênegihîştime ku çima hin dixwezin tenê bi serê xwe bikin û dibêjin tenê em hene?

Hîn Rojdar û diya xwe di wê gengeşê de bûn, deriyê malê hate lêdan û Rojdêr derî vekir. Dît ku Bêrîvan e û çenteyekî fodil di dest wê de ye. Wan silav dan hev û Bêrîvan derbasî hindur bû. Piştî ku silav û li rewşa hev pirsîn, Bêrîvanê got: Min telefonî diya xwe kir û jê re got:

- Ezê îşev li mala diya Rojdêr bimînim û wê jî erê kir.

Bêrîvanê destê xwe xiste çenteyê xwe yê biçûk û zincîreke zêrîn ku tîpa "B" jî pê ve bû xiste stiwê Rojdêr. Hîngê Rojdêr jî diyariyên ku ji Bêrîvanê re kirîbûn û

nameya ku di nav de bû, diyarî wê kirin.

Di ber vexwerina qehwê re Rojdêr ji Bêrîvanê re nûçeya çûna xwe ya leşkeriya hewal da. Hîngê mirûzê Bêrîvanê hate guhartin û got: Ma tu rast dibêjî?!

Diya Rojdêr fincana qehwê ji destê xwe danî û jê re got: Belê; Rojdar rast dibêje, lê sozê daweta we mîna xwe dimîne.

Bêrîvanê dixwest ji Rojdêr re bibêje:

- Xwezî tu hewil bidî û neçî.

Deriyê malê hate lêdan, Rojdêr çû derî vekir û xalê wî Hemo derbasî hindur bû. Piştî ku li rewşa hev pirsîn, Diya Rojdêr ji birayê xwe re got:

- Siba li danê sibehê xwerziyê te wê biçe leşkeriya neçar.

Bi wê gotinê re Hemo got:

- Ma ji bilî wê çare heye?! Ji aliyekî ve gefên dewleta Tirk li ser Çiyayê Kurmênc zêde dibin û ji aliyekî din ve jî hemû xort û ta kesên zewicî jî, ji bo leşkeriya neçar tên komkirin. Lê ji bilî ku em li ber xwe bidin tu rê li pêş me nînin?

Diya Rojdêr got: Bira Hemo! Ez ji dawiyê ditirsim, ji dawiyê. Yanê em nizanin ku li dawiyê dê çi bazar li ser me bibin û berê me bidin kû? Lê dîsa biryar a Rojdêr e.

Hemo: Xwîşka delal! Ma Kobanê nayê bîra te?! Li dawiyê serkeftin bû para me û Xwedê neke ger dewleta

Tirk êrîşî Efrînê bike dîsa emê bi serkevin. Yanê Kurd ne Kurdên berê ne û civaka navdewletî jî piştgiriya me dike.
Diya Rojdêr got: Bira Hemo! Rewşa Efrînê wek a Kobanê nabe. Di berxwedana Kobanê de Hevbendiya Navdewletî piştgiriya Kurdan dikir, lê rewşa Efrînê cudayî ya Kobanê ye.
Rojdar rabû pencere vekir û nêrînên xwe li deşt û girên li hawîrdora bajarê Efrînê gerandin, di pişt re pencere girt û li tenişt diya xwe rûnişt û got:
- Celqbûna mejiyê dagirkeriyê pir serdem jê nalîn. Hîn jî hin mejîreş şanaziya xwe di wê celqbûnê de dibînin û wan ji bîr kirine ku hertim xwînrêj riswa dibin.

Zimanê wan
Yê ku ji tundiyê lewitî ye
Ne biyan e
Qelazên qul
Tîbûna darmaziyê ko nakin
Belê...
Di sihan de
Seriyên gênim bel nabin…

Berîkên dîrokê ji bersivan mişt in ku çawa hertim tarî li hember ronahiyê bi ser neketiye û tucarî bergeyên di navbera wan de kin nabe.
Ger neçariyê sîngê xwe li pêş siwarên azadiyê vekir,

hîngê bila jînkujer lomeyên xwe li rûpelên dîroka xwe ya tarî tomar bikin.

Dema ku Rojdêr wisa got, tevan nas kir, ku wî biryara xwe ya dawiyê da û wê biçe leşkeriya neçar bike. Lê dilê diya wî di navbera erê û na de bû, Bêrîvan bêdeng bû û xalê wî rabû xatirê xwe xwest û çû.

Piştî ku şevê konê tariya xwe vegirt û beşek ji xelkê bajarê Efrînê di xewê de bûn. Bêrîvanê çavên xwe ji bejna Rojdêr têr dikirin. Herweha Rojdêr jî nêrînên xwe li bejna Bêrîvanê diçêrandin.

Bêrîvanê ji Rojdêr re got:

- Yanê te biryara xwe daye û tu jê venagerî? Yanê ta roja bîstê Avdarê ez te nabînim.

Berî ku Rojdar bersiva Bêrîvanê bide, diya Rojdêr ji oda din hat û ji Rojdêr re got:

- Kurê min! Min çenteyê te amade kir û li ba wan rûnişt.

Rojdar rabû li pişt masê rûnişt û got:

- Dayê! Berî çend rojan min tiştine xwe nivîsandibûn û ez dixwezim ji we re bixwînim. Hûn çi dibêjin? Wan jê re gotin:

- Tu dikarî ji me re bixwînî.

Rojdêr lênûsa xwe vekir û xwend: (Eger we şûrê Omer li hember peyrewên Elî tazî kiriye û wan jî Zûlfoqar tûj kiriye û hîn bêfilên we ji şewata termê mirovan û hilma

xwîna bêgunehan têr nebûne, her zanibin ku pîvana lawên rojê tenê mirovatî ye.

Agahdarî û dîsa agahdarî, vir ne tenê Efrîn e, lêbelê keskesora jiyanê ye. Agahdarî… Ger liva we guharên sînorê vê bihuştê bileqîne, gewriya dojehê têre we hemiyan dike haaa. Ev der jînistan e.

Di navika gelek serdeman de bawermendên rojê bi gavên xwe sînorên sexte derbas dikirin û nêçîra şaşîtiyên çerx û felekê dikirin. Ev ne xewneke ku di awêneya xeyalê re xwe li peyvan dimîne û ne jî leylaneke ku rastî bayê pêlên xapînokiyê hatiye. Pêlvedanên şaristaniya mirovahiyê ji landika Kurdonîsa pîroz hate vereşandin û hîn pêlên wê di mejiyê mirovahiyê de negihîştine kenarê dawîbûnê. Em nepirsin çima lêvkulbûn? Cûtina kerikên hejîran lêvkulbûn e.

Di Rêbendaneke ziwa de dizên dîrokê û jêmayên tersî serdem û mirovatiyê hewil didin ku kilîtên xwe yên zingargirtî li deriyên ji êgir babidin…! Hin bi gilîzê talankeriyê demên xwe dişon û hin jî li ber deriyên çavsoran di veketina xewnine pûç de li benda pariyên nandoziyê ne.

Lê; li jînistanê bêdengî nişkaviyekê amade dike û di wê nişkaviyê de sergêjiyeke mîna ya Nemrûd ji lawên derew û xapînokiyê re li ber zandinê ye. Di wê sergêjiyê de

gelek paytext dê veciniqin û di wê veciniqandinê de jî gelek têgeh wê li wateya xwe poşmam bibin. Efrîniyên dilsoz ji memikên pêdariya serdemên şanaz mêtine, baş dizanin nêçîra Hamanan[1] bikin û Ejdehakan[2] bi ser tariya wan de vegerînin.

Tabloyên sexterengî ku bi dîwarên wijdantevizî ve li ba dibin, dê ji dîwaran bikevin û pir avahiyên ku bi alên xapînokiyê hatine xemilandin wê rût bibin. Nexşeyên ku di pişt perdan de hatine çîxizkirin, sînorên wan dê bên guhartin. Belê hîngê Efrînê ji cîhana serberjêr re bibêje: Çima te li min guhdar nekir?.

Piştî ku Rojdêr ji wan re nîvîsa xwe xwend, herdiyan spasiya wî kirin û hîngê demjimêr yek piştî nîvê şevê bû. Ta danê sibehê diya Rojdêr hewil da ku Rojdar ji biryara xwe ya çûna leşkeriya neçar vegere, lê bê çare bû.

Piştî xwerina taştê Rojdêr sê caran destê diya xwe maç kir, dêmên herdu xwîşkên xwe yên biçûk maçkirin û wî destê xwe kire destê Bêrîvanê û bi reşika çavên xwe dêmên Bêrîvanê hemêz kirin û bi dengekî têrevîn û hêmin jê re got: Ez ji te hez dikim. Bêrîvanê jî destê wî guvaşt û got: Rojdar! Pir ji te hez dikim û dilê min bi te re ye.  Rojdêr çente rakir û ji mal derket.

*1- Haman: Wezîrê Fer`on bû.*

*2- Ejdehak: Di efsaneya Newrozê de tê gotin ku wî rojane serê du Kurdan jê dikir û mejiyê wan dida herdu marên ku li ser piyên wî bûn.*

Şevê xewn û xeyalên xwe di nav tariyê de li gor meraqên xwe yên xwezayî dimêjandin û di nav perspanên ewran re stêrkan hin awirên xwe li sirt û zinarên Çiyayê Kurmênc sar dikirin.
Di her malekê de ji malên Çiyayê Kurmênc bîna jiyanê ji şevbuhêrkan dihat û zarok bi lîstokên xwe dilîstin.
Şaxên kurmî û stewir ên ku ji darên zêtûnê bi destên kalemêrên axperwer hatibûn birîn sobeyên êzingan mîna asoyekî mirûzsor kiribûn. Di maleke qentirme de kalemêrekî heftêsalî ji law û neviyên xwe re şevbuhêrk pareve dikir û ji wan re digot:
- Ji sedsalan ve û di pişt perdeya Îslamê de, tundrew teroreke rêxistinkirî bi rêve dibin û bi mezintirîn gunehan tomargeha dîroka Rojhilata Navîn genî dikin. Di bin gotina (Elaho Ekber) de talankerî, kuştin û her tiştên ne mirovatî dibin û dibêjin li ber deriyê bihuştê herişte li benda me ne, ta ku perwînan radestî me bikin!! Xuya ye ku wan Xwedêyekî taybet ji xwe re çêkirine. Vêca Kurdan xwedênenas dibînin û kuştina me rewa dikin!!! Bêtirî nîvê dîrokê bersiva wan û ya kiryarên wan ên terorîst da ye û bapîrên wan ên ku bi derewan li ser ava deryayê nimêj dikirin têr riswa kirine.
Em gelek caran bê rondik jî dagirîne û êşên bêzariya demên me cûtine. Lê hertim jî me hêviyên wan ên ji bo

tunekirina Kurdan dane bin lingên zarokên xwe û rûçikên talankeran bi tifa dîrokê şilotî bûne.

Pir caran em li pişta êşan siwar bûn, lê hertim me di êşên xwe de jî zîl daye û tucarî vê axê biyaniyî nepejirandine. Tenê em dizanin di nav lêvên wê de nêrgiz û qurenefîlan biçînin û buharan bixemilînin.

Pir caran bêdengiyê hewil da ye ku dengê me ji me bidize û gelek caran jî dilşadiya me demkî bû. Lê car ji carê bêtirîn dengê me bilindtir dibû. Şahiyê hemêza xwe li pêş dilsoziya me nedigirt û pêdariya me nedibû dîla êşdariyên çêkirî.

Hin dixwezin ku çavên me di rondikan de noq bibin… Hin hewil didin ku lêvên me bi peyvên bêzariyê bişewitînin… Hin li ber xwe didin ku bi dîlaneke derewîn me serxweş û sermest bikin… Hin pilanan ji xefikan amade dikin û me bi ser de têve didin… Hin dixwezin ku pîlanên xwe di nav civaka me de perwerde bikin û hebûna me bikin qurbaniya kiryarên xwe yên li dijî mirovatiyê. Lê vê carê ne mîna hemû carên berê ye… Ne cih û ne jî dem ên berê ne. Vir Efrîn e û sedsala bîst û yekê ye haaa.

Neviyekî ji neviyên wî kalemêrî destûra axaftinê xwest û ji bapîrê xwe yê ku baş dizanî kurman di hindurê koka darên zêtûnê de bikuje re got:

- Li vê Rêbendanê û li hawîrdora Efrîna aştîxwez û mirovperwer hinan ferhenga gefan li têlên zimanê xwe tomar kirine. Li aliyekî din jî berê xwe didin paytexta alsor ji bo destûra destdirêjiya li ser Çiayayê Kurmênc ji wan werbigrin û tabloya keskesora Efrînê bi gilîzê tariyê bilewitînin.

Kalemêr got: Kurê min Ronî! Heft sal in kulxana sipî ya hilweşandina bajar, bajarok û gundan ji ezmanê Sûriyê kêm nebûye û herweha dûmana reş a şewitandina welêt jî kêm nebûye. Lê ezmanê Çiyayê Kurmênc zelal maye û barana wî bi wê dûmanê nelewitîye. Rast e; aramiya ku li Çiyayê Kurmênc heye, ew ne li gor dilê me ye, lê ne wek deverên din e. Li serûberê Sûriyê ewlehî, aramî û hêminî nemaye û xelk li ser nasnameya xwe ya netewî, olî û mezhebî tên kuştin. Bi dehezaran ji pêkhateyên Sûriyê yên ku ji şerê qirêj revîne, li Çiyayê Kurmênc ligel Kurdan bi aramî û bê pirsgirêk dijîn. Ji sedsalan ve pilan û pîlanên neyarên gelê Kurd û bi hemû kanebûnên xwe hewil didin ku dîmografiya Çiyayê Kurmênc biguhêrin û hestên netewî yên Efrîniyan pûç bikin, lê bi ser neketin.

Wî gotina xwe domand û got: Berî sed salî û dema ku Kurdistan bi pênûsa Saykis û ya Bîko hate dabeşkirin û her beşek bi ser dewletekê ve kirin, hîngê xaknîgariya Kurdistanê ji deryaya Sipî dûr xistin. Gundê Qermîliq ê

ku li bakur û rojhilatê Çiyayê Kurmênc dikeve, tenê 37 k.m. di navbera wî û deryaya Sipî de hene. Yanê Kurd dikarin bi çend gavên lehengiyê govendê li peravên deryaya Sipî bigerînin.
Kurê min Ronî! Di hemêza deşt, newal û geliyên Çiyayê Kurmênc de û li ser sîngê çiyayên berz û pêdar bîst milyon darên zeytûnê semaya jiyanê dikin. Herweha darên henar, sêv, gulyaz, behîv û hejîrê jî bi milyonan in. Bi deh cureyan miwên tirî jî şivên xwe li ser axa Çiyayê Kurmênc rêxistine. Efrînî bi dewlemendiya herêma xwe serbilind in û dibêjin: Ax jî rûmet e.
**Ronî**: Belê bapîrê min! Ji bilî tiştên ku te jimartin, di hemêza xaknîgariya Çiyayê Kurmênc de sêsed û şêst û şeş gund deng û vedenga kurdewariyê ne û di her gundekî jî Kurdistana mezin heye. Ev ne xwen û xeyal an jî ji tûrikê psnên ku li ber bê ne. Ev rastiyeke û di her malekê de jî belkî Kurdistana mezin hebe.
**Bapîrê Ronî**: Kurê min! Ez tênegihîştim ku çawa di her gund û maleke Çiyayê Kurmênc de Kurdistana mezin heye?
**Ronî**: Belê; Di her gundekî de navên Cûdî, Zagros, Berzan, Sîpan, Hawar, Hemrîn û Biradost hene. Di her gundekî navên Mihabad, Erbîl, Amed û Xelat hene û di her gundekî de navên Dicle, Ferat û Aras hene.

Li her gundekî Çiyayê Kurmênc navên Zeredeşt û Avista hene û dibe jî ku di malbatekê de Mîdiya, Dara û Mîtan hebin. Berî ku zarok jidayîk bibin dê û bavê wan jê re navên Zîlan, Helebçe, Leyle û Arîn amade dikin. Efrîn perestgeha netewa Kurd e û neyar baş vê dizanin.

**Ronî** gotina xwe berdewam kir û got:

- Eger lêveger û raçavkirin di tomargeha şoreşên Kurdan de çêbibe, yek şoreş nîne ku Efrînî tê de ne beşdar in. Ji heft kesên ku tevgera siyasî ya kurdî li Rojavayê Kurdistanê damezirandine çar jê Efrînî bûn. Çiyayê Kurmênc hêlûnek ji hêlûnên parastina netewa Kurd e.

Li Çiyayê Kurmênc bi deh hezaran kesên ku fêrnameyên zangoyî û jê bilindtir jî wergirtine û zanîn û hestên netewî di nav civak û hemû Kurdan de geş dikin hene. Efrîn şewqvedana zanînê ye.

Bapîrê Ronî bi têgihîştin û zanebûna torînê xwe pir dilşad bû, wî jê re got:

- Belê kurê min! Ji ber ku nasnameya Efrînê di her warî de kurdewarî û xwedîlêderketina doza gelê Kurd e. wê ûştê hemû neyar û xêrnexwez dixwezin destdirêjiyê li Çiyayê Kurmênc bikin. Lê soz û peyman bi wesêkên Sêx Se`îdê Pîran, Qadî Mihemed û Mistefayê Berzanî ta şaxên darên zeytûnan jî dê bibin dojeh û wan bişewitînin. Belê; dê bibin dojeh û hemû serma, berf û qeşaya

Berfenbar û Rêbendanê nikarin agirê wê vemirînin.

**Ronî**: Belê wisa ye. Ji ber wê jî em dibêjin:

Agahdarî…

Agahdarî…

Dîsa agahdarî

Vir; erê ev der Efrîn e ha. Efrîn tenê ya Efrîniyan e û bila kesek nebêje ya me ye.

Li tenişt sobeya êzingan dêpîra Ronî desmaleke rengzêtûnî dabû serê xwe û keziyên porê xwe yê henekirî di ser fîstanê xwe yê kurmancî de berdabûn. Tiliyên destên wê bi hezaran çîrokên berhevkirina zeytûnan li ezber kiribûn û nênûkên wê ji bîna axa Çiyayê Kurmênc xidad kirîbûn. Di mirûzê wê de gelek şahî velîstibûn û hinan jî nameyine jiyanzê li pey xwe hîştibûn. Wê ji torînê xwe Ronî re got:

- Berê jî gelek caran çeqelan serê xwe di qulên dîrokê re derxistin û xwestin ber bi vê bihuştê de werin. Lê vedenga dengê şêran zirava zikê wan qetandin û li cihê ku jê hatibûn vegerandin.

Carina jî berazan pozê xwe xistin nav qûma beyabanan, mûyê çermê xwe yê gurî li pey xwe weşandin û xwestin di ser sînoran re gav bikin û derbasî gulistanên jiyanê bibin. Lê tîrkevanên jiyanperweran ew kirin xwarina segên çolan.

Carina hin aliyên dîrokê tîş dibûn û rûviyên birçî warînî bi gewriya xwe dixistin û hewil dan bi xapînokiyên xwe nêçîra kevok, tivîrk û kewşînan bikin û di siha zinar û daran de vekevin. Lê zarokên rojperestan baş fêrî nêçîrê bûbûn û li ser sînorên welatê torînên Kurdoxiyan warîna dawiyê di gewriya wan de bi dawî kirin û hîn jî Efrînî dibêjin:

- ***"Wî hiş ji dûvê rep wergirt û nema diwêre ber bi şêran de mêze bike"***.

Piştî ku pîrejinê gotina xwe bi dawî kir, lawê wê yê mezin Hoşeng ê ku pir ji xwendina dîrokê hez dikir û rojane li danê sibehê demjimêrekê dixwend got:

- Li Afasosa  kevnar "Diqilyanos" dest ji sergermiya xwe ya ne mirovane ber neda û şûrê xwe bi xwîna aştîxwezan dişuşt. Li dawiyê neh dilsozên Avasosî û segeyê wan ji xewa sedsalan hişyar bûn û segeyê sozdar têêêr û têr di ser gora Diqilyanos de mîz kir. Belê ez jî gotina Ronî dubare dikim û dibêjim:

Agahdarî…

Agahdarî…

Vir; erê ev der Efrîn e ha…

**Hoşeng** gotina xwe berdewam kir û got:

- Dîsa li welatê Afasosa nûjen Diqilyanosên sedsala bîst û yekê li sergermiya xwe siwar bûne û xwefiroşên mejîtarî

li hawîrdora xwe kom kirine û dibêje: Di bîst û çar demjimêran emê welatê dilsozan dagir bikim.

Keça Hoşeng a ku beşê wêjeya kurdî li zanîngeha Efrînê dixwend, bi hemû hiş û hestên xwe li gotinên bapîr, dêpîr, birayê xwe Ronî û bavê xwe guhdar dikir. Hin gotinên wan li rûpelên lênûsekê dinivîsandin. Wê ji bavê xwe pirsî û got:

- Bavo! Kurdên Rojavayê Kurdistanê tiştek bi dewleta Tirk nekirine. Ma çima ew gefûgurên xwe li ser Efrînê dikin û hewil didin ku Efrînê dagîr bikin?!

**Hoşeng:** Keça min Hêvî! Ji berê û paşê de sultan û rêjîmên Tirkiyê ne tenê dijîtiya doza kurdî dikin, lêbelê hertim hewildanên tunekirina hebûna me wek milet û netew jî dikin. Yanê hebûna Kurdan li heza wan netê.

Hêviyê pênûsa xwe di nav tiliyên xwe de lîskand û got:

- Dema ku bira bi mirina hev agahdar nedibûn, dayîkan gora zarokên xwe nas nedikirin û mirina bêdeng di govdeyê Kurdistanê de peyda dibûn, ew demina di paşela xwe de hatine qurmiçandin û hêdî hêdî pênûsa dîrokê fêrî nivîsandina rast dibe.

**Ronî** ji xwîşka xwe Hêvî re got:

- Her bijî ji ramanên te re. Belê xwîşka hêja! Eger di demên berê de Kurd di tomargeha mirinê de jî bê nasname dihîştin û di temenê yeksaliyê de kembera

windabûnê li nava zarokên me digerandin, lê îro Kurdan bi sîngê dîrokê girtine û neviyên bawermendên rastiyê ji riya sermestiyê vediçengînin. Dema ku devbixînan di ser sînorên rastiyê re bê tirs gav dikirin û derbasî eywanên destlatdariyê dibûn, lê îro ew demina ji wan re bûne xewn.

Hoşeng pir bi gotinên keça xwe Hêvî û kurê xwe Ronî dilşad bû. Wî got:

- Rast e; hîn Rêbendana 2018an di destpêka tezebûna xwe de ye û gewriya wê ziwa ye. Lê gewriya hin mizgeftan ji bo torînên ronahiyê peyv û hevokên dijîtiyê amade dikin û ber bi Xwedê dipijiqînin.

**Ronî:** Belê neyar in û tenê li ser tunekirina Kurdan li hev dikin. Wan dilê Kurdistanê birîn kirin û vê carê jî hewil didin ku cîgera wê bisotînin. Lê mixabin hîn hişê piraniya Kurdan jî di derpiyê partîtiyê de gêjomêjoyî maye…!!!

Li dawiyê bavê Hoşeng yê kalemêr got:

- Birastî serê min bi we hemiyan bilind e û cefaya min vala neçûye. Lê em Kurd di dîrokê de pir hatine xopandin û me temen jî daye. Ji ber wê jî ez bi tirs im ku dîsa em temen bidin. Derd bi Kurdan keve, ez tênagihêm ku çima li hember neyaran nabin yek?! Gotina "**tenê ez**" beravêtin bi xwe ye.

Li roja 6ê Rêbendanê bajarê Efrînê wek hemû rojan bi meraqên jiyanê pêl dida. Li aliyekî stranên Cemîl Horo, tembûra Adîkê û li aliyekî din jî helbestên şanazî û dildariyê jiyan geş kiribûn. Hertim Efrînî û jiyanê hevaldost û hevcêwî ne.

Rojnamevanekî Efrînî porê wî dirêj bû, kamîrak di destê wî de û çentak jî bi piyan ve bû. Li kolanên bajarê Efrîna jiyanhez wî nêrînên xelkê li ser gefên dewleta Tirkiyê li ser Efrînê werdigirtin.

Berî ku rojnemevan nêrînên xelkê werbigre, wî nêrînên partiyên ku li Efrînê bûn wergirtin û endamekî ji partiya nimre "yek" nêrîna xwe wisa da:

- Yên ku di dibistanên nijadperestî û tundrewiyê de hatine perwerdekirin, çendî dengê xwe bilind bikin û hewil bidin ku lekeyên reş bigihînin Efrînê, bila xewnên xwe bipêçin, bikin nivişt û têxin bin serê xwe.

Rêjîma Tirkiyê dibistanek ji dibistanên faşistê ye û di vî warî de xwedî dîrokeke dirêj e. Lê xewnên wan wê li ser sînorê Çiyayê Kurmênc bên pelçiqandin. Ku dewleta Tirk êrîşî Çiyayê Kurmênc bike, hîngê dê zanibe ku em kî ne. Emê hemû pilanên wan têk bibin û em dikarin xelkê xwe biparêzin. Roja yekem ku dewleta Tirk gef li Efrînê kirin, em bi serketine.

Di pişt re wî rojnemevanî berê xwe da ofîsa partiya nimre

"dudu" û hevlekî wê partiyê wisa got:

- Gefên dewleta Tirkiyê li ser gelê Kurd û Çiyayê Kurmênc ne tiştekî nû ye. Armanca tirkiyê ew e, ku destkeftiyên Kurdên Sûriyê têk bibe. Wek em dizanin ku rêjîma Tirkiyê dixweze careke din Da`îşê vegerîne û tucarî naxweze ku çareserî ji qeyrana Sûriyê re çêbibe. Em bi hêza xwe bawer in ku wê hemû êrîşên dewleta Tirkiyê têk bibe û serkeftin dê para me be. Belê emê darên simaq, merx û kezwanan biparêzin.

Li ofîsa partiya nimre "sê" û herweha li ya nimre "çar" hevalên wan gotin:

- Dewleta Tirkiyê dixwez her demekê gefan li herêma Efrînê dide û çavsoriya xwe dide xuyankirin. Lê dewletên mezin rê nadin ku Tirkiyê derbasî herêmên kurdî yên li Sûriyê bibe. Yanê ewqas tirs ji gefên Tirkiyê nîne. Ya din berî du rojan me partiyên Kurdî yên li Efrînê daxuyaniyek ligel hev îmze kir û me tê de got: Eger dewleta Tirkiyê hewil bide û êrîşî Efrînê bike, bêguman serkeftin para me ye.

Di pişt re rojnemevan nêrîna endamekî ji Rêveberiya Xweser ya bajarê Efrînê wergirt û wî wisa got:

- Jirkî ku dewleta Tirkiyê gefan li Efrînê dide, me gelek meşên girse li bajarê Efrînê çêkirin û em bi xwe bawer in ku emê hemû êrîşên dewleta Tirkiyê û hevalbendên wê

bişkînin. Em ji bo her tiştî amade ne. Tirsa me ne ji Tirkiyê û ne jî ji hêza wê heye. Belê... belê em bi xwe bawer in û em amade ne.

Mamostekî zimanê Kurdî ku navê wî Rêber bû, ji wî rojnemevanî re wisa nêrîna xwe da:

- Kesên ku jehra qirkirina Kurdan ji zimanê wan diherike û bi gilîzê çavsoriya xwe dixwezin siberoja zarokên royê bilewitînin, bila li kortika li pişt serê xwe bigerin belkî bibînin. Belê; di zikê vê axê de gelek goristanên talankeran bê sînor in. Gefûgurên ku dewleta Tirkiyê li ser Efrînê dike û dibêje ezê Efrînê dagîr bikim û Kurdên wê ji hin partiyan rizgar bikim, bi hêsanî di ser Efrîniyan re derbas nabe. Em bi gotin, pilan û pîlanên wan netên xopandin. Vir Efrîn e.

Li kolana Riya Reco rojnemevan nêrîna bazrganekî zêta zeytûnan wergirt û wî wisa nêrîna xwe da:

- Pir caran bajarên Kurdan bi hilma xwînê hatine nexşekirin û sibehên gund û bajarokan bi lorandina dayîkên dilovan payî bûne. Lê tucarî nehatiye bîra torînên mirovatiyê ku xwînê bi xwînê bişon û dîroka xwe bi kujeriyê nav bikin. Vêca ku şer hate ber deriyê mêrxwezan bersiv meydan e.

Dema ku rojnemevan vedigerî mal wî dît ku kalemêrek li ber deriyê mala xwe rûniştiye û cîareke titûnê dipêçe.

Temenê wî kalemêrî pêtirî heftêsalî hebû. Şelwerekî reş û miltanekî şîn li bejna wî bû û şemleke sor ya cotkarên Efrînê li serê wî bû. Rojnemevan çû ba wî, silav da û jê re got:

- Apo navê te çi ye?

Kalemêr di bin mijangên xwe yên siq û qaling re nêrîneke kurmancî berve wî rêz kir û jê re got:

- Navê min Ce`fer e.

- Baş e Apê Ce`fer. Ez dikarim nêrîna te li gefên ku dewleta Tirk li ser Efrînê dike werbigrim?

**Ce`fer:** Kurê min! Ez cotkar im. Ma çi karê min bi siyaset-mîyasetê heye? Ma ne pêncî Partî-martiyên Kurdan çêbûne, biçe ba wan bila ew nêrînan bidin.

**Rojnemevan:** Belê apo; min nêrînên wan wergirtine, lê ez dixwezim a te jî bibim. Yanê tu çend gotinan bibêjî, mala te ava.

Kalemêrê Ce`fer nefesek ji cigarê bir û dû di dev û pozê xwe re berda û ji ronemevanê pordirêj re got:

- Kurê min…! Tirk dewlet e û xwedî hêzeke leşkerî mezin e. Yanê bila em xwe û xelkê xwe nexopînin. Bi tivingan şer li hember balefiran nabe. Ger hin Kurd dibêjin dewletên mezin li pişt me ne û ew ê alîkariya me li hember dewleta Tirkiyê bikin, ew jî xopandineke din e. Partî li hember dewletan nikarin şer bikin û ger bikin jî

temen dê pir giran be.

**Rojnemevan:** Apê Ce`fer! Yanê tu dibînî ku dewleta Tirkiyê dê êrîşî Çiyayê Kurmênc bike û wê dagîr bike?

**Ce`fer:** Kurê min! Belê; dewleta Tirkiyê dê êrîş bike û hemû dewletên mezin jî razî ne. Lê xwezî Kurd karibin xwe bigihînin dewletên ku li cîhan û herêmê xwedî biryar in û hewil bidin ku nehêlin ev şer çêbibe. Ji ber, dema ku şer dest pê bike, hîngê derfeta rawestandinê namîne û emê temenekî pir giran bidin. Kurê min! Ger şer dest pê bike xelkê Çiyayê Kurmênc dê pergende bibe û hîngê kesek jî li me xwedî dernakeve. Belê… Belê yên ku xwe rêberên partiyan dibînin, wan hertim riyên revê ji xwe re hîştine û çi bi serê milet were ne xema wan e. Kurê min! Min ji te re got û Xwedê neke ger şer çêbû hîngê tê zanibî ku çawa dew birayê mêst e.

Hevsînorên gelê Kurd tev dizanin, ku Kurd ji gewriya mirovperweriyê jidayîk bûne… Tev dizanin ku Kurd tovên hezkirin û aştiyê di mejiyê xwe, yê hawîrdora xwe û yê hemû kesên ku bi wan re têkildar in de diçînin. Lê ger hovan diranên xwe li ser sînorên Kurdan tûj kirin û xwestin wek pircaran govdeyê welatê rojperestan birîn bikin, hîngê gelek navnîşanên dîrokê dê werin guhartin.
Di çend salên borî de hinan dostaniya xwe ji Kurdan re nîşan dan, lê di roj û şevekê de mîna xecanên bextan rengê xwe guhartin. Di van çend salan de Qeyrana Sûriyê hemû gilgemar bi ser xwe xist û rastî da xuyankirin.
Dema ku Kurd bê hêz bûn gelekan bi siloganan xwestin wan bixopînin. Lê dema ku hêz di zendên Kurdan de bilind bû hinan kirin qereçî, hina kirin solpaqijkar û hinan kirin koçber û biyan. Dema ku Kurd bi destên terorîstan tên kuştin û talankirin, hin di bin çenkên xwe de dikin tîqetîq û bi kuştina zarokên Kurdan şa dibin.
Ew tev li aliyekî, lê tiştê ku mirov jê seyr dimîne, lêvên xwe ji gezkirinê birîn dike û çav maliq dimîn ew e, ku xêrnexwz pêkola tunekirina gelê Kurd dikin û hin ji Kurdan jî di nav toza wan pêkolina de bi xwe şa dibin…!? Hin jî dibêjin, ger dewleta Tirkiyê êrîşên xwe

wîne ser Efrînê û hewildana dagîrkirina wê bike, ez bawer im ewê zirareke mezin bibîne û wê di Efrînê de têk biçe. Lê çawa, ew zirar çi ye û kî dê zirarê pirtir bibîne? Wê nabêjin…!!!
Li roja 8ê Rêbendanê peyamêrê telefizyoneke kurdî li bajarê Efrînê nêrînên xelkê li ser hebûna hin asayîşên Rûsî li herêma Efrînê werdigirtin.
**Dêpîreke Kurmanc** digot: Gundê kêmaqilan neh mal bûn, lê yazdeh axayên wî hebûn û ji wê xerabtir ger mirovekî biyan û belkî cawfiroşek ba jî, ku dihate wî gundî wan li serê xwe dikirin baş axa…!!! Birastî; kenê me di paşela vê Rêbendanê de hilnatê. Eger em berevaniyê ji ber xwe û herêma xwe de nekin, biyanî ji ber me de nakin. Rûs ji berê û paşê de derewîn in.
**Cawfiroşekî Efrînî** digot: Bapîrên me dibêjin: "Riya rast mera digihîne daxwaza rast. Porê xelkê serê mera mezin nake. Bermede birayê xwe winê bibin xwediyê gundê xwe". Bira! Ji roja roj de Rûs bi çend tûr birinc doza miletan difroşin. Rûs ne berketiyê doza gelê me ne û ne jî dildarê çavên me yên reş e. Wan çend asayîşên xwe li Efrînê bi cih kirine, tenê ji bo bazaran li ser Efrînê bikin).
**Xwendekarekî beşê dîrokê** digot: Di sedsala bîstê de Sovyatistana kevnar tucarî bi rastî li kêlek gelê Kurd û doza wî nesekinî. Li sala 1925an Şêx Se`îdê Pîran

alîkariya wan xwest, lê wan nekir. Li sala 1946an bi Şahinşahê Îranê re wan li hev kirin û komara Mihabadê bû qurbaniya çened bîrên betrolê. Bi dehsalan Sedamê faşist û nijadperest bi çekên Rûsî şerê şoreşa Mile Mistefayê Berzanî dikir. Ya din Kurdên ku niha li welatên Qoqazistanê dijîn, ji wan bipirsin ku Stalîn çi bi serê wan kir. Yanê hevbendiya bi dewleta Rûsiya re kevzane ye. Xuya ye di berîkên Rêbendanê de tiştine veşartî dê eşkere bibin û hîngê emê tenê loman bikin.

Rûmet û mirovatî ne çîroka roj û şevekê ne û guhartina cînatên mirov û miletan pir zor e. Herêmên ku bi Çiyayê Kurmênc re hevsînor in, beşekî mezin ji xelkê wan herêmina mejiyê wan ji çîrantiyê hatiye şuştin û ji dijîtiya bi Kurdan re hatiye dagirtin. Ramanên vajî mirovatî û jiyanê di serê wan de hatine çandin û kesên ku xwe ji wan re kirine rêber ji wan re dibêjin: Kurd gawir û xwedênenas in. Kurd bi ola Îslamê ne bawer in. Kurdan destên xwe xistine destê dewletên li dijî ola Îslamê û şerê ((mocahidan)) dikin. Kurd şerê leşkerên Xwedê dikin, yanê ((Da`îşa terorîst leşkerên Xwedê ne))!!??
Hihihih… hihihi… ku Da`îş leşkerên Xwedê ne, Xwedêyê wan li wan û serwerên wan pîroz be û xwedênenasiya Kurdan jî li Kurdan pîroz be. Li hember

ramanên wan ên tarî tenê Kurdan Xwedê rast naskirine. Yekem car lawên vejînistanê Xwedê naskirin û li roja Newrozê pûtên xwedênenasiyê hatin şikandin û herifandin.
Giyanê lawên rojê ji dêrîniya axa welatê rojê ye, ji ber wê jî hertim ronahîperest in û hertim jî di şerê li hember tariperestiyê de ne. Belê Kurd ronahîvejîn in.
Wêrekiya "Stêra" pêdar ne xewna şivanekî yan jî çîroka ji xeyala rêwiyekî bê nasname bû. Ji bo hebûna lawên rojê belkî wê jiyana xwe ji dest bida, lê qêrîna wê dîwarên tirsê herifandin û got: (إن هلكتُ فلأهلك) hîn jî pesna wê li ser rûpelên pîroz çîk dide.

Bihuşta `EDEN di nav baskên Fîşon, Cihon, Hedaqil[1] û Ferêt de rakêşgeha xewnên mirovahiyê bû.
Belê; Adem jî çavên xwe di wê bihuştê de vekiribûn û li hevjîna xwe "Hewa" gerîbû.
(وأخذ الرب الإله آدم ووضعه في جنة عدن ليعملها ويحفظها)[2]
Bawermendên herfandin û wêrankirinê nabin serwerên bihuştê. Kuştina zarok, jin û mirovan li ba Xwedê gunehê tev mezin e, ji ber wê jî dojeh awêneya mejiyê tarîperestan e. Herweha tarî jî bihuşta ronîperestan e.

*1- Cîhon, Fîşon, Hedaqil û Ferat navê çemên Kurdistanê ne, ev nav di pirtûka pîroz Incîlê de hatine.*
*2- Sifr Eltekwîn 2/8/15.*

Ne "El Lat û El`ize" na, lêbelê Nahûm, Yonh, Hobakok û Danyêl li Kurdonîsê neviyên Nûh[1] bûn. Ev ax pîroz e. Vêca hin bi şaşbûn derbasî dîrokê bûne û dixwezin bi tariya xwe ronahiyê vemirînin. Ji ber wê jî destdirêjiyên xwe yên xwînî û qirêj li lawên ronahiyê dikin û hewil didin ku jiyanê têxin nav lêvên destarê tariyeke bê dawî.

Kanî, çem û daristanên fêkiyan gilîzê Beyabaniyan diherikandin, hîn jî ji talanê têr nebûne, lê ferişteyên Kurdonîsî pêdar in. Di hemû serdeman de niştecihên jînistanê bi tava ronahiyê tarî di hebanê wê de rûxandine.

Dîroka tarîperestiyê ne veşartî ye. Dema ku lawên ronahiyê jiyan vedijenandin û perestgehên mirovperweriyê ava dikirin, hîngê zordarî û dilbikînî bûbûn destûra serdemeke pûç û şerê mejiyên ku berê wan ronahîbû dikirin. Lewma herdu memikên Mezobotamiya derbûn. Cûdiyê pîroz hemêza xwe ji jiyaneke nû re vekir û kevoka sipî bû nîşana hêminî û aştiyê.

[2](واستقر الفُلكُ في الشهر السابع في اليوم السابع عشر من الشهر على جبال آراراط)

Kurdistana ku Çiyayê Kurmênc cîgera wê ye, hertim aştîvejîn e. Hevpeymana ku di navbera Xwedê û bapîrê Berhîm de keskesor bû. Ew jî jînistana lawên ronahiyê bû.

*1- Nahûm, Yonh, Hobakok û Danyêl û Nûh navên pêxemberan in, û ew tev li Kurdistanê hatibûn dinê.*

*2- Sifr Eltekwîn 8/1/4.*

(إذ يشرق قوس قزح الرب الساحر في جبال ووديان كردستان)

Îro jî keskesora aştî, wekhevî û azadiyê di nav lêvên gelî, newal û li ser sîngê Çiyayê Kurmênc keskesor in. Lê aramî û hêminî li heza şevşevokên tariyê yên xwînmij netên.

Zor û dijmirovahiya Nînewa zelaliya ezmên û mirovên gewre tengijandin. Lê yên ku ji memikên dadweriyê mêtibûn ne xewkirî bûn.

Danyêl û Nihûm mizgîniya serwerî û mirovperweriya lawê aştiyê nîşan dan. Zagrosî bûn pêlvedan ta hîrehîra hespên wan li pêlên deryaya Sipî siwar bûn. Wan çavdêriya ezmên dikirin û li hilatina stêrka Yesû`h dipan. Xwediyên mizgîniya mezin bûn û daxwezên Hîrodos avêtin pişt guhên xwe.

(لم يستطع هيرودوس أن يخدع حكماء الكرد)

Ji pêxemberê aştiyê re diyariyên dilsoziyê biribûn. Belê ronahîperest nabin dostên tarîperestan û dizanin ku xelatên pîroz ji kê re diyar bikin. Vêca çima peyrewên pêxemberê aştiyê jî çavên xwe digrin û naxwezin ku lawên royê jînistana xwe ji nav lepên tarîperestan rizgar bikin.

(وأتوا إالى البيت ورأوا الصبي مع مريم أمه... ثم فتحوا كنوزهم وقدموا له هدايا...)[1]

*1- Sifr Eltekwîn 1/9/12.*

Nasnameya Asrobaykan di bêdengiya Ormiyayê de doza vejîneke nû dikir. Careke din çirûskên ronahiya serdemên dûr di navbera erd û ezmên de, di şerekî giran de ne.
Erê… belkî jî na li Erdbihuştê Dexdewê ji şîrê mangeke pîroz peyalek bi ser xwe ve kiribû. Piştî ku heyvê neh ramûsanên dilovan diyarî lêvên Zagrosê dêrîn kiribûn, giyanek bi baranê re dawerî ser dawa Erdbihuştê û ezmanê Rojhilat bi kevanê pîroz dilşad bû.
Nemrûd û Birotoş[1] hevbendên tariyê bûn, lê agirê hûrik û êzingan kurê Azer neşewitand. Hêviyên pîrejinên piştqop bi wan re binax bûn û hîn jî li Ruhayê masiyên kaniya Berhîm pîroz in.
Sihirbaz û bijîşkê derewîn "Birotoş" hewil da ku giyanê ji ronahiyê bikuje û perda tariyê li ser mejiyê mirovahiyê qaling bike, lê dilopên baranê ax avis kirin û bîna axê li ba Kurdan pîroz e.
Zeredeşt di heftdeh buhariya xwe de kembera pîroz li nava xwe gerand û gotina rast, karê baş û niyaza çê bûn rêbazên jiyanê. Lê hîn jî Ahrîman û Ahoramezde di şerekî bê dawî de ne. Şerê aştî û cengê ye… Şerê mirin û jiyanê ye, şerê tarî û ronahiyê ye… Şerê zanîn û nezanînê ye. Belê çîroka roj û şevê berdewam e.
Li ser her perteweke rojê tabûrên dadxweziyê di doza

*1- Birotoş: Bijîşkê ku hewil da Zaredeşt bi jehrê bikuje.*

zelalkirina mêjî de ne. Tucarî jehra maran nabe meya jînê. Li Kurdonîs ronahî pijiqî, hin jî di nav Kurdan de Ferî û Ferîn hene û sonda giran bi royê ye.

Tê gotin: "Çawîr li ser koka xwe zîl dide". Şûrê Toraniyekî "Belexî" bi girî kir û Anahîta kembera pîroz li nava xwe vebrûsand. Ne tenê peyrewên ronahiyê, lêbelê Kurd hîn jî jiyanzê ne.

Di nav zendên çiyayên ku ji memikên ewran dimijin de, hilma vejîneke nû ji gund û bajaran berve çavên ezmên hildiperike, dîsa rengê mirovatiyê serast tê tomarkirin.

Deştên ku dîroka berf, seqa û xewa Zivistanan li ezber kirine û di dawa wan de pir hêvî hatin nenîkirin, îro zincîra demsalên ziwa û stewir xistine stiwê jînkujeran.

Şopewarên di paşela welatê mirovahiyê de, ku hîn çîroka şaristaniyê di guhên axê de diherikînin di kelecan, zaroktî û hebûna baran û azadiyê de ne.

Çem û kaniyên ku ferişte û perwîn ji sîmfoniya wan serxweş dibin û di zelaliya wan çem û kaniyan re bêrîvanên çariksipî çavên xwe ji simbêlsoran re kil didin, dîsa peravên wan bûne wargeha cixcixa çûk, fixana bilibil, çîkçîka çûkezer û avjenîngeha qaz û ordekan.

Arama pîr li ser dawiya xwe digrî, çavlirêmayîna ku temenê pir di berîka xwe ya tarî de nifşan bê şahî revandibû, îro li dawiya riya revê tol dibe.

Gelî, newal û rebezên ku guhên wan bi bêdengiyê hatibûn pêçandin û pêsîrên wan ên dilovan bîre hêlûna kewşîn û tivîrkan kiribûn, îro ji vedenga lîlî û helbestên şanaziyê jiyanvejîn in.
Xapînokiya demên berzer li nava çerxên çavsor hatiye gerandin û nema hêvî di kûzê xeyalan de celq dibin. Tirs; di malçûka tariyê de hatiye nişkekuştin… Sirûda berbangê Azadistan e. Lewma jî lawên tariyê berîkên Rêbendanê ji gefûgurên xwe dadigrin û hemû tarîperest li hawîrdora xwe civandine.
Ma gelo lome ji Rêbendê dibin?! Wê Berfenbar bê berf oxir kir û dem di nav roj û şevên xwe de giraaan giran rêkir. Xelkê Efrînê nemaze cotkar û xwediyên pêz rojên wê bi tiliyên xwe dijmartin û ji hev re digotin: Yazdeh roj ji çile mane. Yanê Zivistana dijwar hêdî hêdî bi dawî dibe û gavên demê ji Buharê ve nêzîk dibin.
Ma gelo gunehê Rêbendanê heye?! Nozdeh rojan gefûgurên peyrewên tariyê dixwestin ku sibehên wê xwînî bigrîn û berazên sedsala bîst û yekê derbasî nav gulistana jiyanê bibin. Lê Rêbendanê nizanî ku wê bibe firkek ji firkên dîrokê û nifş li pey nifşan dê çîrok, roman û serpêhatiyan li ser bixwînin.
Di navbera Rêbendan û Avdarê de tenê bîst û heyşt roj hene û navê wan Reşmeh e. Têkildariyeke bi du rûyan di

navbera Kurdan û Avdarê de heye. Ruyekî wê bobelat, xwîn û talankirin e û yê din jî şoreş, serhildan, şahî û serkeftin in.
Li roja nozdehê Rêbendanê royê xartirê xwe ji welatê zeytûnan xwest û di nav lêvên zincîra çiyayên Amanos re pertavên xwe ji nav porê darên Zeytûnê kom kirin. Ramûsana xwe ya dawiyê li ser çiyayê Bilbilê (Zoyê Giran) li pey xwe hîşt.
Tevlî ku şevên Rêbendanê dirêj û sar in, lê çiyayê Bilbilê, Hawar û Lêlûn bê xew bûn, ji ber ku tucarî baweriya wan bi tariyê nîne. Li wê şevê darên kelemê û zinarên Çiyayê Kurmênc soz û peyman ji nû ve didan lawên ronahiyê ku jê re bibin pişt û tucarî nahêlin ku peyrewên tariyê fersenda wan bibin.
Li wê şevê bêdengiyekê xwe li têlên sînor alandibû û di pişt sînor de jî şerekî bêdeng gur dibû. Li paytextên ku ji xwîna mirovan têr nabin, di ber piyalên meyê re xalên dawî danîbûn ser pîlanan.
Li wê şevê li gundên Çiyayê Kurmênc şîrmijan memikên diya xwe dipelandin û di ber wê pelandinê re dayîkan wêneyên pakrewanan di pêş çavên xwe re derbas dikirin, li baskên xeyalê siwar dibûn û meraq dikirin ku li stranên xortên Efrînê yên ku li çeperan bûn guhdar bikin.
Li wê şeva Rêbendanê gundê Qurnê çend awirên

kurdewariyê diyarî gundên Şingêl û Baliya dikirin. Çiyayê Kurê nameyên berxwedanê ji çiyayê Bilêl werdigirtin û di guhên gundê Umeran de dikire kurtepist.

Li wê şeva Rêbendanê, pira Eşargê di gewriya tûnêlê re nameyên bajarokê Reco dibihîstin û vedenga gavên ronahîperestan li çiyayê Qerebêlê wêrekiya heft gundên Meydana bilindtir dikir.

Li wê şeva Rêbendanê, di nav lêvên geliyê Meydana de sirûd û helbestên pêdariya Efrîniyan dihatin hûnandin. Darên zeytûnê yên ku di hemêza deşta Camiyê de li hember gundên Elemdara, Çençeliya û Çeqmaqa semaya dêrîniyê diyarî gorên pakrewanan dikirin.

Li wê şeva Rêbendanê, çiyayê Hawarê guhên xwe baş vekiribûn, ji aliyê rojava ve guhdariya pêlvedana vîna lehengan dikir, ji aliyê rojhilat ve li semaya heyvê ya ku li ser dêmê gola Meydankê mêze dikir. Ji aliyê bakur ve bi pozbilindiya birayê xwe çiyayê Bilêl şahiya xwe hene dikir û ji aliyê başûr ve li şewqvedan û xemla bajarê Efrîna rengîn temaşe dikir.

Li wê şeva Rêbendanê, rîşiyên geliyê Şiyê xwe didan ber ezmûna pêdariyê û firkên wî soz didan ku lêvên xwe ji biyaniyan re venakin. Geliyê Salên guhdariya sirtên li hawîrdora xwe dikir û nameyên serpêhatiyên çerx û felekê ji darên guvîjan re hewal didan.

Li wê şeva Rêbendanê sirtên gundê Erendê, Merwaniyê bajarokê Şiyê çîrokên şanaziyê ji mêrxwezan dibihîstin û carina jî tinaz bi çeqelên çiyayê Gewir dikirin. Riya Deveyan (Deveyolê) ta danê sibehê qeflên şêr û pilingan dijmartin.

Li wê şeva Rêbendanê, bayekî sar li deşta gundê Hemamê pêl dida û kaniya wê ya avgerm bi hilma xwe kulîlkên dara Êngidiniyê diparastin. Li wê şeva Rêbendanê, deşta gundê Dêrbelûtê û Dêwa bihna axa xwe di pozê berxwedêran de berdida û çîrokên cirîda hespên Keyxisrewiyan ji stêrkên şevê re hewal didan.

Li wê şeva Rêbendanê, bajarokê Cindirêsê li ser navika deşta Cûmê dawa xwe rêxistibû û li hawîrdora wî darên zeytûnê ji aliyekî ve awirên heyv û stêrkan werdigirtin, ji aliyekî din ve jî çavdêriya pîlanên sermeya çilê zivistanê dikirin. Di zikê girê Cindirêsê de destane û efsaneyên serdemên dîrokî ji nû ve wek çirûskên di nav tariyê de çîk didan û serûberê deşta Cûmê ji wan çirûskina re pîrozbahî pêşkêş dikirin.

Li wê Şeva Rêbendanê, çiyayê Lêlûn serûberê deşta Cûmê hemêz kiribû. Li kenîseya Colyanos a ku li gundê Beradê paytexta kevnar a çiyayê Lêlûn xwedêwend "Nebo" û Marmaron gihîştibûn hev û nimêja yekdestî û yekrêziyê dikir.

Li wê şeva Rêbendanê, li gundê Basûfanê dengê du`aya

şevê ji Qubeya Şêx Elî dihat. Vedenga hawarên kela Sem`anê di guhên geliyê Piling de diherikîn. Li wê şevê, şikefta Duderiyê bi hemû serdemên xwe yên mêjoyî payî û hişyar bû.
Li wê şeva Rêbendanê, ava kaniya Basûtê wek her şevê diherikî, lê awazên wê wek awazên Zemra Cemîlê `Elik bûn. Hilma kaniya Basûta binavûdeng bi ser keleya Betalê Betêl de rêdiket û çîroka kuştina wî bi destê Osmaniyên destbixwîn li ser kevirên kelê teze dikir.
Li wê şeva Rêbendanê, gotinên Mihemedê Gêncê yê ku ji deh salan de çûye ber dilovaniya Xwedê ji nû ve wek pendan li gundên deşta Robariyan li ser zimanê Kurdên wê deverê çîk didan. Belê; wî gotibû: **Ku ez mirim Skenderonê ji bîr mekin.**
Li wê şeva Rêbendanê, çiyayê Parsexatûnê yê pêdar û navdar çîroka pêxember Dawod û Oriya di newqên xwe de eşker dikir. Li ser sîngê Parsexatûnê di qubeya Şêx Hemîdê Ezdahî de dengê lavêjan bi kurmanciya zelal ber bi ezmên de pêl didan. Li wê şevê, vedenga lavêjên zareta Şêx Şerfedîn li gundê Bafilûnê digihîşte gundê Dîkmedaş û Dêrsewanê.
Li wê şeva Rêbendanê, Çêlxanê dilopên avê wek ên rondikên bûkan ji memikên xwe yên kevirî dibarandin. Li deşta gundê Turindê û Qîbarê vedenga Qewalan ji zikê

gir û goristanên kevnar li deşta `Erşê diçêwirî.

Li wê şeva Rêbendanê, giyanê Nûrî Dêrsimî seredana goristana pakrewanan kiribû û hin ferişteyan jî kîtehelbesta ku li ser gora wî hatiye nivîsandin dixwendin:

**Dilbirîn im bi nalîna welêt**
**Li ser vê riya dijwar**
**Min jî kire pir hawar**
**Da ji bo we jî rojekê**
**Dunya bibe gulbuhar.**

Li wê şeva Rêbendanê û li pişt sînorên ku ji derewa dîrokê ne, tariyê di hev de vedida û xwîna tarîperestan di tamarên wan de ji bo talanê dikelî. Li pişt wan sînorên ku ji kîndariya dagîrkeran hatine danîn, alavên kuştina mirovan li hember Çiyayê Kurmênc şêweyên dijîtî û dagîrkeriyê amade dikirin.

Li pişt wan sînoran, mejiyên ku ji tariyeke dîrokî avis bûbûn, mûşekên kuştinê amade dikirin û bi zimanê tirkî li ser wan dinivîsîn:

**- Seçen ailesine Efrîn selamlar. Yanê Li Efrînê malbatekê ji xwe re bineqîne û silavên me bigihîne wan.**

Pirsa Efrîniyan ji eywan û dadgeha Xwedê ev bû: Ma çi cûdatî di navbera Ejdehak û Diqilyanos de hebû?! Ma gelo

fermanên te jî li gor serdeman in, yan jî guhên ezmên ker bûne?! Em bawer in tu ji zordaran re nahêlî. Lê ta kîngê?
Li pişt wan sînorên ku nava welatê lawên ronahiyê bi têlên zikreşiyê hatiye birîn, leşkerên tariyê xewnên talankirina jînistanê didîtin û gilîzê hovîtiyê rihên wan ên dirêj dilewitandin.
Li wê şevê şaxên darên zeytûnê li soz û sonda Xwedê dipirsîn û carina jî lome dikirin. Çima destbixwînan jî wek enfalperestan pîroziya wan birîn kirin. Belê; li wê şevê Ahoramezde û Ahrîman di şerê rastî û nerastiyê de bûn… Di şerê ronahî û tariyê de bûn… Di şerê guneh û bêgunehiyê de bûn… Di şerê jiyan û mirinê de bûn…
Li wê şevê gundên Çiyayê Kurmênc çîrokên jiyan û mirovatiyê ji pêsîrên xwe dimêjandin û hêviyên siberojê bi hilma axê hene dikirin. Li aliyê din paytexta ku bêfilên wê ji hilma xwîna Kurdan û dûmana reş têr nabin, ji bo nişkekuştina jiyanê di tevgera amadekariyê de bû.
Eger mirovatî bi xencera hovîtiyê birîn dibe, hîngê hemû pirs rewa ne.
Li sibeha 20 ê Rêbendanê tîrêjên royê di asoyekî hêmin û ezmanekî zelal re awirên tîna xwe diyarî Çiyayê Kurmênc dikirin. Xwendekaran pirtûkên xwe vekiribûn û ji bo ezmûna nîvê salê amadekarî dikirin. Şivanan pez berve çolê der dikirin û pîrejinan li hawîrdora gundan

pincar berhev dikirin. Di hemû waran de bajarê Efrînê û gundewarên wê wek her rojê jiyan geş kiribûn, lê di dilê her Efrîniyekî/ê de hêviyên ku di sala 2017an de çelmisî mabûn, wan li ber xwe didan ku di destpêka 2018an de evîna wan geş bibe û ber bide.

Li nexweşxana Avrînê, Bêrîvanê di riya mobayila xwe re bi destgirtiyê xwe Rojdêr re bi zimanê evîndariyê dipeyivî û jê re digot:

- Ez ji te hez dikim û min pir û pir bîre ken, nêrîn û gotinên te yên xweşik û xunavî kiriye.

Rojdêr jî jê re digot: Bêrîvanê! Her ku baran dibare ez wêneyê te di nav dilopên wê de dibînin. Dema ku şev sar dibe tîna dest û gotinên te giyanê min germ dike. Min pir û pir bîra çavên te yên reş û bejna te ya zirav û lihevhatî kiriye… Ez ji te hez dikim…

Royê hêdî hêdî nava ezmên dipîva û ber bi rojava de rêdiket. Pîrejinan sobeyên êzingan ji sermaya şevê re amade dikirin, lê piraniya zarokan li ber tava royê govdeyê xwe yê teze germ dikirin. Efrînî nizanin ruyê xwe li jiyanê badin û demê vala û pûç bihêlin.

Hêdî hêdî siha darên zeytûn, berûk û merxê ber bi rojhilat ve dirj dibû û zincîra çiyayên Amanos hin bayê sar di nav lêvên xwe re berve Çiyayê Kurmênc têve dida.

Kolanên bajarê Efrînê mîna her rojê ji xelkê pêl vedidan.

Hin xortan avgul û bînxweş ji evîndarên xwe re dikirîn, hinan di riya mobayilan re li heval û dostên xwe digerîn ji bo sozê şevbuhêrkê ji hev re dînin û hinan jî ji bo parastina taxên bajêr xwe amade dikrin.
Keçan bi destên hev girtibûn û dimeşîn, lê carina li pêş cama zêrfiroşan disekinîn û çavên xwe li gustîlkên destgirtiyê digerandin û carina jî li pêş cama cihên ku cilên bûkan difrotin radiwestîn û rengê sipî dihîşt ku gupgupên dilê wan şêstî derbas bikin. Belê; Efrînî û jiyanê hevcêwî ne… Erê Kurd jiyanperest in. Lê!?
Tik, tik, tik… demjimêrê temenê roja Şemiyê ya bîstê Rêbendana 2018an kêm dikir û Efrîniyan di mihraba jiyanê de hêviyên siberoja xwe dimêjandin.
Efrînî baş bi zimanê birûskan têdigihên û baş dizanin ku çawa humîn û gurmîn bi ewran dikeve, lê tucarî fêrî zimanê şewat, kuştin û xwînrijandinê nebûne.
Tik… tik… tik demjimêr bûn sê û sêzdeh xulek. Hîngê zelaliya ezmanê Çiyayê Kurmênc ji dengê balefirên kujer û kîndariyê bû vedenga hovîtiyê. Heftê û du balefirên ku tenê kuştina xelkê Efrînê di nav baskên xwe de rakiribûn, wan bombebarana xwe di ser jînistanê de barandin. Hîngê kalemêrekî Şêrewî derket ser banê mala xwe û got:
- Hoooo berazino…! Pir ji zû ve me tirs kuştiye… Tenê em dizanin nêçîra beraz û rûviyan bikin… Hooo

kodikinooo! Ferişteyên vê bihuştê ji zû ve soz dane ku wê kujeran li pêş deriyê dojehê rêz bikin.

Li erdê gormîn û dûmana reş, li ezmên giregira balefiran û dûmana kîndariyê tev hev dibûn. Li gundên Zirêgat, Gubel, Cilbir, Soxanekê dumana reş ber bi ezmên hildikşî. Lê Şêrewiyan li ser banê xaniyan tinaz bi paytexta virniyê sultanan dikirin.

Pîrejinekê bi zaravayê Şêrewa ji xortekî pirsî: Law çi heye law! Wî lê vegerand û got:

- Pitê…! Tarîperest hewil didin ku Efrînê dagîr bikin.

Pîrejinê jê re got: Kurê min dagîr çi ye law!

**Xort:** Pitê…! Yanê dixwezin Efrînê ji xwe re bibin.

Dema ku wê pîrejinê bersiva wî xortî bihîst, wê lîliyek li ser zimanê xwe azad kir, tiliya xwe ya nîşanê ber bi ezmên de direj kir û got:

- Ey çavsor û çavberjêrino! Berê jî pir caran we xwest ku me tune bikin, lê em ne ji xewneke leq in, em dengê hebûnê ne û em li welatê xwe dimînin, dimînin û dimînin.

Mala wê pîrejinê li tenişt riya ku diçû bajarê Efrînê bû. Piştî ku wê gotina xwe bi dawî kir, giropek xort û keç ên ji gundên Şêrewa çek li piyan bûn, di ber mala wê re derbas bûn û wan tevan bi hev re digotin:

*Çiyayo...!*
*Lo Lêlûnooo!*
*Bê xem be*
*Pêdariya me*
*Ji sertiya zinarên te*
*Yên rengşîn e.*
*Şêrewa dilkevirî..!*
*Bê kovan be*
*Newal û geliyên te yên dilsoz*
*Wargeha lehengên dêmaxî ne.*
*Ne îro*
*Ne siba*
*Ne jî dusiba*
*Tu nabî hemêza çeqelan*
*Lêlûnooo!*
*Rehên Şêrewiyan*
*Di nav lêvên xaka te de çîk vedidin*
*Gupgupên dilê me*
*Ji vedenga Duderiya Nîyandirtalan in...*
*Em in…*
*Bahoza hêrs û vîndariyê*

*Lo Lêlûnooo...!*

Her ku giropên xort û keçan bi çekên xwe di nav gundên Şêrewa re ber bi sînorên kîndar ve diçûn, pîrejinan lîlî diyarî wan dikirin. Kalemêran tiliyên xwe bi jor de bilind dikirin û digotin: Serkeftin an jî serkeftin… Îro roj roja mêran e.
Li gor fermanên ji paytexta kînê balefirên kujer ezmanê herêma Çiyayê Kurmênc li çûn, hatin û zêvirandinê mûşek di ser jînistanê de dibarandin û wan hewil didan ku bêtirîn xelkê sivîl bikujin û yên mane jî dest ji gundewarên xwe berdin û ber bi dervî herêmê de der bin. Gundê Qestel Cindo û çiyayê Paresexatûn didane ber mûşekên têrkîn û zelaliya ezmên ji dûmana ku wek mejiyê reş tevlehev dikirin.
Li gor biryar û fermanên ku ji paytexta kînê divê ku di roj û şevekê de vîna gelê Efrînê lawaz bikin û serûberê herêma Çiyayê Kurmênc dagîr bikin. Lê dema ku Efrînî derbasî qada şerê hebûn û nebûnê dibin, hîngê hemû xwedêwendên serdeman seyr û şêtûmêt dimînin.
Dema ku wan balefirina navçeya Şera bombebaran dikirin û mal di ser serê sivîlan de hildiweşandin, li gundê Bafilûnê kalemêrekî Ezdahî li bin dara zeytûnê ya ku li pêş mala wî bû, destên xwe dabûn koka darê û bi jor de mêze dikir. Wî bi dengekî bilind digot:
- Tirekinooo! Ev der Çiyayê Kurmênc e… Efrîn e Efrîn

ha. Lê xuya ye ku hûn li gora xwe digerin. Sond bi ocaqê Şêx Şerfedîn emê sînorên Efrînê ji we re bikin goristan.

Li gundê Qestel Cindo pîrejinek li pêş deriyê mala xwe sekinî bû, destên xwe kiribûn navkelên xwe û li ezmên mêze dikir. Dema ku balefiran agir di ser sîngê çiyayê Parsexatûnê de dibarandin, wê bang li kurê xwe yê mezin kir û jê re got:

- Lo Xidiro! Kurê min Xidiro! Tivinga birayê xwe Celîl rake û bi lez xwe bigihîne çeperên berxwedanê. Kurê min! Çendî dilê min dixweze ku ez lîliyeke şengalî li ser zimanê xwe ji te re azad bikim. Kurê min Xidiro! Ev ax û ev welat rûmeta me ne. Kurê min! Banga rûmetê dest pê kir tu bilezîne û xwe bigihîne nav keç û xortên Efrînê yên ku bi xwîn û giyanê xwe Çiyayê Kurmên ji dizên serdemê diparêzin.

Belê roja Şemiyê, bîstê Rêbendana 2018an bû. Ezmanê Çiyayê Kurmênc ji balefirên kina serdemê dêşî, dêşî û dêşî. Li navçeya Bilbilê hemû gundên li ser sînor bi hovane dihatin bombebarankirin. Di wê rewşê de lawên ronahiyê ji hêlûnên pêdarî û lehengiyê mîna piling û şîpan ji hemêza zinar û keleman derdiketin û vedenga berxwedanê di gelî, newal û rebezan de dibû sirûda rûmet û serbilindiyê.

Bîstê Rêbendanê, roja bêrûmetiya cîhana pêşketî bû. Ezmanê Çiyayê Kurmênc ji aliyê balefirên paytexta zikreşan ve hatibû dagîrkirin û kîndariya xwe ya sedsalan li ser jînistanê dibarandin.

Li navçeya Meydana kalemêrekî pişta xwe ya ku barên giran û sivik dîtibûn, dabû koka DARA SÎDARÊ ya li çateriyên heft gundên Meydana û nihrînên xwe yên pîr di bin herdu gurzên mijangên xwe re berve çiyayê Behîvê rêdikirin. Wî serpêhateyên xortaniya xwe yên li Bena Mêşê li bîra xwe tanîn. Hîngê xortek bi bez di tenişt wî re berve dervî gund diçû. Wî bi dengekî pir bilind ji wî kalemêrî re got:

- Apê Şêxmûs! Biçe mal balefir herêmê bombebaran dikin.

Şêxmûsê kalemêr ger deng ne bilind bana nedibihîstin, lê wî dengê wî xortî bihîst û tavilê jê re got:

- Balefir û marefirên wan mûyekî jî ji biriwên min qij nakin û tenê tiliya min ya nîşanê dizane ku çend Anadolî li ser wan sînorên derewîn di xwîna wan de vegevizandine. Wî bi zaravayê Meydana got: Ezê li wan re kim.

Hîn balefirên kujer bi dehan cih û gundewarên herêma Çiyayê Kurmênc ji xwe re dikirin armanc û kîndariya xwe di ser de dirjandin, çend girop ji xelkê gundên

Meydana li pey hev berve geliyê Hêtan û Bena Birîkê rêketin û wan hemiyan bi yek dengî digotin:

*Berxwedan jiyan e*
*Serkeftin an jî serkeftin e*
*Vir Meydana ye*
*Dîsa meydana dijmin e*
*Em in lawên ronahiyê*
*Dijberên tariyê ne…*

Li roja bîstê Rêbendanê, serûberê cîhanê li hember balefirên dewleta Tirk bi nexweşiya korbûnê ketibû. Wijdanê cîhana bêbext di kerxaneya çavberjêriyê de tevizî bû. Paytexta "Lînînistanê" ahengên xinziyê li dar xistibûn û piyalên votka ji çêja xwîna sivîlên Efrîna berxwedêr bû.

Li navçeya Bilbilê Şêxoyê şêst û pêncîsalî bizinên xwe xistin hindurê hewşê û ji hevjîna xwe re got:

- Elîf! Eger ez şehîd bûn, ji bîr meke çar lîliyan li ser zimanê xwe azad bike û her ku tu hatî ser gora min tenê bibêje:

- Pakrewan ronaka azadiyê ne.

Şêxo tivinga xwe ji nav nivînan derxist û ber bi çiyê de çû. Berî ku ji nav malan derkeve hevalê wî yê şivan Xeloyê Dirêj rastî wî hat û jê re got:

- Şêxo bira! Tu bi kû de diçî?

**Şêxo:** Îro roya mêran e. Şerê man û nemanê dest pê kir û divê ez di nav berxwedêran de bim.

**Xeloyê Dirêj:** Bira Şêxo! Tenê çend xulekan li benda min bimîne, ez biçim tivinga xwe ji mal wînim û bi te re biçim.

Li roja bîstê Rêbendanê, balefiran barê xwe yê kujeriyê li ser gundên çiyayên Me`mila boş dikirin û rê li pêş refek balefirên din vedikirin ku gundên navçeya Cindirêsa binavûdeng ji xwe re bikin armanc û şîrmij û zarokan. Hîngê paytextên ku doza Îslameke sexte dikin, oldarên wan serê xwe xistibûn paşela qehpikan û lavêjên serkeftinê ji kujeran re dikirin.

Li bajarê Efrînê komek zarokên neh-dehsalî li lîstgeha gokê li hev kom bûbûn û di bin wê bombebaranê de bi yek dengî digotin:

Em in lawên royê
Qet natirsin ji tariyê
Naaa.. na em natirsin
Em in rengê vîndariyê
Naa.. na; qet natirsin em
Ji top û tangên kîndariyê

Wan zarokina stran digotin û balefirên duyemîn hêza ji hevbendiya Natoyê bi kîneke hovane serûberê Çiyayê Kurmênc bombebaran dikirin. Belê; hîngê dûmanek reş li

ser gundê Turindê rêz dibû.
Roj bi rûyekî bêzar di pişt deryaya Sipî de winda dibû û şevê konê xwe yê wek mejiyê tundrewan reş li ser Efrînê vedigirt. Belefirên kujer li ezmanê Efrîna Kurdan kîna xwe sivik nekirin û ji sê aliyên sînorê Çiyayê Kurmênc ve topbarana çavsorên wijdançelq li ser gundewar û sivîlên Efrînê bêtir tûj dibû.
Piraniya xelkê Çiyayê Kurmên di seferberiyeke dîrokî de bûn û ji bo şerekî dirêj û dijwar xwe amade dikirin. Li mala Şemo yê heftê û heftsalî mêvanên wî li televizyonê temaşe dikirin û nûçe dişopandin. Qenaleke bi zimanê kurdî hin wêne derxistin ser ekranê û yê ku nûçe dixwendin digot:
- Hin xelkê Amedê di mizgeftan de Quranê ji bo leşkerên dewleta Tikiyê dixwînin û lavêjan dikin ku ew li hember Kurdên Efrînê bi ser kevin.
Şemoyê heftê û heftsalî bi hêrsek tuj got:
- Ji ser van nokeran bidin alî, bila dengê wan netê min… noker in noker.
**Misto:** Apê Şemo! Çima tu ewqas tengijî, ma ne nuçe bi zimanê Kurdî ne?!
**Şemo:** Law; ma tu nabihîsî ku ew nokerina çi dibêjin?! Hîn dîwarên wê mizgeftê gotinên Şêx Se`îdê Pîran û hevalên wî Şêx `Elî, Şêx Xalib, Reşîd Axa û Teymor

Axa…. ji bîr nekirine. Dîroka 30. 06. 1925an ne ji mêj de ye. Mixabin hîn noker di nav gelê Kurd de hene û ji kujerên ku zarokên me dikujin re lavêjan dikin!!! Ma tiştek ji vê kêmtir û bêrûmetir heye?!

**Misto:** Apê Şemo! Tu rast dibêjî. Kesên ku nokeriyê ji dijmin re dikin, li dawiyê bi destê wan dijmina tên kuştin. Hîngê jî Atatorkê şofen ji wan nokerina re got:

- Hûn pîstirîn mirov in li ser rûyê gozemînê. Ji ber ku we xinizî bi şoreş, rûmet û xweşewîstiya xwe kir û ew kuştin. Li çeperên şer lawên ronahiyê dîroka lehengiyê li ser sîngê demê nîgar dikirin. Efrînî tev hişyar bûn û xew derbasî çavên wan nebû. Niştecihên her gundekî biçûk û mezinan ala seferberiyê bilind kirin û her yek li gor kanebûn û zanebûna xwe di nav berxwedanê de bû. Berxwedana Efrîniyan bû… Berxwedan ji bo hezkirina Çiyayê Kurmênc û darên zetûnê bû.

Di wê şevê de Nemrodên sedsala bîst û yekê zor hewil didan ku xwe bigihînin Pozê Belekiya[1], sîngê Zoyê Giran û pîroziya Parsexatûnê[2] ta ku serûberê bihuşta Çiyayê Kurmênc têxin bin çavdêriya xwe. Ji aliyekî ve bihuştê qirêjiya wan nedipejirand, ji aliyekî din ve jî berziya wan hersê çiyan tucarî serê xwe ji talankeran re netewandine.

*1- Pozê Belekiya: Navê cihê gundê Xelîl e.*

*2- Parsexatûn: Navê çiyayê Bersaya yê ku dikeve navbera herêma Çiyayê Kurmênc û herêma Ezazê ye.*

Vedenga mêrxwezî û lehengiyê li geliyê Aşlê[1] û Devê Sukrê[2] zirava rihdirêjan diqtand.
Li wê şevê bi balefir, tang û hemû çekan êrîşa tarîperestan li serûberê bihuşta Efrînê bi hovane berdewam bû. Di nav zinar, lat û darên zeytûnê de vîna Efrîniyan ji berziya çiyayên Şaho[3], Agirî, Sîpan û Biradost bilindtir bû.
Di paşela çiyayê Dozaqê[4] de ferişteyên Kurmancan tiliya xwe ya nîşanê li ser teltîkan diguvaştin û tarîperest di xwîna wan de digevizandin. Li Gêdûka Çetin xewnên çeqelan di bin pêyên lehengan de dihatin civilandin.
Di navkela şevê de û di nav dengê balefir, top û tangan de vedenga sirûdên şanaziyê di nav lêvên geliyê Zilhinarê[5] de dîrok vediciniqandin.
Şeva bîst û yêkê ji Rêbendanê tarîperestan hêviyên xwe yên ku ji memikên faşîzmê mêjandibûn, bi her awakî li ber xwe didan ku vîna kezîzer û simbêlreşên Efrînê ji wan bi revandin bidin. Hihihihi… hihihi…Efrînî dibêjin:

*1- Geliyê Aşlê: Dikeve navbera gundê Sêmala û gundê `Edema.*

*2- Devê Sukrê: Geliyek e, ji deşta Meydan Ekbesê ber bi Meydana ve dirêj dibe.*

*3- Çiyayê Şaho: Çiyakî ji çiyayên zincîra çiyayên Zagrosê ye û li Bakurê Kurdistanê ye. Çiyayê Biradost: Li bakurê Kurdistanê ye.*

*4- Çiyayê Dozaqê: Li nêzîkî gundê Omera û Me`mila de ye. Gêdûka Çetin: Ew jî li wê derê ye.*

*5- Geliyê Zilhinarê: Li nêzîkî gundê Omera û gundê Me`mila ye.*

**- Yê ku destdirêjiyê li me bike, emê teniya reş di wî bidin.**

Demê ku nîvê şevê di gewriya xwe re derbas kiribû, lê haya Efrîniyan ji şevê tune bû, tev di amadebaşiyê de bûn û karê bervaniya ji ber Çiyayê Kurmênc de li hev parve dikirin.

Li gundê Xelîl kalemêrekî heftêsalî ji cîranê xwe Miho yê heyştêsalî pirsî: Li ser van êrîşên dewleta Tirk tu çi dibêjî?

Mihoyê heyştêsalî dest avête gopalê xwe du-sê caran li erdê xist û bi dengê xwe yê mîna şêrekî ku têra xwe nêçîra berazan kiriye got:

- Xelo! Te girê Kitix baş dîtiye? Bersiva pirsa te li ba wî girî ye.

Xelo cîgareke titûnê pêça, bi esteyê pûşî vêxist, dû kişand û di nav simbêlên xwe yên qaling re berda û got:

- Birayê Miho! Ez têenegihîştim ku çawa bersiva pirsa min li ba girê Kitix e!

Mihoyê heyştêsalî serê xwe hejand û dîsa gopalê xwe li erdê xist û got:

- Dema ku Ferensî derbasî herêma me bûn, wan tangeke xwe li ser girê Kitxê danîn û gundên me topbaran dikirin. Rojekê Mistê Leylê û çend hevalên wî bi xençeran xwe ajotin serbazên ku li ser wê tangê bûn. Hîngê gelek jê birîn kirin û ta Mistê Leylê çû ber dilovaniya Xwedê,

şûna sungiya serbazê Ferensî li ser perasiyên wî bû. Xelo! Ev ax ji bilî Kurdan kesekî napejirîne!

Dema ku Miho û Xelo li ber soba êzingan serpêhatiyên Efrîniyan ji hev re hewal didan, hîngê dengê teqînan derî û pencereyên malê dihejandin û pîrejina Miho tiving ji nav nivînan derxist û li tenişt Miho danî.

Xeloyê heftêsalî ji pîrejinê re got:

- Dotmam! Çima te ev tiving derxist û anî li tenişt Miho danî?

Berî ku pîrejin bersiva pismamê xwe Xelo bide, Miho careke din gopal li erdê xist û jê re got:

- Lo Xelo! Temenê min heyştê sal e. Eger hemû hêza cîhanê êrîşên xwe wînin ser me, ez ji vê malê û ji gundê Xelîl dernakevim. Ezê di hindurê malê de bimînim û yê ku derbasî hewşê bibe ezê kêm zêde li ber xwe bidim û çendekan bikujim û paşê çi bi serê min dikin wek hev e. Sond bi gora Şêx Se`îd û Berzaniyê kal, ger ez ne bi lingekî bama, bi vê kalbûnê ezê biçûma çeperên şer û bila bi rûmet bimrama. Lê bila mala felekê bişewite ku lingê min yê rastê bi teqîna mayîneke ku Tirkan di nav darên me yên zeytûnê de çandibûn, berî du salan hate birîn.

Dema ku Miho bi wê hêrs û coşê dipeyivî pîrejina wî ji sendoqa xwe ya bûkaniyê tiştin dixistin tûrine cawî. Xelo ji wê re got:

- Dotmam! Tu çi dixî wan tûrikina?

Pîrejinê got: Pismam Xelo! Her tûrikekî ez hin hejîrên hişk, mûj û kêsme diximê. Ji bo li danê berbangê ez ji xort û keçên ku li çeperên şer in re bibim. Ez bi qurbana wan bim.

Dema ku pîrejinê wisa got, Xelo rabû ser xwe û got:

- Wey li min ma ez li vir çi dikim?! Bi xatirê we. Divê ez jî biçim mal ta ku hevjîna min Fîdan jî hin xwerinê ji şervanan re amade bike.

Berî ku Xelo bigihîne mal topek li tenişt mala wan ket û serûberê gundê Xelîl hejand, lê tiştek bi Xelo nehat. Di wê tariyê de Xelo lezand û çend caran li ser çokan diçû erdê, lê gihîşte mal. Wê topê aliyek ji mala Xelo hilweşandibû û şeş bizinên wî jî kuştibûn. Hevjîna wî ya şêst û pêncsalî hin tûrik di destê wê de bûn û di ser bizinên xwe yên kuştî re sekinî bû. Dema ku Xelo deng li wê kir, wê deng nekir û tenê di cihê xwe de rûnişt. Xelo jê re got:

- Fîdan.. Fîdan! Ma tu bi xêr î?

Hîngê wê jê re got: Belê Xelo ez bi xêr im.

Xelo bi destê hevjîna xwe Fîdanê girt û çûn mala Miho. Li riya mala Miho du xort li wan rast hatin û pir bi lez ber bi gundê Omera ve diçûn. Fîdanê bangî wan kir û got:

- Ez bi qurbana we bim. Xwedê we biparêze.

Dema ku wan dengê Fîdanê bihîstin, herdu sekinîn û yek ji wan berve Fîdanê hat û jê re got:

- Meta Fîdan! Di bin vê bombebaran û topbarana Tirkên faşist û çeteyên wan de hûn bi kû de diçin?

Hîngê Fîdanê nas kir, ku ew xort kurên birayê wê ne û diçin çeperên şerê rûmetê. Wê jê re got:

- Rêzano! Ez bi qurbana te û Hozên bim û Xwedê serkeftinê bike para we. Van sê tûrikina hin mûj, bastiq û hejîrên hişk ku tê de ne, wan bi xwe re bibin. Ez bi qurbana tiliya we ya nîşanê bim.

Hîn Fîdanê wisa digot, çend mûşekên faşitan li tenişt Gundê Me`mila ketin. Rêzên û Hozên xatirê xwe xwestin û bi bez berve gundê Omera çûn.

Li şeva Yekşemê ya bîst û yekê Rêbendana 2018an, ne tenê xort, keç, jin û mêrên Efrînê di berxwedanê de bûn, lêbelê pîrejin û kalemêran jî li her gundekî û li gor kanebûna xwe di seferberiyeke bê hempa de bûn.

Li Efrîna berxwedêr xwîna şîrmij û zarokan bi bombebarana hovane dipijiqî ser dêmên dayîk û bavan. Li Stenbolê paytexta sultanê Osmaniyên zînatkar û olderewîn û li hotêlên pênc stêrkî û yên bê stêrk mozîka dîsko hin azadîxwezên virek û peyvfiroş li ser sîngê porzeran sermest kiribûn. Hinan jî ji bo çûna li seyrangeha "Sotçî" li ber deriyê virniyê sultanên zînatkar di serxweşiya bergeran de bûn.

Carina siha ronahiyeke derewîn jî di nav ronahiyê re derbas dibe…!!!

Balefiran kuştina zarokên Çiyayê Kurmênc diyarî paytexta xwînî dikirin û kulxana ku ji hilweşandina malên gundê Celemê di newala Kaşaxê[1] û Mita Bîştiro re dibû wek ewrekî lomedar û dixwest çavên cîhana bêbext kor bike. Hîngê li gundê Soxanekê pîrejineke heftêsalî bi sîngê xwe girt û ji nişkê ve li erdê dirêj bû. Kurê wê yê mezin têgihîşt ku nexweşiya wê kirîza dil e. Wî diya xwe li tirumbêlê siwar kir û di bin wê bumbebaran û topbaranê de berê xwe dan bajarê Efrînê û hîngê balefiran

*1- Kaşax û Mita Bîştiro : Li nêzîkî gundê Celemê ne.*

newal û gundên çiyayê Lêlûn bombebaran dikirin.

Ji ber ku nexweşxaneyên bajarê Efrînê tenê birîndar pêşwazî dikirin, M. Şêrewî diya xwe bir ba Dr. H. M yê ku pisporê nexweşiyên dil bû. Lê kilînîka wî girtî bû.

M. Şêrewî tirumbêla xwe ajot û bi lez çû kilînîka Dr. M.E û dît ku ew ji nexweşxaneya Avrînê tê. Wî alîkariya M. Şêrewî kir û pîrejin derbasî ser textê ezmûnê kirin. Piştî ku wî karê xwe yê bijîşkî bi dawî kir, raporek ji navê dermanan nivîsand û ji M. Şêrewî re got:

- Metirsî ji rewşa diya te nîne, lê divê dermanê xwe rojane bibe û parêziya xwe jî bigre.

Vêca M. Şêrewî kir û nekir ku Dr. M.E peran bibe, lê wî nebirin û got:

- Di vê rewşa ku Çiyayê Kurmênc tê re derbas dibe de, ne tenê ji te lêbelê hemû nexweş û birîndarên ku tên kilînîka min, ez peran ji wan nabim birako! Divê her Efrîniyek di warê karê xwe de, bi erkê xwe yê berxwedanê rabe.

M. Şêrewî spasiya wî kir û çû dermanxanê.

Dema ku M. Şêrewî rapor da dermanfiroş wî navê dermanan xwend û navê bijîşk jî li ser raporê bû. Wî serê xwe hejand û got:

- Hin li gel û civaka xwe xwedî derdikevin. Perehez jî pişta xwe didin gel û civaka xwe û direvin.

**M. Şêrewî:** Ez têнegihîştim te çi got.

**Dermanfiroş:** Hin bijîşkên ku xelkê Çiyayê Kurmênc in, berê li bajarê Helebê kilînîka xwe vekiribûn û piraniya nexweşên wan Kurd bûn. Dema ku tevlehevî li bajarê Helebê çêbû, hatin li bajarê Efrînê karê xwe yê bijîşkî kirin û bê wijdan pere ji nexweşan dibirin. Ji wan bijîşkina yek pisporê nexweşiyên dil e, lê sed carî mixabin dema ku li roja Şemiyê 20.01.2018an balefirên dewleta Tirk herêm bombebaran kirin, wî zarokên xwe xistin tirumbêla xwe û li ser sînor komek pere dan hevalbendên rêjîma Sûriyê û revî çû bajarê Helebê. Lê hin bijîşk jî bi erkê xwe yê kurdperwerî û mirovatî radibin.

Dema ku M. Şêrewî vedigerî mal, balefiran di ser gundewarên Efrînê de çekên kuştina zarok û sivîlan dibarandin.

Dema ku gihîşte mal, balefirekê li nêzîkî gundê wan mûşekek berda û malên gundê Soxanekê tev hejandin. Hîngê hemû xelk li derve bûn. Bû qêrîna zarokan, wîlwîla dayîkan û tev bezîn û ketin hindurê malên xwe. Tenê du zarokên heyşt-nehsalî li tenişt riya ku di nav gund re derbas dibû, wan kevir berve jor davêtin û digotin:

- Lo Xwedê! Çima tu bi kevirên me van balefirên kujer nêxînî û wan naşewitînî?

Li danê êvarê di riya mobayila xwe re Bêrîvan çend caran li destgirtiyê xwe Rojdêr digerî, lê mobayila wî girtî bû. Li demjimêr dehê şevê Rojdêr ji Bêrîvanê re telefon kir, lê wê birîndarek derman dikir û li Rojdêr venegerand.
Piştî ku Bêrîvanê dermankirina wî birîndarî bi dawî kir, wê hewil da ku bi Rojdêr re têkildar bibe, dîsa mobayila wî girtî bû. Lê Rojdêr namak jê re rêkiribû û weha gotibû:

*- Belkî nema ez karibim bi te re têkildar bibim. Ji ber ku şer pir giran e û piştî vê nameyê nema mobayila min dixebite. Bêrîvana çavreş! Ez pir ji te hez dikim û ji ber hezkirina te û ya Efrînê de ta dilopek xwîn di tamarên min de hebe, ezê li ber xwe bidim û şer bikim. Ez ji te û Efrînê pir û pir hez dikim.*
Bi xwendina nameya Rojdêr re rondikan mijangên Bêrîvanê şuştin û li ser dêmên wê rêz bûn. Di ber rêzkirina rondikan re Bêrîvanê gustîlka di tiliya destê xwe ya rastê de maç kir û got:
- Belê Rojdar ez jî ji te û Efrînê pir hez dikim.

Rojane vîna Efrîniyên berxwedêr bilindtir dibû… Rojane bi yek helwest, vîn û pêdariya lawên ronahiyê li berxwedana li hember tariyê xwedî derdiketin û pilanên peyrewên tariyê têk dibirin. Ji ber wê jî bi roj û şev

hovîtiya êrîşkerên tarîperestan li ser Çiyayê Kurmênc zêdetir û xwînîtir dibû.

Ji aliyekî ve çapemeniya dewleta Tirk û ya hevalbendên wê asta derewên xwe bilindtir dikirin û serkeftinên xwe yên wek ramanên wan sexte ji cîhanê re nîşan didan. Lê rastî ew bû ku ew gavekê jî derbasî nav xaka Efrînê ya pîroz nebûbûn. Bi sedan termên tarîperestan li ser erdê bûn û bi sedan jî ji aliyê lawên ronahiyê ve hatibûn dîlkirin.

Navçeya Reco ne dereweke serdemê ye, ne jî xwedêwendekî di pêna serxweşiya xwe de pençek ax avêtiye wê xaknîgariyê û pişta xwe dayê ye û ne jî ji kavilên xeyaleke beravêtî ye. Lêbelê ji roja roj de Xwedêyê gewre nihrînine xwe yên bihuştane li wê xaknîgariyê çandinbûn û bi demê re gotibû:

- Ev warê zarokên royê ye.

Zincîra serdeman hîn ji gewriya demê tê hilkişandin û her xelekeke wê bi xwe re sîstemeke jiyanê ya taybet peyda dike. Lê xaknîgariya navçeya Reco ne perspaneke ku ji beyabaneke guhêrbar û sincnenas e. Pir caran hov û berazan hewil dan ku wê bikin kavil û xewn hêviyên xwe yên xwînî lê biçêrînin. Lê jiyanperwerên sozdar ji lawên ronahiyê re parastin. Îro jî sozdar in ku vê perçebihuştê ji talanker û tarîperestan biparêzin û efsaneyên berxwedanê

li ser koka darên zeytûn, darmazî, simaq û kezwanê ji nifşên siberojê re nîgar bikin.
**Kevirê ker**; belêêê… belê **Kevirê Ker** li ser pozê çiyayê Kurê di dirêjiya dîroka xwe de dîdevanekî hertim hişyar û dilsoz e. Serdem li pey serdemê û hemû serpêhatî, çîrok û buyerên deşta Reco li tomargeha xwe ya bêdeng tomar kirine û li her sibehê bejna xwe bi kelmizoya gola Hopka dişuşt.
**Kevirê Ker** li havînan li govenda seyrangerên li ber kaniya Batmanê temaşe dike. Tevlî ku navê wî **Kevirê Ker** e, lê pir bi meraq guhdariya stranên seyrangeran dike û vedenga wan di nav lêvên geliyê Ermûtê re li pêlên çemê Ava Reş siwar dike. Li hefteya çarem a Rêbendanê sîngê çiyayê Kurê bi roj û şev nameyên pêdariyeke dîrokî di bîranînên erdê Lûlê de nîgar dikirin û Kevirê Ker dibû dengê berxwedaneke tam ji şanaziyê. Belê; **Kevirê Ker** cîhana ker û kor bi çav û guh dikirin.
Li goristana gundê Hopka kevirên gora Reşîd Hemo mizgînî dida giyanê wî û jê re digotin:
- Îro lawên ronahiyê destaneyine ji meraqên te yên netewî li zincîra çiyayê Reco û bi taybet li çiyayê Kurê û di hemêza **Kevirê Ker** de dihûnin.
Li ezmên balefiran û li pişt sînor jî bombe, top, qurşîn û tangan bi hemû awayan hewil didan ku zarokên royê

bikujin û wan ji gundan bi revandin bidin. Lê dayîkan di paşela ezmên de lîliyên serbilindiyê ji keç û xortan re berdidan û vedenga wan û ya qurşînên lehengên li çeperên berxwedanê dibûn çîkdanên vîna serkeftinê.

Rast e; hîngê zarok, jin û hin berxwedêr jî şehîd dibûn, lê zarokên heyşt-nehsalî sirûda EY REQÎB dixwendin û li paytexta Xwedê vedenga wê dibû destaneya hebûnê.

**Kevirê Ker** dibû deng û dengvedana lehengî û şanaziyeke pîroz û cihê xwe di sîngê tomargeha berxwedana jînistanê de digirt… Belê KEVIRÊ bi guh û binavûdeng.

Li danê êvarê hin kesên temen mezin li bajarokê Reco, li mala Apê Seydo civî bûn û li gor zanebûna xwe gengeşe li ser rewşa şerê tarîperestan ê ku li ser herêma Efrînê bi hovane berdewam bû dikirin. Ji dengê teqîneyan camên penceran şikestî bûn. Lê soba êzingan sermeya ku derbasî hindurê malê dibû ko dikir.

**Bilo:** Berî ku ez bêm vir kurê min Navdar ê ku li eniya şer a pêşîn e, ji min re telefon kir û got:

- Li seranserî sînor şer giran e. Navdar û keça birayê min Nazdar li eniya gundê Hemamê ne. Xwedê serkeftinê bike para wan.

**Reşît:** Birayê Bilo rast dibêje. Kurên min Lezgîn li aliyê navçeya Şêrewa û Behzad jî li eniya Parsexatûnê di nav şer de ne. Berî ku ez bêm vir Lezgîn telefon kir wî jî got:

- Şer pir giran e, lê ta niha jî me nehîştiye ku hêzên tarîperest bi gavekê jî derbasî nav xaka Çiyayê Kurmênc bibin û kuştiyên wan bi dehan in.

**Dedo:** Ma niha çi karê me bi van çîrokina hebû?! Me tevahiya xelkê bi xwe re kirine dijmin û şerê wan bi ser herêma xwe de anî. Ma em bi qaserî vî şerî ne?!

**Heso:** Birayê Dedo rast dibêje. Ji berê de dewletên mezin karê xwe bi Kurdan dikin û paşê pişta xwe didin wan û dijmin me tarûmar dikin. Siyasetmedarên me dîrokê naxwînin û sûdê jê wernagrin. Lê heyfa xort û keçên me ku rojane tên kuştin û li dawiyê xuya ye em bi çolan kevin û kesek jî li me xwedî dernakeve. Tucarî şerê partiyan li hember dewletan nakeve serê min.

**Silo:** Bi Xwedê tirsa nin a mezin ew e, ku bazarek li ser me hatiye kirin û em tev jî hatibin firotin. Hevîdar im ku ez şaş bim.

**Simo:** Birakino! Çiyayê Kurmênc hêja ye ku em berxwedanê ji ber de bikin, lê şerê bê pîvan û li hember dewleteke wek a Tirkiyê û hemû cihan jî li hember vî şerî bêdeng e, encam xuya ye. Pir tişt jî hene netên gotin.

**Bêrem:** Lo Simo! Tu û Silo çi dibêjin? Ev car ne mîna carên berê ne. Ta em Karin emê li ber xwe bidin û paşê çi dibe bila bibe. Niha dem dema berxwedanê ye, ne dema loman û gotegotan e.

**Simo:** Ev karê we ye. Çênabe ku kes ji we re bibêje win şaş in. Tenê divê xelk ji we re bibêje, her bijî..!!

Apê Seydo çigareke titûnê xistibû êmzikê xwe yê ku ji dara gulyazê çêkiribû û bi kerb dû dikişand. Ji ber ku hin gotinên civatê li heza Apê Seydo nehatibûn, wî carina keserine kûr dikişandin û çavên xwe yên mîna bazan di bin biriwên siq û qaling de dadimirandin, pişt re vedikirin û li civatê mêze dikir.

Berî ku Apê Seydo bipeyive deriyê malê vebû û Horo derbasî hindur bû, silav da û rûnişt. Serast Horo got:

- Keça min Hemîde ya ku li navçeya Bilbilê mêr kiriye, ligel zarokên xwe hatin ba me û dibêje ku dewleta Tirk bi balefir û hemû çekan gundewar û navenda bajarokê Bilbilê bombebaran û topbaran dikin.

**Apê Seydo:** Xwedê xelkê me biparêze. Serkeftinê bike para şervanên me û pergala zordar, talanker û dagîrkeran di bin de hilweşîne û mirovahiyê ji wan xelas bike.

Apê seydo berê xwe da Dedo û got:

- Dedo! Me Kurdan tucarî kesek ji xwe re nekiriye dijmin û me êrîşî kesekî jî nekiriye. Ji hezarsalan ve destlatdarên Faris, `Ereb û Tirkan me ji xwe re dijmin dibînin û bi hemû awayan dixwezin me tune bikin. Yanê tucarî gelê Kurd wek milet û xwedî welat nabînin û ne jî rojekê dê bipejirînin ku Kurd mafê xwe yê rewa bistînin. Divê her

Kurdek vê yekê zanibe. Ma gelo me çi bi serê dewleta Tirk kiriye ta ku ew vê êrîşê tînin ser herêma Efrînê û zarok, jin, kalemêr û pîrejinên me dikujin?! Ew dixwezin herêma me ji me bistînin, me jê koç bikin û tarîperestan wînin li Çiyayê Kurmênc bi cîwar bikin.

Dewleta Tirk bi hezaran gundên Kurdan li bakurê Kurdistanê hilweşandin û komkujî bi serê Kurdan kirin. Êdî bes e; divê em a rast ji hev re bibêjin. Tirk, `Ereb û Faris dixwezin bi carekê me tune bikin. Çendî şer, nakokî û dijmantiya wan jî bi hev re hebin, dema ku derfet ji Kurdan re tê, wan tiştina tev didin aliyekî û li ser me dibin yek. Tevlî ku di dîroka kevnar û nûjen de jî me pir xizmete wan kiriye û hertim jî me doza biratiyê bi wan kiriye.

Ya din, em Kurd di hemû şoreş û serhidanên xwe de li hember dijminan di şer de bi ser ketine, lê mixabin li ser maseya danûstandinê em derdidin û têk diçin. Lê di baweriya min de emê vê carê bi serkevin. Belkî ne wek ku em dixwezin, lê em mîna berê namînin.

**Dedo:** Baş e; ma çima em jî li hember wan nabin yek û her partiyek dibêje ez. Bi navê Xwedê ev şer neketiye serê min. Bazarek heye lê em nizanin ku ew çi ye û kê em firotin kê?

**Apê Seydo:** Em tev vê pirsê dikin, lê bersiva wê li ba

rêvebir, serok û rayedarên partiyên kurdî û kurdistanî ye. Xwedê neke ger dîsa em têk biçin gunehê mezin di stiwê wan de ye.

**Horo:** Birastî; di vê demê de Kurd xwedî hêzine leşkerî û birêxistinkirî ne. Pêşmerge, Yekîneyên Parastina Gel û Gerêla. Eger yekrêziyeke leşkerî di navbera wan de hebe, emê zû û pir zû bigihînin azadiya xwe.

**Bêrem:** Apê Seydo rast dibêje û gotina Horo jî rast e. Eger mijara nakokî, lihevnekirin û ezeziya ku di nav partiyan de hene û em wan gengeşe bikin, tucarî bi dawî nabe. Lê ya rast û durust ew e, ku di vê rewşa ku herêma Efrînê tê re derbas dibe de, em wan mijarina gengeşe nekin û tenê morala xelkê xwe bilind bikin. Birastî; şerê ku dibe û êrîşên ku ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve tên ser Efrînê şerê hebûn û nebûnê ye.

**Apê Seydo:** Belê; di vê rewşê de divê hemû xelkê Çiyayê Kurmênc, xort, keç, jin, mêr, kalemêr û pîrejin û her kes li gor kanebûn û zanebûna xwe di nav berxwedanê de bin. Xwedê neke ku leşkerên dewleta Tirk û çeteyên wê yên tarîperest derbasî nav xaka Efrînê bibin, hîngê wate ji jiyana me re namîne û mirin ji mandina me çêtir e. Yanê her tişt dê were talankirin.

Hîn Apê Seydo gotina xwe bi dawî nekiribû, keça wî ya mezin Nazlî û jinbiraya Apê Seydo derî vekirin û derbasî

hindur bûn. Daw û delingên wan tev herî û xwîn bûn û qaserî serma biribûn dêmên wan mîna kulîkên destpêka bûharê sor bûbûn.

**Apê Seydo:** Vê şevê hûn ji kû tên?

**Nazlî:** Me xwerin gîhande şervanên eniya Kevirê Ker û li vegerê me birîndarek bi xwe re anî.

Dema ku Nazliyê wisa got, Dedo, Horo, Reşît û Bêrem hêze xwe kirin rabûn û xatirê xwe ji wan xastin. Apê Seydo ji wan pirsî: Hûnê biçin kû?

Wan gotin: Nazlî û jinapa wê ji eniyên şer tên û em jî li ber soba êzingan rûniştine! Divê em biçin karekî bibînin. Xwedê rehma xwe li giyanê wî bike yê ku gotiye "***Şêr şêr e, çi jin û çi jî mêr e***". Herçar derketin û çûn.

**Apê Seydo:** Keça min Nazlî! Biçe mala apê xwe Reşît bila bi lez were vir.

**Nazlî:** Apê min Reşît ne li mal e.

**Apê Seydo:** Li vê şevê û di bin vê topbaran û bombebaranê de apê te bi kû de çû ye?

**Nazlî:** Bavo! Apê min Reşît û Henanê Xelo her yekî ji wan li qantira xwe siwar bûn û ber bi Kevirê Ker çûn.

**Apê Seydo:** Keça min! Ev çi gotin e tu dibêjî?!

**Nazlî:** Belê bavo! Hin cih hene tirumbêl nagihîninê. Wan qantirên xwe birin û Xwedê neke, ku birîndar hebin ewê wan li qantiran siwar bikin û wînin. Belê bavo! Hemû

xelkê Çiyayê Kurmênc di nav berxwedanê de ne.

Dema ku Nazliyê wisa got, Apê Seydo rabû ser xwe serê Naziliyê maç kir û jê re got:

- Tu ji pişta bavê xwe yî. Keça min! Eger te û jinapa xwe careke din we xwerin ji şervanan re bir, tivinga min bi xwe re bibin. Ango bê çek meçin û ger lê hat tevlî şer jî bibin. Em li hember van hovina di şerê man û nemanê de ne. Keça min! We birîndar bire kû û kî derman dike?

**Nazlî:** Me gîhande mala Gula Miho. Bijîşkek û du keçên nojdar ji bo birîndaran li wir in. Ger birîn sivik bin li wir derman dikin. Lê ger birîn giran bin wan dibin nexweşxaneya Avrînê. Bavo! Navê nojdarekê Bêrîvan e. Birastî keçeke pir jîr û wêrek e.

**Apê Seydo:** Ma tu wê nasdikî?

**Nazlî:** Bavo! Sê roj in ez û jinapa xwe xwerin û gerekiyên wan li mala apê min Reşît amade dikin û ji wan re dibin. Dergistiyê Bêrîvanê li eniya şer e û agahî li ba Bêrîvana nojdar nînin ku ew li kû ye.

**Apê Seydo:** Keça min! Xwedê ji we razî be û hemû keç, xort û herêma me ji hovîtiya dewleta Tirk û çetyên tarîperest biparêze.

Berî ku Apê Seydo têkeve nav nivîna xwe balefirên dewleta dilbikîn navenda bajarokê Reco topbaran kir û cama deriyê malê şikest û perçak li serê Apê Seydo ket û

xwîn di ser dêmê wî de herikî. Nazdar bi lez ji mal derket û xwe gihand navenda bijîşkî û Bêrîvan anî. Birîna Apê Seydo sivik bû. Piştî ku Bêrîvanê birîna wî derman kir, Apê Seydo spasiya wê kir û jê re got: Keça min! Tu ji kû yî?

**Bêrîvanê** got: Ez ji gundê Gemrûkê, keça Remoyê Şivan im û navê min Bêrîvan e.

Roj û şevên Çiyayê Kurmênc ji aliyekî ve buyerên êşdar di devê hev de vedireşandin û mîrê demê jî li tiştine windayî digerî.

Hilweşandina mal û gundan li ser zimanê xelkê zêde dibûn. Wêneyên pakrewanan li ser ekranan dihatin belavkirin û piraniya wan pakrewanina kesên sivîl, zarok û jin bûn.

Li gundê Tilsilorê Keçek û diya wê, li gundê Cilbirê malbatek, li gundê Mabeta malbatek, li gundê Gobelê çend malbat û hilma xwîna zarok û jinan di tîrêjên royê re hildiperikî û eywana dilovanê gewre dileqand. Lê wijdan û sinca cîhanê di bêdengiyeke xwînî de li hovîtiya faşistiyê temaşe dikirin.

Li sirtên Bêraqdarê, li tenşt gundê Hemamê lawên royê bersivên tund didan peyrewên tariyê û nêçîrvanên çeqel û rûviyan sipasiya darên zeytûnê yên dilsoz dikirin.

Cindirêsa dawkesk di hemû serdemên dîrokê de talanker

ji dawa xwe daweşandine û pîroziya xwe ji gurintiyên biyaniyan parastî ye. Vê carê jî law û neviyên wê bi giyan û xwîna xwe sînorên dawkeska xwe diparastin û destaneyên şanaziyê li ser sîngê demê nîgar dikin.

Ji her aliyekî ve û di serdemên kevnar û nû de Cindirêsa dawkesk çîkdan û pêlvedana şaristaniyê ye. Li ser dawa deşta wê ya kesk û gundewarên wê yên ku hertim di vejandina jiyanê de ne, gelek girên ku beşekî mezin ji dîroka mirovahiyê di zikê wan de hîn veşartî maye, di vê serdemê de jî neviyên wê dîrokeke nû bi teşiya lehengî û mêrxweziyê dihûnin.

Li ser sînorên gundê Hemamê vedenga çîrok û destaneyên berxwedan û pêdariya lawên royê li kolanên bajarokê Şiya serbilind, dibûn dîrokeke çîkdayî.

Li sînorê Cindirêsa dawkesk xew di bin lingên berxwedêran de dihat nişkekuştin û çavên demê dibûn guvenda serkeftinan. Belê; her ku peyrewên tariyê hewil didin ber bi xaka Cindirêsa hemêzkesk ve gavkin, gava wan a yekem ji wan re dibû gor û xwîna wan a genî li pişt sînor di pişta wan re belemîz dikir.

Her ku bihna termên tarîperestan bêfilên şevê dadigirt, zêdetir hovîtiya wan gur dibû û şaristaniya bajarokê Cindirêsa berxwedêr topbaran û bombebaran dikirin. Ne tenê dibistan û mizgefta Selahidîn, lêbelê bi tewşankî mal

jî di ser serê xelkê sivîl de hildiweşandin.
Şevê konê xwe yê reş li ser Efrînê vegirt û êrîşên Nîroniyên serdemê yên tarîperest û xwefiroşan li seranserî Çiyayê Kurmênc hovîtirîn dibûn. Ji dengê top, tang û hejandina xaniyan, di her malekê de giriyê zarokan kevir jî dêşandin û veciniqandina şîrmijan ferişte bi girî dikirin. Vedenga wê hovîtiyê li ser maseya paytextên cîhanê dibû qêrîneke ji qêrînên serdemê, lê wijdan, nîhad û sincê pereperest û berjewendîkaran di hemêza bêdengiyê de bihna celqbûna hêkên qazan jê dihatin.
Xelkê bajarokê Cindirêsê tev di govenda berxwedanê de bû. Jin, zarok, pîrejin û kalemêr di qeboyan de xwe vedişartin. Bajar ji aliyê rûmetdaran ve ta danê sibehê dihate parastin û kelmêş jî nikarîn derbasî kolanan bibana. Taxa Jêr girê Cindirêsê bi dilovanî xistibû hemêza xwe û vedenga simfoniya gavên lehengan pir li heza wê dihat.
Dema ku dengê balefiran li ezmên dihat û hin malên bajarokê Cindirêsê di nav wê tariyê de dihatin topbarankirin, di hindurê qeboyan de zarokan xwe davêtin hemêza dayîkan û giriyê wan dibû sîmfoniya êşdariyê.
Hesenê Reşê yê nod sêsalî ku bi tena xwe di hindurê mala xwe de bû, wî di nav nivîna xwe de destên xwe ber bi jor

radikirin û digot:

- Xwedê ocaqê we bişewitîne û kulxana reş bi ser xîne. Ma hûn ji hovîtî û xwînrijandina mirovan têr nabin?!

Li taxa rojhilatî mizgefta Selahidîn a bajarê Cindirêsa dawkesk Hesenê Cêwîş ligel hevaline xwe di hindurê qeboyekê de bûn. Dema ku top û bombe li nav bajêr diketin û teqînan serûberê bajêr dihejandin, wî bi hevalên xwe re digot:

- Roja jidayîkbûna "Osman Ertixril"[1] roja jidayîkbûna tarîperestiyê bû. Xwezî hîngê şûrekî Mexolî zikê diya wî di çarmehiyê de qelaştiba.

Li dawiya wê qeboyê jineke navser keçeke şîrmij hemêz kiribû û digot:

- Xwedêyooo…! Ma qey tu hovîtî û nemirovatiya tarîperestan nabînî!? Ez bawer im ku tu gunehkariyê napejirînî, lê çima tu êrîşên van tarîperestina li ser lawên rojê dipejirînî?

Li ber deriyê qeboyê jineke çelsalî ji jineke din re digot:

- Di destpêka sedsala bîstê de jî bapîrên van tarîperestina gelê Ermen dan ber komkujî û ciyonasîdê û hebûna wan bi kuştinê talan kirin. Lê gelên ku xwîna vîndariyê di tamarên wan de digere, tucarî bi destên faşist û xwînrêjan tune nabe. Îro gelê Ermen xwedî Ermenistaneke sebixwe

*1- Osman Ertixril: Dameznêrê dewleta Osmanî bû. Li sala 1258an Ji dayîk bûbû. Di wê salê de Holako talana Bexdadê kir.*

ye.
Hîn wê jinê wisa digot navenda bajarê Cindirêsa dawkesk hate topbarankirin û du zarok di wê qeboyê de birîn bûn û birînên wan giran bûn.
Navendeke bijîşkî li nêzîkî wê qeboyê bû. Xortekî herdu zarok rakirin û bi bez xwe gihandin wê navendê. Li wir bijîşkek û sê nojdar hebûn. Piştî ku wan herdu zarok derman kirin, nojdarekê navên wan tomar kirin û navê zarokekê Bêrîvan bû. Hîngê nojdarekê serê wê zarokê maç kir û got: Metirse navê min jî Bêrîvan e.
Xortê ku herdu zarokê birîndar biribûn navenda bijîşkî ji Bêrîvanê re got:
- Ku ez ne şaş bim, berê min tu li nexweşxaneya Avrînê dîtî.
Bêrîvanê jê re got:
- Belê; ez li wir dixebitim, lê jirkî ku berxwedanê dest pê kiriye, ez sê rojan li nexweşxanê dimînim û li rojên din jî ez diçim navendên bijîşkî yên li eniyên şer dixebitim. Duh ez ji bajarokê Reco hatim vir.
Dema ku topbaran rawestî, nojdaran herdu zarok û diya wan xistin tirumbêlê û birin nexweşxaneya Avrînê.
Li danê êvarê du şervanên birîndar gihîştin navenda bijîşkî ya bajarokê Cindirêsê, lê birînin wan sivik bûn. Piştî ku hatin dermankirin, Bêrîvanê ji wan pirsî:

- Şervanek navê wî Rojdar e, ma ew ne li ba we bû?
Şervanekî ji wê re got:
- Na; ev nav ne li ba me bû.
Hîngê Bêrîvanê li gustîlka Rojdêr mêze kir û ji xwe re got:
- Ez bawer im ku Rojdar li cihekî ye û şer li wir giran e. Xwedê hemû şervanan û Çiyayê Kurmênc biparêze û Rojdêr ji min re vegerîne. Hîn Bêrîvanê winsa digot, mobayila wê deng jê hat, wê nihêrî ku diya Rojdêr e.
**Diya Rojdêr:** Dembaş Bêrîvan!
**Bêrîvan:** Dema te jî baş amojnê! Ma Rojdar bi te re têkildar dibe?
**Diya Rojdêr:** Yanê min dixwest ku ji te bipirsim, ku bi te re têkildar dibe yan na? Em nizanin ku ew li kû ye.
Bêrîvan têgihîşt ku diya Rojdêr di metirsiyê de dijî û divê morala wê bilind bike. Wê jê re got: Amojna hêja diya Rojdêr! Pir bi xem mebe, ezê li wî bigerim û nûçeyeke xêrê bigînim te. Hemû xelkê Çiyayê Kurmênc û her yek li gor kanebûn û têgihîştina xwe di nav berxwedanê de ne. Berxwedana ronahiyê li hember tariyê ye… Berxwedana jiyanê li hember mirinê ye… Berxwedana rastiyê li hember derewê ye… Berxwedana şaristaniyê li hemer mejîkoriyê ye… Berxwedan mirovatiyê li hember talankeriyê ye û berxwedana aştîxweziyê li hember

şerxweziyê ye… Berxwedana hebûnê li hember tunebûnê ye. Belê… Erêêê erê berxwedana Efrîna Kurdan li hember faşist û dagîrkeriyê ye... Berxwedana li hember tundrewî û dilkîniya virniyên destbixwîn e.

Diya Rojdêr li Bêrîvanê vegerand û got: Belê Bêrîvana hêja belê, gotinên te rast in. Lê min bîra Rojdêr kiriye, bîra gotin û genegeşeyên wî kiriye.

Dema ku diya Rojdêr wisa digot, Bêrîvanê jî bi bêdengî gotinên wê dubare dikirin û digot: Min ji te bêtir bîra henek, awir, gotinên wî yên têrevîn û kenê wî kiriye. Wan xatirê xwe ji hev xwestin û du rondikan mijangên Bêrîvana çavreş şil kirin. Wê li gustîlkê mêze kir û got:

- Rojdarooo! Min bîra tîna hestên te kiriye.

Berxwedana keç û xortên Efrînê bi sedan destan, çîrok û serpêhatiyên lehengî, mêrxwezî û serfiraziyê li rûpelên dîrokeke nûjen dinivîsandin. Rojê bê ramûsana xatirê xwe ji eniya şêrejin û şêremêran Çiyayê Kurmênc nedixwest. Herweha şevên Efrînê jî berîkên xwe ji dîdevaniya rojperestên azadîxwez dadigirtin û di nav paşel û hemêza berbangê de bi şanazî difirandin.

Li hembera Cindirêsa dawkesk û di nav zinarên çiyayê Lêlûn de, Mirovheza Efrînî û hevaleke wê ya şervan di nav şonewarekî kevnar de li benda nobedariya xwe bûn.

Temenê Mirovheza Efrînî bîst û yek sal bûn û tucarî ne li bîra wê bû ku bibe hevala tivingê. Lê dema ku gefên tarîperestan li ser Efrînê çêbûn wê biryara xwe da û tev refê berxwedana ji ber Çiyayê Kurmênc de bû.

Mirovheza Efrînî ji hevala xwe Zîlanê re got: nobedariya Dilovanê bi dawî bû, rabe biçe şûna wê biger û li danê êvarî ezê werim şûna te bigrim. Lê ger şer germ bû tavilê emê xwe bigihînin we.

Zîlanê hêze xwe kir, desmala kurmancî di bin porê xwe yê ji rengê heneya Amedê re derbas kir û li aliyê eniya xwe ya çepê girêda. Wê qurşîneke tek ji beriya miltanê xwe derxist, ew bîn kir û ji nû ve xiste beriya xwe. Di pişt re Tivinga xwe rakir û çû cihê nobedariyê. Hîngê li navçeya Şêrewa eniya şer ne ewqasê germ bû.

Mirovheza Efrînî hestewar bû ku Zîlanê tiştek bîn kir û piştre xiste beriya xwe, lê wê pirs nekir ku ew tişt çi bû. Mirovhezê pişta xwe dabû zinarekî, destê xwe yê rastê danîbû ser tivinga xwe û qeflên nêrînên xwe carina ber bi çiyayê Şêx Berkêt rêdikirin û bîranînên seyranan yên li kela Sem`anê û serdanên li ser pişta çiyayê Berkêt li bîra xwe tanîn. Carina jî bi nêrînên xwe çiyayê Qaziqlî hemêz dikir û kenê hevala xwe Perwîn a ku berî çar rojan şehîd bûbû, di guhên xwe de dikire simfoniya jiyanê û digot: Şehîd tac û rûmeta gelan in.

Carina jî Mirovheza Efrînî nêrînên xwe berve bajarê Efrînê rêdikirin û hin tabloyên zaroktiya xwe li bîra xwe tanîn. Di nav wan tabloyan de wêneya dayîka xwe ya ku li danê her sibehê taştê amade dikir û piştî xwarina taştê hin pere didanê û jê re digot:

- Aştîxweza min! Di xwendina xwe de jîr be û li dibistana xwe pileya yekem bistîne.

Hîn Mirovheza Efrînî di wê heyamê de bû, pêjna Dilovanê nêrînên wê berve xwe rakêş kirin û ew ji jiyana bîranînan derxist.

**Dilovana Qamîşlê:** Dembaş Mirovheza Efrînî!

**Mirovheza Efrînî:** Ya te jî baş Dilovana hêja.

Dema ku Dilovanê hewil da li tenişt Mirovhezê rûne, wê dît ku hin hevok li ser zinarê ku li tenşt wê bû hatine nivîsandin. Piştî ku Dilovanê ew hevokina xwendin, wê ji Mirovhezê pirsî:

- Kê ev hevokina nivîsandine?

Mirovheza Efrînî berkenî bû û jê re got: Ma gelo tiştekî şaş di wê nivîsandinê de heye?

**Dilovana Qamişlê:** Na… lê!

**Mirovheza Efrînî:** Baş e. Çima te gotina xwe bi dawî nekir?

**Dilovana Qamişlê:** Ez tênegihîştim ku wateyên van hevokina çi ne?

Mirovheza Efrînî berkenî bû û ji Dilovanê re got:
- Kurdperwera hêja...! Mirov ji kîjan netewê, olê û welatî dibe bila bibe, ew qet ne pirsgirêk e. Lê pirsgirêka mezin ew e, dema ku mirov di bin sîwana olperestî û netewperstiyê de kuştina hev rewa bike. Ola ku rêzgirtina mirov negre û netewa ku talankirin, kuştin û tunekirina miletan ji xwe re rewa bibîne û xwînrijandin li heza wê were, divê li her derê û ji aliyê her kesî ve şerê wan bibe. Ji ber ku em mirov in û divê em doza mirovatiya xwe bikin.
Mirovheza Efrînî gotina xwe domand û got:
- Di bin navê ola Îsalmê de sultanên dewleta Osmanî talankerî, dagîrkerî û zordarî di dermafê gelan de kirin û para mezin ji komkujî û buyerên xwînî wan di dermafê gelê Kurd û gelê Ermen de kirin. Herweha bi dehan komkujî di dermafê Kurdên Ezdahî de kirin. Komkujiyên "Holokoz" ên ku Hitlêr di dermafê Cihoyan de kirin ji hovîtiyên nazîperestiyê bûn.
Mirovheza Efrînî gotina xwe berdewam kir û got: Şoven, nijadperest û xwînrêjê sedsala bîstê Sedamê Tekrîtî ne tenê sed û heyştê û du hezar Kurdên sivîl ji zarok, şîrmij, jin, kalemêr û pîrejinan bi xweşî li beyabana Îraqê binax kirin. Lêbelê wî bajarê Helebçe jî bi jehra siyanîdê bombebaran kir û di çend xulekan de pênc hezar ji

Kurdên sivîl jiyana xwe ji dest dan.
Li Şengalê, li Kobanê, Li Kerkûkê û herweha li seranserî Kurdistanê û di bin navnîşanên curbecur de dijminên Kurdan hewil didin ku bi hemû awayên xwe yên qirêj û xwînî me tune bikin. Niha jî bermayên wan di bin navê ola Îslamê de, wan êrîşên xwe yên hovane anîne ser Çiyayê Kurmênc û dixwezin dagîr bikin. Ji ber wê jî divê em Efrînî berevaniya xwe û ya welatê xwe bikin. Ez tenê ji bo Çiyayê Kurmênc biparêzim min tiving rakiriye. Ez keça Efrînê me... Hevala Çiyayê Kurmênc im.
**Dilovana Qamişlê:** Dêmek îro jî virniyên sultanan û tarîperest dixwezin Efrînê û miletê Kurd careke din bi dagîrkerî û talankeriyê tune bikin. Emê xewn, xeyal û hêviyên wan ên terorîst bi berxwedana xwe ya pîroz têxin bin lingên zarok û dayikên pakrewanan.
**Mirovheza Efrînî:** Tucarî tarî nikare zora ronahiyê bibe. Ez dixwezim pirsekê ji te bikim. Dema ku hevala Zîlan ji bo nobedariyê xwe amade dikir, wê tiştek ji beriya miltanê xwe derxist, ramûsand û ji nû ve xiste beriya miltanê xwe. Lê min jê nepirsî ku ew tişt çi bû? Ma tu dizanî ew çi bû?!
**Dilovana Qamişlê:** Berî çar rojan dema ku hevala me ya şervan Lîlav Ferat di şerê kela Sem`anê de şehîd bû, tenê qurşînek di tivinga wê de ma bû. Hîngê Zîlanê ew qurşîn

ji tivinga wê derxist û got: Soz û peyman ezê vê Qurşînê di sîngê terorîstekî de biteqînim û tola Lîlavê bistînim. Di pişt re wê qurşîn ramûsand û xiste beriya miltanê xwe. Dilovanê sond bi....

Berî ku Dilovana Qamîşlê gotina xwe bi dawî bike, dengê qurşînekê ji cihê nobedariya Zîlanê hat. Bi dengê wê qurşînê re tavilê dengê lîliyekê jî hat. Hîngê Zîlanê bi wê qurşînê mîrekî terorîstan di xwîna wî de vegevizand û lîlî jî ya tolêstandinê bû. Hîngê Mirovheza Efrînî û Dilovanê jî çend lîliyên şanaziyê li ser zimanê xwe azad kirin û vedenga wan li sîngê zinaran vedipekî.

Li serûberê Çiyayê Kurmênc destaneyên berxwedanê ji aliyê xort, keç û xelkê Efrînê ve li ser sîngê demê dihatin nivîsandin.

Her ku heyvê bedena siha kendalên axê kin dikir, li hawîrdora gundan bêdengî dibû navnîşana şevê. Carina giriyê şîrmijan şev payî dikirin, lê pir dirêj nedikir memikên dayîkên dilovan ew hêsayî dikirin û ji nû ve şev dikete xewê.

Li nîvê şevê hin neyzek ji dêmên ezmên berve erdê vedipekîn û li sînorê erdê winda dibûn. Eger pîrejinan ew bidîtana dê bigotana: Stêrka mirovekî rijî.

Li aliyê rojhilatê kela Horî çemê Efrînê sirûdine Mîdî ji lawên rojê re diherikandin, çîroka Gilgamiş li qiraxên

xwe yên têrhêvî nîgar dikir û destaneya Oriya ji berxwedêr û azadîxwezan re dixwend.
Çemê Efrînê bi hêrs û tengijandin diherikî... Belê ew jî wek Efrîniyan di şer de bû... Di serhildan û evînekê de bû...
Pir evîndaran çîroka evîna xwe li ser lêvên wî nîgar kirine... Pir qiralan şûrê xwe yê bi xwîn bi ava wî şuştine…. Pir Kahin û Nasikan rasteqînî ji zelaliya wî wergirtine… Pir azadîxwezan vîn û pêdariya xwe ji pêl û hêrsên wî avdane. Îro dîsa çemê Efrînê sozdar e û piştevaniya lawên ronahiyê dike.
Di navbera xatirxwestina rojê û silava heyvê de... Di ber sîmfoniya hêrsa kaniyên çemê Efrînê re û di siha kendalekî axî de şervanekî Efrînî xewna xwe ya berî şevekê ji hevalên xwe re hewal dida.
Di ber çîrokê re wî wêneya kenê dayîka xwe li bîra xwe tanî û bi nêrînên xwe yên têrpêdarî rengê tivinga xwe û wêneya havalê xwe yê ku li gundê Dêrsiwanê şehîd bûbû, şeh dikirin.
Berî ku ew şervana çîroka xwe bi dawî bike, berkenî bû û bi hevala xwe ya ku li aliyê wî yê çepê rûniştibû re got:
- Îşev dîlana serbilindî û şanaziyê ye, ma tê bi min re bibî heval?!
Hevala wî destê xwe yê rastê da ser piyê wî yê çepê û ziq

li çavên wî mêze kir û jê re got:
- Wêneyên wan zarokên ku berî çar rojan bi balefirên kîndariyê şehîd bûbûn, hîn di ekrana çavên min de meyandî ne. Ji ber wê jî, divê îşev em dîlanê geştirîn bikin. Lorandina dayîkên wan zarokina hîn li ser perda guhên min sirûdên êşdariyê ne. Belê divê tolhildan li pey tolhildanê ranewestin.
Belê; dema ku ez hatim berevaniyê ji ber vê xakê de bikim, diya min ji min re got:
***- Keça min! Ez diya te me, lê Efrîn rûmet û diya hemû Kurdan e.***
Hîn di navbera wan herdu lehengina de gengeşe berdewam bû, hevala wan Dilsoza Şikakî destê xwe yê rastê li tivinga xwe diguvaşt û bi destê xwe yê çepê jî mistek ax rakir û têr bîn kir û ji wan re got:
- Lehenginooo..! Di tivinga hevala me ya şehîd Berxwedan de çar qurşîn mabûn, ew niha di tivinga min de ne. Ji ber wê jî serkêşiya dîlana îşev a min e. Min sond xweriye û soz daye ku ezê van çar qurşînan di sîngê çar tarîperestan de biteqînim.
Şervanan ji Dilsoza Şikakî re gotin:
- Serkêşiya dîlana îşev li te pîroz be. Bi wê mizgînê re rondikên dilşadiyê dêmên wê geş kirin.
Hêdî hêdî heyvê awirên ronahiya xwe di bedena ezmên

de serberdayî dikirin. Ewrên ku berê zikê wan xunav bû, carina awirên heyvê bi xwe mijûl dikirin û siha wan li ser qadên şer dibû wek sîwaneke mezin. wan jî dixwestin alîkariya şervanan bikin. Tucarî siruşta Kurdistanê ji bo Kurdan xapînokî nekiriye…. Hertim di hemêza xwe de Kurd ji kujer û çeteyên xwînrêj parastine.

Bi serkêşiya Dilsoza Şikakî şervan berve bakur û rojhilat ve rêketin û xuşxuşa ava kaniyên çemê Efrînê dibû parek ji vîna wan. Piştî ku pêjna şervanên Efrînî yên dilsoz ji hevalên wan dûr ketin, Dilovanê bi hêdîka got: Hevalino..! Bê liv bin.

**Ristemê Hawarî:** Çi heye?

**Dilsoza Şikakî:** Li aliyê rojhilat dengê tevgereke hêdî tê. Dengê hilekişekê kete guhên min. Li wir tiştek heye.

Her ku dengê wê tevgerê nêzîk dibû Dilsoza Şikakî baş raçav dikir ta binase ew şivliv a çi ye? Ajal e yan kesekî rêwindayî ye yan jî terorîst in? Hemû şervan amade bûn ku kulxanê bi cihê wê tevger xin, lê li benda nîşana Dilsozê bûn.

Dilsoza Şikakî bi dizîka û bê ku deng bi derdora xwe xîne, wê serê xwe di ser kendalê axê re bilind kir û berve cihê ku dengê pûş û pelêş jê dihat mêze kir, lê tiştek bi ber çavên wê neket. Wê ji nû ve serê xwe vekşand û di taldeyê kendalê axî de bê liv ma.

Berî ku Dilovana Şikakî tiliya xwe ya nîşanê li ser teltîka tivingê biguvêşe û qurşînan li cihê wê tevgerê bibarîne.
Dengekî bi hêdîka hat û got: Keça min xuya ye ku şervan li vê derê nînin. De ka em ber bi nav darên zeytûnê yên mala Hemo biçin, belkî şervan li wir bin.
Dema ku Dilovanê ew gotinina bihîstin wê bi dengekê hêdîka got: Ew kî ne di nav wan kelemina de?
Jinekê got: Ez Fero me.
**Dilovana Şikakî:** Fero kî ye û tu li wir çi dikî?
**Fero:** Hin xwerin û av bi me re ne û em dixwezin bigihînin şervanan.
Dilovanê got: Xaltîka Fero! Were.
Fero û keça wê xwerin û av rakirin û ber bi wan çûn. Dema ku gihîştin ba wan, wê tiştên di destên xwe de danîn û serê herçar şervanan ramûsand û got:
- Ez bi qurbana we lehengan bim.
Dilovana Şikakî dest û serê Feroya şêstsalî maç kirin û jê re got:
- Mala te, vîn û qîreta te ava be. Em bi kesên mîna te û keça te û hemû xelkê xwe serbilind in. Xaltîka Fero! Careke din bi şev dernekeve. Li gundê xwe karine din ji bo Efrîna me bikin.
**Fero:** Belê ezê bi ya we bikim. Xwedê destê xwe di ser we re bigre, we ji van hovan biparêze û serkeftin para we

be. Wê careke din serê herçar şervanan ramûsand û bi keça xwe re got:

- Di pêş min de rêkeve û em biçin gund.

Heyvê awirên xwe di nav qeflên ewran re derbasî nav şaxên daran dikir û hin ramûsan ji koka darên zeytûnê direvandin.

Fero û keça xwe di nav daran re ber bi gund diçûn û bi hêdîka ji keça xwe re digot:

- Şîraza min! Dengê qurşîn û topan ji aliyê gundê Dîkmedaşê ve pir tê. Xwedê şervanên me biparêze. Xuya ye ku li wir şer giran e.

**Şîraz:** Dayê! Li danê sibehê ezê biçim tev refê şervanan bibim. Divê em ji ber van daran, vê axê û welatê xwe de berevaniyê bikin û nehêlin ku mejîtarî derbasî Çiyayê Kurmênc bibin. Belê li danê sibehê ezê biçim.

**Fero:** Keça min Şîraz! Belê; divê em tev berevaniyê ji ber axa xwe de bikin. Rast e şer şerê man û nemanê ye.

Berî ku Fero û keça xwe Şîrazê ji nav darên zeytûnê derkevin, Şîrazê dengê nalenalekê bihîst û tavlê bi diya xwe re got: Anê! Min dengê nalenalekê bihîst.

Şîraz û diya xwe çend xulekan bêdeng man, lê wan tu deng nebihîstin. Piştî ku bi rêketin careke din dengê wê nalenalê hat û bi zimanê erebî digot: (Mey… mey) yanê: Av… av.

Dema ku Şîrazê û diya wê bihîstin û ew bi `erebî dibêje av, hardu bi paş de zêvirîn, xwe xistin ber koka dareke zeytûnê û bêdeng rûniştin. Piştî çend xulekan dîsa wî got: Av… av.

Hîngê Şîrazê bi hêdî ji diya xwe re got: Xuya ye ku kesekî birîndar li wî cihî heye.

**Fero:** Keça min! Belkî ne birîndar be û wî em ditine loma wisa dibêje. Ya baş ew e ku em vegerin ba şervanan û wan agahdar bikin.

**Şîraz:** Xwedê zane ku şervan gihîştine kû. Ya baş ew e ku ez deng li wî bikim û em zanibin ku ew çêdibe. Dayê metirse! Çeteyên dewleta Tirk nikarin derbasî vê derê bibin.

Hîngê Fero dudilî bû, lê bi keça xwe re got: Tu dizanî.

Şîrazê di ber koka dara zêtûnê de bi dengekî ne bilind û ne jî nizim bi zimanê `erebî bang kir û got:

- Kî li wir e û dibêje av?

Wî got: Ez birîndar im û nikarim ji cihê xwe bilivim. Berî ku ez dimrim, bila xêra dê û bavê te be, hin av bide min.

Fero dabanceya ku vê re bû amade kir, tiliya xwe da ser teltîkê û di pêş Şîrazê de berve wî kesî çûn. Dema ku nêzîkî wî bûn, wan baş lê mêze kirin, dîtin ku xortek li erdê dirêjkiriye û lingê wî yê rastê birîn e. Fero du gulm av dan wî û Şîrazê jê pirsî:

- Tu kî yî, navê te çi ye û çima tu li vir î?

Wî xortî jê re got: Navê min Hemze ye. Dema ku serbazê Tirk ji me re got emê piştî demjimêrekê êrîşê bibin ser gundê Kurdan, min û du hevalên xwe biryar da ku em birevin û werin xwe radestî Kurdan bikin. Dema ku em direvîn û dihatin, hin ji wan terorîstan haydar bûn û qurşîn avêtin me. Herdu hevalên min hatin kuştin û ez jî birîndar bûn. Ez li ser lingekî gihîştim vê derê û ketim û nema karim bimeşim. Bila xêra we be xelkê agahdar bikin bila min bibin cihekî û lingê min derman bikin.

Fero ji Hemze re got: Ji cihê xwe melive. Niha emê bi lez biçin gund û kesina bişînin bila te bibin cihekî û te derman bikin.

**Hemze:** Bila xêra dê û bavê we be. Ez naxwezim bimrim. Dewleta Tirk em xopandin û dixweze hemû gelên Sûrî bi destên hev bikuje. Bila xêra we be, bila kesin werin min bigihînin nexweşxanakê.

Fero û keça xwe Şîrazê, Hemze li wir hîştin û bi lez berê xwe dan gund û çûn. Berî ku derbasî nav gundê xwe bibin, xelkê ku gund bi şev diparastin, Fero û Şîraz sekinandin û ji wan pirsîn: Vê şevê hûn ji kû tên? Piştî ku wan çîroka xwe ji wan re hewal dan, Fero ji wan re got: Li nav rezê mala Hebo, li nêzîkî dara hejîra kundirî xortekî ku ji nav çeteyên dewleta Tirk revî ye, li wir

birîndar e.
Tavilê du xortan hespek ji gund birin û Hemze anîn radestî komîta parastinê kirin. Komîta parastinê jî Hemze birin nexweşxanê.
Dema ku Fero û keça wê Şîraz gihîştin mal, hevjînê Fero yê ku di wê pênê de ji nobedariya parastina bajarokê Şera hatibû ji wan pirsî: Hûn ji kû tên? Fero çîroka xwe û ya Şîrazê jê re hewal da.
Hevjînê Fero got: Ji berê û paşê de Kurd nikarin dest ji mirovatiya xwe berdin. Kurd û mirovatî hevcêwî ne.
Dem pêlvedaneke dêrînî û bê dawî ye. Di nav wê pêlvedanê de serdem li pey serdemê tên pêçandin. Lê ne her tişt bi wan serdemina re tên pêçandin û ne jî têne jibîrkirin. Di dirêjiya demê û serdeman de hertim tîrêjên ronahiyê ne tenê ji royê, lêbelê ji raman û mejiyê mirov jî tê herikandin û jiyan tê vejandin.
Dildarî ji bo axa welêt jî mîna dildariya dilan e û carina jî jê pîroztir e. Dildariya ku çirûskên wê ji bawerî û hezkirina welêt bin, ji hezkirina mirovatî, azadî û ronahîperestiyê bin, hîngê mirov parek ji hebûneke rasteqînê û ji rastiya jiyanê ye.
Jiyana bê welat nerastiyeke ji beravêtina hebûnê ye û welatê bê azadî û rêzgirtina mirovatiyê hebanekî ji xaknîgariyeke bê wate ye. Mirovê ku xwîn, giyan û

ramanên wî bi dildariya mirovatî û hezkirina ax û welatê wî hatibe avdan, tucarî jiyanê di meşka xewn û xeyalan de nakeyîne.
Eger raman û bîrwerî ji rûdawên mêjî ne, divê hiş ne koleyê mirovatiyeke perspankirî be. Eger hiş û raman bi koletiya cih û demê razî bibin û parekê ji ronahiyê di gewriya tariyê de bihêlin, hîngê xelekeke windayî di jiyanê de peyda dibe û mirov ji rastiya xwe dûr dikeve.
Jiyana ku di nav xewn, xeyalên pûç û pêlên leylanê de demê diçû, tucarî nikare kemberên tariyê ji nava xwe biçirîne û rastiya xwe bi pertavên royê bihûne.
Dema ku derûn, giyan û hestên mirov dibin parek ji ronahiyê, hîngê mirov dibe şewqvedan rastiya mirovahiyê û ji şerê li hember tariyê venagere. Belê ev hin ji bîr û baweriyên BARÎN KOBANÊ bûn.
Zaroka BARÎNÊ ya hesinî di dawa Bilbilê de bi kenê xwe tirs dixiste dilê lawên Şeytên û wek keriyê berazan xwe li têlên sînorê kîndariyê dixistin û berve paytexta wijdankoran bi devegezê direvin.
Dêmê berbangê mîna keçên fedok sor dibû û dilopên baranê mîna rondikên şahiyê di ser pelên darên zeytûn û berokê de dibarîn. Belê; barîna baranê BARÎNî bû, dibarî… dibarî û dibarî.
Piştî ku lêvên rojhilat dibûn ronahîbarîn û di hemêza

jînistanê de dibarî… dibarî û dibarî, hîngê baran û ronahîbarîn dibûn Barîn… Barîn û Barîn…

Bilbila barînistan memikên xwe di nav lêvên demê de vediçengandin û hemû xwedêwendên dem û serdeman vediciniqandin. Li wir şerê ronahiyê li hember tariyê gol vedida û ji devê tivingên Barînan agir dibarî… dibarî û dibarî…

Barîna ronahîbarîn, barîna nêrînên xwe yên ku ji pêdariyê hatibûn ristin, di bejna Zoyê Giran de digerandin… digerandin û digerandin… Ger li rast û ger jî li çep Barînê kuliyên tarîperestiyê bi lîliyên devê tivinga xwe ya rûmetdar vedipekandin… vedipekandin û vedipekandin. Warîniya rûvî û çeqelên çermgurî, mejîkor û xwînqirêj digihîşte paytexta faşistan û li wir çavsoran kîna xwe dimêtin… dimêtin û dimêtin…

Li navçeya Bilbilistanê destaneyên BARÎNÎ dîrok serast dikirin, tarî dixistin nav çemberên ronahiyê û hin berîkên Çiyayê Kurmênc ê jînistanî ji tarîperestan paqij dikirin. Belê; vedenga qêrînên ronahîperestan sînorên ezmên derbas dikirin û li eywana Xwedê şanazî dihat tomarkirin. Çend kêlîkan dem rawestî, royê awireke xwe vekşand û perestgehên mirovatiyê zengilên xwe leqandin. Hîngê di navbera erd û ezmên de ferîştan nimêj ji bo giyanê pîroz dikirin û xwedêwendên ronahiyê li hawîrdora termê

BARÎNÊ ramûsanên pîroziyê diçandin… diçandin û diçandin…
Tarîperestan hewil dan ku mirov û mirovatiyê di hindurê BARÎNÊ de bikujin û bi hemû hovîtiya xwe darên zeytûnê bi girî bikin. Lê mêw û darên zeytûnê helbest, pend û ramanên wê li ezber kiribûn. Li siberojê wek sifretekwînine pîroz di perestgeha jiyanê de, dê bên xwendin… bên xwendin û bên xwendin…
Ta çemê demê di herikandina xwe de be û tevgera jiyanê li ser gozemînê li ber xwe dide, ronahîzêya Barînê dê biherike… biherike û biherike…
Di navbera roj û şevan de sînor hatibûn rakirin û destan li pey destanê li Efrînê çîk didan û tîrêjên wan çîkdanina li cîhana azadîxweziyê dibûn pêlvedan û golvedanên berxwedêrî û şanaziyê.
Li sînorên gundê Şêxorzê devê tivingê ji tiliya nîşanê ya lawekî rojê seyr dima û ji qurşînan re digot: Ma qey tiliya lawên rojê vîn bi xwe ye?! Di bin sîwana vê şevê de û di nav serma Rêbendanê de lêvên min germ û sor bûn. Newalên çiyayê Bilbilê mîna yên Kevirê Ker ji laşên tarîperestan hatin dagirtin û hîn jî teltîk bê rawestandin tê guvaştin.
Li nêzîkî bajarokê Bilbilê, li navendeke bijîşkî hin birîndar hebûn û hîngê Bêrîvana nojdar li wê navendê bû.

Di ber dermankirina birîndaran re wê ji xwe re digot:
- Barîn û Bêrîvan. Belê ger "ê" û "v" ji navê min bên avêtin navê min jî dê bibe Barîn. Lê soz û peyman ger ez û Rojdêr daweta xwe bikin û keçeke me bibe, ezê navê wê bikim Barîn. Li rojê deh caran bang bikin û bibêjim: Barîn… Barîn… Barîn…
Eger Xweda lawek da me ezê navê wî bikim Barînistan û li rojê deh caran bibêjim: Barînistan… Barînistan… Barînistan…
Bêrîvanê ji wan birîndarina pirsî û got:
- Hûn li şerê herêma Bilbilê bûn, şervanek navê wî Rojdar e, ma ew ne li ba we bû?!
Wan jê re gotin: Na; ev nav bi me re derbas nebû.
Li danê nîvro Mamoyê Reşo diçû nav darên xwe yên zeytûnê, wî riya xwe bi kaniya Ziravkê xist û xwest çend mist av jê vexwe. Bihneke pir xweş ji ava kaniyê dihat û darên ku li hawîrdora kaniyê bûn, şaxên wan semayeke buharî di hemêza Rêbendanê de dikirin. Mamoyê Reşo li aliyê xwe yê rastê mêze kir, dît ku Remoyê Şivan berve wî tê.
**Mamoyê Reşo:** Lo Remooo!
**Remoyê Şivan:** Haaaa Apê Mamo çi heye?!
**Mamo:** Lo îro çima bîna ava Ziravkê ewqas xweş e? Heftê sal in ez jê vedixwim, lê îro bîneke xweş ji ava wê

tê.

**Remoyê Şivan:** Apê Mamo! Berî demjimêrekê giropek şervanên Efrînê ji eniya şer vedigerîn, wan av ji kaniyê vexwerin, pênekê li bin van darina rûniştin û di pişt re çûn.

Mamoyê Reşo pişta xwe da koka darekê rûnişt û ji xwe re got:

- Ta dar û ava kaniyên Çiyayê Kurmênc jî bi berxwedêrên xwe dilşad in.

Remoyê Şivan deng li pezê xwe kir û hat li tenişt Mamo rûnişt û got: Apê Mamo! Dema ku wan şervanina av ji kaniyê vexwerin, wan bi hev re gotin:

- Ey kaniya Ziravkê! Bi dildarî di hemêza vê axê de biherike, beherike û biherike… Ta xort û keçên Efrîna ronahîperest hene bê xem be. Di pişt re li bin vê darê rûniştin û gotin: Darinooo! Avdar nêzîk dibe û soz dîsa lawên rojê wê Newroza xwe li bin siha we li dar xin û semaya azadiyê bikin. Di pişt re tev rabûn berê xwe dan çiyayê Hawarê û çûn.

**Mamoyê Reşo:** Lo Remo! Bêguman xort û keçên me bi dilsozî berevaniyê ji ber Çiyayê Kurmênc de dikin, lê tirsa min ji bazaran heye. Wî kesereke kûûûr kişand û gotina xwe domand:

- Di nav wan kelemên ku di dawa çiyayê Hawarê de û ji

danê sibehê ve dû radibe. Tu ji wî alî ve dihatî, çi li wir heye?

**Remoyê Şivan:** Apê Mamo…! Sê roj in ez pezê xwe tînim li van derina diçêrînim. Sê kavirên min ên nêr di nav pêz de hebûn. Bavê min ji min re got: Rojane pêz bi wî alî de bibe û li wê çolê rojane kavirekî şerjêke û goştê wî bigihîne şervanan.

**Apê Mamo:** Wey xwedê ji te, bavê te û ji hemû kesên ku ji ber Efrînê de berevaniyê dikin razî be. Remoyê hêja…! Du kavirên min jî hene, ezê wan berdim nav pezê te û xwezî tu du rojên din jî pezê xwe li vir biçêrînî.

**Remoyê Şivan:** Dibe; ezê wisa bikim. Mala te ava be Apê Mamo.

Hîn Apê Mamo û Remoyê Şivan di wê gengerşê de bûn, dengê balefirên kînê ji ezmên hat û bajarokê Reco û gundên wê bombebaran kirin. Pezê Remo ji dengên bombebaranê berve Remo bezî û tev tope hev bû. Hîngê Remoyê Şivan rabû li ser xwe sekinî, nêrînên xwe berve çiyayê Hawarê berdan û ji Mamoyê Reşo re got:

- Apê Mamo…! Tu pezê min bibe mal û ji bav, dê û hevjîna min Xanimê re bibêje: Remo çû berevaniya axa Efrînê bike. Belê Apê Mamo! Divê ez xwe bigihînim ba şervanan.

Berî ku Apê Mamo bipeyive Remo berê xwe da sîngê

çiyayê Hawarê û her du gav kirin gavek. Kaşê çiyayê Hawarê gavên Remo nediwestandin û hêdî hêdî Remo di nav darên berûkê de ji pêşçavên Apê Mamo winda bû.
Berî ku pertavên royê yên roja dawiyê ji Rêbendanê di nav lêvên çiyayê Amanos de winda bibin û şeva yekê ji Reşmehê konê xwe vegre, Remo gihîşte nav komek şervan û bi meraqeke bilind ji wan re got:
- Ez hatime ta ku ligel we berevaniyê ji ber Çiyayê Kurmênc de bikim. Ku ez mirim, bila mirineke bi rûmet be.
Serpereştê wê koma şervanan ji Remoyê şivan re got:
- Wey tu bi xêr hatî birayê Remo! Hatina te cihê rêzgirtinê ye û ji erkê her Kurdekî ye ku di ber Efrînê de berevaniyê bike. Lê biborîne ji ber ku te perwerde li ser çekan nekiriye, tu dikarî biçî li gundê xwe karekî din ji bo berxwedana Efrînê bikî. Ya din temenê te mezin e û şer ne hêsan e.
Remoyê Şivan bi zaravayê gundê xwe ji wî serpereştî re got:
- Birazî…! Gule min ke. Ez Remo me, temenê min jî pêncî û heft sal in û bîst û pênc sal in jî ez şivan im. Kesek ji we nikare mîna min bi kilaşînkofê nişanê bigre. Birazî…! Ez hatim û venagerim. Ya din divê ez biçim eniya şer. Axa Çiayê Kurmênc rûmeta me ye û hatime ku

berevaniyê ji ber rûmeta xwe de bikim. Birazî…! Ez Remo me. Tenê kilaşînkofekê bi min din û winê bibînin ku Remo kî ye.

Serpereştê wê koma şerevanan li çavên Remo mêze kir, wî gelek nameyên pêdariyê tê de xwendin. Careke din jê re got:

- Birayê Remo! Ku tu bi ya min bikî çêtir e. Yanê biçe mal û ligel gundyan karekî ji bo berxwedanê bike. Xwerina ku rojane tu amade dikî û ji şervanan re tînî, ew jî beşek ji berxwedanê ye.

Remoyê Şivan ziq bi çavên wî ve nihêrî û got:

- Xwerzî! Ez venagerim û divê bi erkê xwe rabim. Yanê ez venagerin. Birazî! Tu dikarî ji çiyayê Hawarê bipirsî ku xalê te Rome çiqas beraz bi yek qurşînê di nav kelemên wî de vegevizandine?

Piştî danûstandineke dirêj serpereştê koma wan şervanina razî bû û kilaşînkofek da Remoyê Şivan û jê re got: Pîroz be.

Remoyê Şivan li kilaşînkofê mêze kir, devê wê ramûsand û bi serpereşt re got:

- Birazî…! Soz û peyman yek qurşîna vê kilaşînkofê vala naçe. Ya ku ji we dixwezim min bigihînin eniya şer a pêşîn. Hîngê hûnê bibînin ku xalê we Remo dê çawa nêçîra rûviyan bike?

Hîn Remoyê Şivan gotina xwe bi dawî nekiribû, şervanekî got:
- Xalê Remo! Ma ev kûçikê li ber deriyê şikeftê yê te ye?!
Remoyê Şivan jê re got: Belê kûçikê min e û wê bi min re biçe eniya şer.
Dema ku Remo wisa got, serpereştê wê koma şervanan seyr ma û ji wî re got:
- Ez tênegihîştim ku çawa kûçik wê bi te re biçe eniya şer? Na çênabe, ma qey tu dixwezî ku dijmin zanibin em li kû ne?! Ev çi gotin e?
Remoyê Şivan berkenî bû, rabû û çû destê xwe di ser serê kûçik re bir û anî û got:
- Xwarzî! Ev kûçik çar sal in li ba min e û min başperwerde kiriye. Yanê ev kûçik bicarekê narewe û tenê ku ez ji wî re nîşan didim, ew li gor wan nîşanina bi karê xwe radibe. Belê; ewê bi min re biçe eniya şer.
Serpereştê koma şervanan carina dudulî dibû û carina jî bi xwe re digot: Emê tenê şevekê Remoyê Şivan bişînin eniya şer û wî têxin bin çavdêriya xwe û encama gotinên wî bibînin.
Li şeva yekê Reşmehê, li demjimêr deh Remoyê Şivan li eniya şer bû. Belê li eniya şerê ronahiyê li hember tariyê bû. Di nav tariya şevê de Remoyê Şivan di bin dareke

zeytûnê de erd kola xwe tê de dirêj kir û ji hevalê xwe yê şervan re got:
- Min di bin axê de veşêre û bila tenê serê min û destên min li derve bimînin.
Piştî ku hevalê wî yê şervan Remo di bin axê de veşart, Remoyê Şivan jê re got: Tu jî biçe li cihekî ku te biparêze rûne û bîbîne ku ezê çawa îşev nêçîra rûvî û çeqelên rihdirêj bikim.
Dema ku ew şervan çû di nav çend zinaran de cihê xwe girt, Remoyê Şivan ji kûçikê xwe re got: Quto! Li tenişt min be. Hîngê Quto hat li tenişt wî û li ser zik xwe dirj kir, serê xwe da ser lingên xwe yên pêşîn û bi pozê xwe dûr û nêzik bîn dikir.
Li nîvê şevê Quto pir bi hêdî û tenê carekê girînî bi xwe xist û bi aliyê rastê de serê xwe zêvirand. Hîngê şev pir tarî bû û tiştek bi ber çavên Remoyê Şivan neket. Careke din Quto tevgera xwe dubare kir, hîngê Remoyê Şivan pir bi hêdîka got:
- Quto şerjêkirin.
Quto wek birûskê û bêdeng hilpekî û piştî sê-çar xulekan vegerî xwe mîna berê kir, lê devê wî bi xwîn bû. Ta danê berbangê Quto çar caran wisa kir. Cara pêncê dema ku Quto kire giregir, Remoyê Şivan dît ku du tarîperest hewil didin xwe bigihînin ser girekî ku li nêzîkî wan bû,

lê berge dûr bû. Hîngê Remoyê Şivan nîşan girt, tiliya xwe li teltîka kilaşînkofê guvaşt û yek ji wan di xwînê de vegevizand. Ta hîngê Quto gihîşte tarîperestê din, devê xwe xiste bin çenga wî û tenê carekê rast û çep veçengand. Remoyê Şivan ji bin axê derket û bi hevalê xwe yê şervan re got:

- Divê em cihê xwe biguhêrin an jî ji vir biçin.

Remoyê Şivan serê Quto maç kir û wî şervanî jî got:

- Xalê Remo…! Bila hemû nokerên Kurdan û cîhana bêdeng û bê wijdan bi qurbana serê Qutoyê dilovan û sozdar bin û wî jî serê Quto maç kir.

Berî ku Remoyê Şivan, hevalê wî yê şervan û Quto ji wî cihî bi rêkevin, dengê balefireke kîndariyê ji ezmên hat û tewşankî ew herêm bombebaran kir.

Bi wê bombebaranê re kelpezinarek bi hêz vepekî û li omiza Remoyê Şivan ket û xwîn di pişta wî re herikî. Hîngê şervanê ku bi wî re bû kir û nekir xwîn raweste, lê bê çare bû.

Remoyê Şivan got: Quto bilezîne hin konik wîne… konik.

Quto kire kûztînî û bi lez û bez devê xwe dixiste nav berqef û zinaran, piştî çend xulekan vegerî û hin konikê pilindiran di devê wî de bû. Quto konik danî ser devê birîna Remoyê Şivan û tavilê xwîn rawestî.

Piştî ku xwîn ji birîna Remo rawestî, şervên hin şax ji dareke zeytûnê qepirandin û Remoyê Şivan di nav de veşart, ta ku ew ji balefirên keşfê ve netê xuyankirin. Hîngê kûztînî bi Quto ket û wek birûskê çû.

Ta danê êvarê Remoyê Şivan û wî şervanî di bin wan şaxên dara zeytûnê de man. Dema ku şevê bi tariya xwe Çiyayê Kurmênc dinixumand, dengê kûztîniya Quto hat, şervên dît ku mirovek li hespekî siwar e û di devê newalê de bi lez berve wan tê. Dema ku ew gihîşte ba wan, wî siwarî got: Pismam Remo!

Remoyê Şivan çavên xwe vekirin û bi dengekî hêdî got:

- Pismam Hemo…! Tu bilezîne min li hespê siwar bike û bigihîne cihekî dermankirinê. Tişt bi serê min netê û birîna min sivik e. Lê berî ku hûn min li hespê siwar dikin, ezê serê Qutoyê dilsoz maç kim.

Piştî ku Remoyê Şivan serê Qutoyê dilsoz maç kir û Quto jî du caran destê wî yê rastê bi zimanê xwe alistin, pismamê Remo û wî şervanî Remoyê Şivan li hespê siwar kirin û ji çiyê daxistin ser riya bajarê Efrînê û li wir bi tirumbêlê gîhandin nexweşxana Avrînê.

Li nexweşxana Avrînê nalenala birîndaran bûbû sîmfoniya sirûda êşan, ji ber ku tevahiya birîndaran zarok, jin, pîrejin û kalemêr bûn û hemû li gundê xwe bi bombebaran û topbarana ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên

wê ve birîn bûbûn.

Dema ku Remoyê Şivan xistin odeya nimre -4- bijîşkê nexweşxanê û nojdara jîr û zîrek Bêrîvan bi lez derbasî oda nimre 4 bûn, Bêrîvanê dît ku yê birîndar bavê wê Remoyê Şivan e. Wê bi coş û kelogirî dêm û destên bavê xwe maç kirin û got:

- Bavo…! Ez bi heyrana te bim, çima tu birîndar î?

Remoyê Şivan bi dengekî hêdî û têrpêdarî ji keça xwe Bêrîvana nojdar re got:

- Keça min Bêrîvan! Bê xem be, birîna min sivik e. Xwîn û giyanê min ne ji yên pakrewanên Efrînê buhatir in. Keça min…! Berxwedana Efrîniyan ji bo Çiyayê Kurmênc rûmet e.

Bijîşk dest bi dermankirina birîna Remoyê Şivan kir û Bêrîvanê jî alîkariya wî kir. Di ber wê dermankirinê re Bêrîvanê hin gotinên bavê xwe yê şivan li bîra xwe tanîn. Dema ku Bêrîvan, bira û xwîşkên wê ji dibistanê vedigerîn mal, li danê êvarê Remoyê Şivan ji wan re digot:

- Li xwendina xwe miqate bin. Zanîn dermanê hemû êş, derd û birînên me ye.

Berî ku bijîşk û Bêrîvana nojdar dermankirina birîna Remoyê Şivan bi dawî bikin. Çend birîndarên din gihîştin nexweşxanê û ew jî anîn odeya nimre 4.

Dema ku Bêrîvanê li wan birîdarina mêze kir, wê dît ku destgirtiyê xwe Rojdar di nav wan de ye û cilên wî ji xwînê sor bûne. Bêrîvanê her tişt ji dest xwe danî, berve Rojdêr çû û got:

- Rojdaaar… Rojdar! Tu çi bû yî Rojdar?!

Rojdêr xwest zimanê xwe bigerîne û bersiva Bêrîvana çavreş bide, lê ji ber ku birîna wî pir giran û dijwar bû, zimanê wî negerî û bersiv di nav lêvên wî de miçiqî.

Rojdêr hewil da ku destê xwe yê çepê bilivîne û têxe destê Bêrîvanê, lê birînan zora wî biribûn û tenê di nav xwînê re nêrînên xwe yên xatirxwestinê di çavên Bêrîvana çavreş de digerandin.

Rondikan xwe ji çavên Bêrîvanê vedizîn, mijangên wê ji bermaya kilê şuştin, di ser dêmên wê re herikîn û darivîn nav xwîna Rojdêr. Dilê Rojdêr çend caran lêda û nêrîna dawiyê ji çavên Bêrîvanê di reşika çavên xwe de meyand û dilê wî rawestî. Ji çavên Bêrîvanê rondik mîna xunava li ser pelên dara zeytûnê di ser dêmên wê yên nêrgizî re di ser sîngê Rojdêr yê ku ji xwîna pakrewaniya pîroz sor bûbûn de herikîn.

Remoyê Şivan destê xwe bi hêdî berve keça xwe Bêrîvanê dirêj kir, lê ji herikandina rondikan çavên Bêrîvanê ji bilî xwîn û rûçikê Rojdêr tiştek nedidîtin. Ta hîngê jî Remoyê Şivan nizanî ku çima Bêrîvan digrî.

Careke din wî hewil da ku ji keça xwe re bibêje were ba min, lê zimanê wî ji êşê giran bûbû.

Çar nojdar hatin Rojdar ji ser têxt rakirin û li pêş çavên destgirtiya wî Bêrîvana çavreş birin odeya pakrewanan. Bêrîvan li gel wan çû û li ber deriyê oda pakrewanan destûr ji hevalên xwe yên nojdar xwest. Wê sê caran eniya Rojdêr ya bi xwîn maç kir û got:

- Lo pakrewanê doza ronahî, mirovatî û Efrîna rengîn…! Soz, peyman û sond bi xwîna te û ya hemû pakrewanên mirovatî, Kurd û Kurdistanê. Ta dilopek xwîn di tamarên min de digere, ez ji doza we venagerin. Ji îro û şûn de navê min TOLÊSTÎN e.

Piştî ku herçar nojdaran Rojdar xistin odeya pakrewanan û derî girtin, wan bi destên Tolêstînê girtin û birin odeya nimre 4.

Dema ku Tolêstîn gihîşte tenişt textê bavê xwe Remoyê Şivan, wî bi dengekî hêdî û qetqetî jê pirsî: Keça min…! Ew xortê ku şehîd bû, kî bû? Çima tu ewqas digrî? Hîngê Tolêstînê gustîlka destgirtiyê ji tiliya xwe derxist û xiste tiliya xwe ya nîşanê.

Bêrîvanê ji bavê xwe re got: Bavo! Ew xortê ku niha şehîn bû, yek ji şervanên Efrîna berxwedêr bû. Lê ji niha û şûn de navê min TOLÊSTÎN e.

Bi wê gotina Tolêstînê re Remoyê Şivan têgihîşt ku ew

xortê şehîd Rojdar bû. Wî destê xwe yê rastê bi hêdî dirêj kir, bi destê keça xwe Tolêstînê girt û jê re got:

- Keça min Tolêstîn…! Pakrewan namirin. Keça min! Serkeftina Efrînê wê bibe daweta te û ya hemû keç û xortên gelê Kurd. Keça min! Pakrewan rûmeta gel û welêt in û gustîlka Rojdêr ta mirinê jî biparêze.

Tolêstînê destê bavê xwe maç kir û jê re got:

- Belê bavo ta mirinê. Ev çar roj in ez ji eniyên şer vegerîme nexweşxanê. Siba li danê sibehê ezê dîsa biçim eniyên şer ji bo dermankirina birîndaran. Lê soz û peyman ezê tola Rojdêr û her pakrewanekî Efrînê ji wan terorîstan bistînim.

Hîn Remoyê Şivan serê keça xwe Tolêstînê maç dikir, du hevalên Tolêstînê ketin hindurê odeya nimre -4- û jê re gotin:

- Bêrîvan! Divê tu xwe amade bikî û piştî du demjimêran emê biçin navçeya Şiyê û sê rojan li wir bimînin.

Tolêstînê ji wan herdu hevalên xwe re got:

- Hûn jî zanibin ku niha navê min Tolêstîn e. Ji bo çûna navçeya Şiyê jî ez amade me. Lê bavê min birîndar e û divê ez li ba wî bimînim.

Remoyê Şivan bi zimanekî giran ji keça xwe Tolêstînê re got:

- Keça min! Bi hevalên xwe re here. Tiştek bi min nabe.

Birîna min sivik e.
Li nîvê şevê Tolêstîn ligel herdu hevalên xwe yên nojdar li tirumbêlê siwar bûn û ji bajarê Efrînê derketin. Ji ber ku tirumbêl tev herikirî bû, wan hawîrdora xwe nedidîtin û ne jî dizanîn ku di kîjan riyê re diçin. Tenê ajokar dizanî ku di kîjan riyê re dê biçin navçeya Şiyê.
Tolêstîn bêdeng bû, lê wêneya Rojdêr ji pêş çavên wê nediçû. Hemû gotinên wî mîna ayetine pîroz di bêdengiya xwe de bilêv dikirin. Carina wê mobayila xwe vedikir û nameyên Rojdêr ên dawiyê dixwendin û rondik di ser ekrana mobayilê de dihatin xar. Lê ta hîngê hevalên wê yên nojdar ku ligel hev diçûn navçeya Şiyê nizanîn ku destgirtiyê Tolêstînê şehîd bûye. Nameya dawî ku Rojdêr ji Tolêstînê re şandibû, tê de weha gotibû: "***Dilistana min Bêrîvan! Pir bi xem mebe û li xwe haydar be. Ez niha li navçeya Şiyê me û şer giran e. li bîstî Avdarê emê daweta xwe li bajarê Efrînê, li Qada Azadiyê bikin. Ji te hez dikim… hez dikim û hez dikim***".
Piştî ku Tolêstînê nameya Rojdêr xwend, wê gustîlka xwe çar caran ramûsand û mobayila xwe vemirand. Hîngê hevaleke wê jê pirsî: Çima çavên te rondikan dibarînin? Tolêstînê çîroka Rojdêr ji wan re hewal da.
Li navçeya Şiyê û di şikefteke ku hin birîndar tê de bûn, Tolêstînê û hevalên wê ligel bijîşkê li eniya şer birîndar

derman dikirin. Lê hersê nojdar û bijîşk jî bi çek bûn. Li danê berî berbangê şervanan komek çeteyên terorîst ên dewleta Tirk dorpêç kirin, hin ji wan bi lez şandin dujehê û hin jî ligel birîndarên wan girtin.

Şervanekî xwe bi lez gîhande şikefta birîndaran û ji bijîşk re got:

- Me bîst û çar terorîst girtine, birîna yekî ji wan pir giran e û em naxwezin ku ew bimre. Em dixwezin hin agahiyan ji wî werbigrin. Divê yek ji we bi min re biçe wê derê û wî derman bike.

**Bijîşk** got: Ezê biçim û bila hersê nojdar li ba birîndarên me bimînin.

**Tolêstînê** tavilê got: Na... na; divê tu li ba birîndarên me bimînî. Ezê biçim wî tarîperestî derman bikim. Belê… belê ezê biçim. Belkî niha hin birîndarine me werin. Bê te nabe.

**Bijîşk** got: Tu û hevaleke xwe biçin û bi lez vegerin vir. Belkî tu bi tena xwe nikaribî birîna wî derman bikî.

**Tolêstînê** got: Tu baş dizanî ku ez di karê xwe de jîr im. Yanê ez dikarim wan hemiyan jî di demeke kurt de derman bikim. Ez pêşniyar dikim ku tu û herdu hevalên min ên nojdar li ba birîndarên me bimînin.

Dema ku bijîşk razî bû, dilê Tolêstînê kire gupgup. Wê du şeyên qurşînan li kilaşînkofa xwe siwar kirin û bê ku

kesek hestewar bibe gustîlka Rojdêr a ku xistibû tilya xwe ya nîşanê çar caran maç kir û ligel wî şervanî ji şikeftê derketin û çûn cihê wan terorîstan. Hîngê dewleta Tirk û çeteyên wê bi hemû çekên giran û sivik êrîşî herêma Çiyayê Kurmênc dikirin.
Dema ku Tolêstîn û wî çekdarî gihîştin şikefta ku hemû terorîstên girtî û birîndar tê de bûn. Şervanan ji Tolêstînê re gotin: Divê tu vî birîndarî derman bikî, belkî nemre û em agahiyan jê werbigrin.
Tolêstînê li wan çeteyan mêze kir, hemû rihdirêj, qirêj û mirûzê wan wek ê çeqel û rûviyên gurî bûn. Wê destê xwe rakir û li gustîlka Rojdêr mêze kir. Ji wan sê şervanina re got:
- Xwezî win vî birîndarî ji nav van rûvî û çeqelan derxînin û ezê li pêş deriyê şikeftê wî derman bikim.
Dema ku hersê şervanan ew birîndarina ji şikeftê derxistin, Tolêstînê gustîlka Rojdêr maç kir û tiliya xwe ya nîşanê li ser teltîka kilaşînkofê ta dawiyê guvaşt û rast û çep qurşîn li wan terorîstan barandin ta dîwarên şikeftê ji xwîna wan sor kirin. Belê yek ji wan nehîşt û ji şikeftê derket.
Şervanan Tolêstîn girtin û jê re gotin: Çima te wisa kir? Ma tu nizanî ku çênabe em dîl û birîndaran bikujin?! Ev kar ne ji sinca şervanên Kurd e. Çima te wisa kir? Rast e

mejiyê wan bi hovîtiyê hatiyê avdan, lê em ne wek wan in.
Tolêstînê tiliya xwe ya nîşanê rakir û ji şervanan re got:
- Ev gustîlka Rojdarê pakrewan e û navê min ji duh ve Tolêstîn e. Belê hîn jî hêrsa min daneketiye.
Şervanan Tolêstîn vegerandin ba hevalên wê û çîrok ji bijîşk re hewal dan ku Tolêstînê çi kiriye.
Bijîşk ji Tolêstînê re got:
- Tucarî çênabe ku nojdar û bijîşk birîndar û dîlan bikujin. Herweha şervanên me wî karî nakin. Ji ber wê jî divê şervan te vegerînin nexweşxaneya Avrînê.
Li danê nîvro Tolêstîn gihîşte nexweşxaneya Avrînê û serast çû oda nimre -4- ji bo bavê xwe Remoyê Şivan bibîne. Dema ku derbasî odê bû, wê dît ku textê bavê xwe vala ye. Bi lez ji odê derket û ji hevala xwe ya nojdar ya ku di wê odê de kar dikir pirsî: Çima bavê min ne li ser textê xwe ye? Kanî bavê min? Wê nojdarê Tolêstîn hemêz kir û got:
- Şehîd namirin. Şehîd rûmeta me ne.
Piştî demjimêrekê rêweresmên pakrewanan ji nexweşxanê dest pê kirin û bi hezaran xelkê Efrînê di bin bombebaran û topbarana dewleta Tirk û çeteyên wê de, bi lîlî û siloganên berxwedana Efrînê pakrewanên xwe oxir dikirin.

Tolêstînê bav û destgirtiyê xwe bi rondik û lîliyan oxir dikir. Carina jî ji xwe re digot: Îro daweta Rojdêr e û bavê min jî xwest li roja dawetê li kêlek zavê xwe be. Ezê ji malbata şehîdan bixwezim bila gora herdiyan li kêlek hev bin.  Li dawiya rêweresma oxirkirina şehîdan Tolêstîn li ser gora Rojdêr sekinî û got:

- Bêguman cihê we hemiyan bihuşt e.  Min tola te ji tarîperest û mejîkoran stand, lê ez hîn têr nebûme.

Hîngê Diya Rojdêr Tolêstîn hemêz kir û got:

- Rojdêr ez û tu hîştin û ligel bavê te bûn pakrewanên Efrînê.

Tolêsînê û Diya Rojdêr bi hev re gotin: Pakrewna rûmeta me ne.

Ta ku Tolêstîn û Diya Rojdêr ji goristana pakrewanan derketin, wan li pey xwe li gora Rojdêr mêze dikirin.

Piştî ku Tolêstîn du rojan li mal ma, dîsa vegerî ser karê xwe yê nojdariyê û bi vîna berxwedanê li birîndaran miqate dibû. Lê tucarî wêneya şehîdbûna Rojdêr ji pêş çavên wê nediçû. Herweha gotin û nêrîna bavê wê yên dawî bi wêneya Rojdêr re dibûn yek.

Dema ku hovîtî hewil dide li ser dawa jiyaneke hêmin û ewle bimexele, qet napirse ku wê çiqas guneh hilgire. Lê di dawa jiyanê de bahozên veşartî pir in û wê hovîtiyê davêjin pişt sînorên tunebûnê. Efrîn landika jiyaneke

hêmin bû, lê dewleta Tirk û peyrewên wê yên wek wê tarîperest bi hemû hovîtiya xwe êrîşên talankeriyê tanîn ser Efrîna xemilzeytûnî.

Xewna tarîperest û mejîçalmîşan hertim ew e ku dengê giriyê zarokan di nav kavilan de bibihîsin û hêviyan ji sîngê dayîkan biqepirînin. Lê xewnên kujerên jînê hertim di bin solên ronahîperest û zarokên mirovatiyê de tên pelçiqandin. Ev ne çîrok û ji derewên xeyalê ne. Di tomargehên ax, zinar, sirt û newalên Çiyayê Kurmênc de destaneyên nû û kevnar bersivine ne widayî ne.

Rojên Reşmehê jî wek yên Rêbendana bejinbixwîn ji kîna terorên serdemê dinalîn û bîna nêrgizan û ya xwîna pakrewanan li sîngê gir û newalên Çiyayê Kurmênc tev hev dibûn. Di bin mitêla şevê de stêrkan jî lavêj ji bo zarokên royê dikirin û gavên demê yên ku berve Buharê diçûn bi awirên xwe dijmartin. Carina perspanên ewran bi rengê xwe yê tarî şev durengî dikirin, lê çîroka wan demkî bû.

Di nav darên henar, gûz, sêv û hêrman de û li ser Girê Endarê Ahoramezde nimêja ronahîperestiyê dikir. Şêrên ji kevirê bazêlt serê xwe bi şanazî bilind kiribûn û li xemil û dîmenên bajarê Efrîna berxwedêr temaşe dikirin. Belê ta perestgeh û şopewarên Çiyayê Kurmênc jî çavên dilbikînan dêşandin. Ji ber ku li hember wan perestgeh û

şopewarên Kurdan, Anadolî xwedî dîrokeke derewîn û xwînî ne. Belê rûpelên dîrokê jî tinazan bi Toraniyên tarîperest dikin. Balefirên bermayên Anadolan kîndariya xwe li Girê Endarê û Kela Horî vala dikirin û daxên kîn û ne mirovatiyê li eniya paytexta xwînrêj zêde dibûn.

Li danê êvarê şeş birîndar ji sivîlan hatin nexweşxana Avrînê û di nav wan de çar zarok hebûn. Tolêstînê û hevalên wê ligel bijîşkan dest bi dermankirina wan kirin. Di ber dermankirina zarokê re diya wê didagirî û digot:

- Bila mala dewleta Tirk bişewite. Ma gunehê van zarokina çi bû?!

Tolêstînê dermankirina zarokekê bi dawî kir û ji diya wê re got:

- Gunehê van birîndarina û yê me hemiyan ew e, ji ber ku em Kurd in. Ya din, ji ber ku dijminên me tarîperest û mejîhov in.

Tolêstîn ji odeya birîndaran derket. Wê dît ku jineke navsal pişta xwe dayê dîwarê wê odê, destên xwe bi jor de rakirine û dibêje:

- Wey Xwedê pergalê dewleta Tirkiyê bişewitîne Ma me û zarokên me çi bi wan kiribûn?! Ma qey Xwedê nabîne, yan ew ne li vî welatî ye?!

Li tenişt wê jina navsal, kalemêrekî pişta xwe dabû dîwêr û digot: Kurdên ku ta niha bêdeng mane, bila zimanê wan

bişkê û cîhana ku naxweze êşa Efrînê bibîne, bila çavên wan birjin.
Berî ku Tolêstîn derbasî odeyeke din bibe û birîndaran derman bike, du xort li pêş deriyê wê odeyê sekinî bûn û yekî ji wan digot:
- Ez berî sê rojan ji eniya şer a başûrê Cindirêsê hatim. Me bi dehan ji wan rihdirêjên terorîst kuştin, lê dawiya wan nedihat. Bi dehan me ji wan girtine û niha li ba me ne. Yên ku ji wan birîndar in jî tên dermankirin.
Tolêstînê li gotina wî xortî guhdar dikir û dema ku wî gotina xwe bi dawî kir. Tolêstînê jê pirsî: Ma tu jî şervanî?!
**Xort:** Belê.
Tolêstîn çend xulekan bêdeng ma û di pişt re ji wî xortî re got: Hîn hûn wan kujerina derman jî dikin? Zinarên Çiyayê Kurmênc ji xwîna şervanên me sor bûne, mal di ser serê xelkê de tên hilweşandin û dîwarên malên Çiyayê Kurmênc ji xwîna jin û zarokên me sor bûne. Ez têñagihêm ku çawa kujerên şîrmij û zarokan tên dermankirin?!
**Xortê şervan:** Ma çê dibe ku dîl bên kuştin û birîndarên dîlkirî netên dermankirin?! Ew hov in rast e, lê em mirov in.
Tolêstînê dermankirina du jinên ku di wê odê de bûn bi

dawî kir û li ber deriyê odê wî xortî jê re got: Spasiya te dikim.
Tolêstînê jê re got: Çima?
**Xortê şervan:** Ji ber ku ew jinên te dermanê birîna wan nûjen kirin, yek diya min e û ya din jî xwîşka min e.
Tolêstînê ziq li çavên wî xortî mêze kir, keserek kişand û jê re got:
- Şervanê hêja…! Ew terorîstên ku we girtine û hûn birîndarên wan jî derman dikin, ne tenê hov, lêbelê di govdeyê mirovatiyê de mikrob in. Divê ew mikrobina bêne tunekirin û govdeyê mirovahî û mirovatiyê ji wan veterisin. Ma çend diya te hene û çend Efrîna me hene?! Diya te destê wê yê çepê hatiye birîn û Efrîna me jî bi hemû şêweyên hovîtiya dewleta Tirk û çeteyên wê tê wêrankirin û hilweşandin. Vêca çêdibe ku bi mikroban re karê mirovatiyê bibe?!
Hîn Tolêstînê gotina xwe berdewam dikir, sê top li tenişt nexweşxana Avrînê ketin û camên nexweşxanê û yên avahiyên li hawîrdora wê tev şikestin û bû qîreqîra birîndar û xelkê li taxa nexweşxanê. Piştî çarîkek demjimêr sê birîndar û şehîdekî ji sivîlan gîhîştin nexweşxanê. Tolêstînê ligel hevalên xwe yên nojdar û bijîşkan dest bi dermankirina wan birîndarina kirin.
Piştî ku Tolêstînê karê xwe li odeya wan birîndarina bi

dawî kir û ji odê derket. Berî ku bigihîne odeya bihnvedanê, wî xortê şervan jê re got:
- Nojdara hêja! Gotinên te hemû rast bûn.
Tolêstînê spasiya wî kir û jê re got: Ma cihê dîl û birîndarên wan terorîstan li kû ye? Ango nêzîk e yan dûr e? Ya din navê min Tolêsîn e.
**Xortê şervan:** Çênabe ku ez cihê wan ji kesekî re bibêjim. Ma çîrok lîsk e?! Ya din navê min yê tevgerî Rojdar e.
Dema ku wî wisa got, dilê Tolêstînê li ser hev kire gupgup, rondikan mijangên wê şil kirin û wê li gustîlka di tiliya xwe ya nîşanê de mêze kir.
Rojdar şêtûmêt ma û hewil da ku ji Tolêstînê bipirse çima rondikên wê dibarîn û dêmê wê hat guhartin, lê Rojadar girmîş nebû ku wê pirsê jê bike.
Tolêstînê li çavên Rojdêr mêze kir û jê re got: Xwezî em biçin çayxana nexweşxanê û çayekê yan fincanek qehwe bi hev re vexwin. Rojdar pênekê bêdeng ma û di pişt re daxweza Tolêstînê erê kir û çûn çayxanê.
Di ber vexwerina çayê re dengê balefirên kînê ji ezmanê bajarê Efrînê dihat û dengê topbaran û bombebaranê ji çar aliyên Çiyayê Kurmênc dihatin. Tolêstînê bi lez çayê vedixwer, ji ber ku divê hertim li pêş odeya birîndaran amade be. Tolêstînê bi kurtî çîroka xwe û ya destgirtiyê xwe ji Rojdarê şervan re hewal da. Di pişt re jê re got:

- Şervanê hêja Rojdar! Ezê dîsa ji te bipirsim, cihê wan terorîstên ku we girtine li kû ye? Divê ew veyrosên kujer bên kuştin û tucarî dilovanî li wan nebe.

**Rojdar:** Tolêstîna hêja…! Çênabe ku ez cihê wan ji kesekî re bibêjim. Lê piştî sê demjimêran ezê biçim wir. Ez û du hevalên xwe wî cihî diparêzin. Piştî ku agahî ji wan terorîstan bên wergirtin, ez nizanim dê wan ji wî cihî bibin kû?

**Tolêstîn:** Ma di nav wan de birîndar hene?!

**Rojdar:** Belê hene û gelek in.

**Tolêstîn:** Kî wan derman dike?

**Rojdar:** Ji ber ku birînên wan sivik in, du nojdaran ew derman kirin û bi min re vegerîn bajarê Efrînê. Lê dema ez biçim, ezê du nojdaran bi xwe re bibim ji bo dermanê birînên wan biguhêrin.

**Tolêstîn:** Baş e; xwezî ez û hevaleke xwe bi te re biçin wir û dermanê birînên wan biguhêrin.

**Rojdar:** Ew ne karê min e. Şandina nojdaran karê kargêriya nexweşxanê ye. Ew dizanin ku wê kê bişînin.

Hîn Tolêstîn û Rojdarê şervan gengeşeya xwe bi dawî nekiribûn, hevaleke wê bang kir: Tolêstîn… Tolêstîn bi lez were hin birîndar gihîştin nexweşxanê. Tolêstîn bi lez rabû û çû. Rojdarê şervan jî çû odeya ku diya wî tê de bû. Piştî du demjimêran bijîşkê nexweşxanê hin nojdar

civandin û ji wan re got:

- Girtiyine terorîstan li cihekî ne û birîndar jî di nav wan de hene. Şervanan ji me xwestin ku du nojdar biçin wir û wan derman bikin, kî ji we dixweze biçe?

Tavilê Tolêstînê û hevaleke wê gotin: Emê biçin. Bijîşk navên wan nivîsandin û ji Rojdêr re got:

- Tolêstîn û Rohêv wê bi te re biçin birînên wan çeteyan derman bikin.

Rojdêr dixwest ku ji bijîşk re bibêje bila Tolêstîn neçe, lê ne karê wî bû û nexwest bijîşk têxe gumanan.

Bê ku kes bibîne Tolêstînê hin ambolên -derziyên- potasyomê xistin çenteyê xwe yê nojdariyê û ji hevala xwe ya nojdar Rohêvê re got:

- Çima te xwest tu bi min re biçî wan çetan derman bikî?

Rohêvê jê re got: Belkî ez karibim bi şêwakî hinan ji wan talankeran bikujim. Tu baş dizanî ku wan çi bi Barînê kirin. Ez qet nikarim ji bîr bikim. Wêneya Barînê ji pêş çavên min naçe.

Gotinên Rohêvê pir li heza Tolêstînê hatin, ji ber ku armanca wan herdiyan ji wê çûnê yek bû. Tolêstînê ji Rohêvê re got:

- Ne tenê hinan, lêbelê em wan hemiyan bikujin. Tiştê ku ji te dixwezim, ku min li wir çi kar kir tiştekî ji min mepirse.

Rohêvê jê re got: Tevlî ku karê me yê nojdariyê karekî mirovane ye û ji me re Ferişteyên Dilovaniyê tê gotin, lê agirê tolvedana Barînê di cîger û dilê min de qet sar nabe. Hîn herdu nojdar di wê gengeşê de bûn, Rojdar hat û ji wan re got: Divê em biçin.

Hersê ketin tirumbêlê û çûn. Di tirumbêlê de Tolêstîn û Rohêvê bêdeng bûn. Lê her yekê ji xwe re digotin, xwezî hejmara wan pir be.

Dema ku gihîştin wî cihî û ketin hindurê girtîgehê, bîneke pîs û genî ji wan çeteyan dihat. Tavilê Tolêstîn û Rohêvê berpozk dan ber pozê xwe û Rojdar û hevalekî wî li ber deriyê girtîgehê li herdu nojdaran mêze dikirin û wan nizanî ku Tolêstîn çi dermanî dide wan.

Rohêvê ambol amade dikirin û Tolêstînê jî berî ku ambola potasyomê di tamara destê wan ê çepê de berde, jê dipirsî tu ji kîjan welatî yî? Her ku wê ambol di tamara yekî de berdida, jê re digot: Baş e; dêmek hûn ji hemû welatan û herêmên Sûriyê hatine ligel dewleta Tirk a faşist Efrînê dagîr û talan bikin. Berî ku Tolêstîn bigihîne hejmara bîst û çaran û bi dawî bike, xirtînî bi gewriya hinan diket û li pêş deriyê dojehê diketin rêzê. Hîngê Rojdar hestewar bû ku Tolêstînê tiştek bi serê wan çeteyan kir, lê wê karê xwe bi dawî kiribû.

**Rojdêr** got: Nojdarino…! We çi kir? Çima ev çeteyan dimrin? We çi derman da wan? Ma ezê niha ji serpereştê girtîgehê re çi bibêjim?! De ka bibêjin we çi kir?
Tolêstînê li gustîlka di tiliya Rojdarê pakrewan mêze dikir û Rohêvê jî mobayila xwe derxist û li wêneya Barînê mêze dikir.
Piştî ku Rojdêr û hevalê wî yê şervan dîsa pirs dubare kirin, Tolêstînê ji wan re got:
- Me tiştek nekiriye, tenê li gor tê xwestin me kir. Vêca hûn çi bi me dikin xem nîne.
Şervanan Tolêstîn û Rohêv vegerandin nexweşxanê û ji kargêriyê nexweşxanê re çîroka wan hewal dan.
Bijîşkê berpirsiyar ji herdu nojdaran re got:
- Ma hûn nizanin ku ew kiryara we tersî karê me ye?! Rast e; ew çete, kujer û li dijî mirov û mirovatiyê ne, lê tucarî çênabe ku dîl û birîndar bên kuştin. Ya din ev ne ji sincê gelê Kurd e û tucarî di dîroka gelê Kurd de çênebûye. Ma ne hûn ferişteyên dilovaniyê ne?!
Tolêstînê ji berpirsiyarê nexweşxanê re got:
- Belê; ez dizanim. Lê bavê min û destgirtiyê min herdu bi destên wan kujeran birîndar bûn û li vê nexweşxanê şehîd bûn. Ta niha bi sedan birîndar di nexweşxanê de hene û bi sedan jî şehîd bûne. Ma tev bi destên kê birîndar û şehîd bûne?! Tenê bi "Gazên Jehrî" êrîşî Efrînê

nekirine. Lê qet ne tiştekî seyr e ku bi wan gazina jî êrîşî me bikin. Dewleta Tirk û çeteyên wê bi hemû şêweyan kuştina me rewa dibînin. Belê; divê em jî bi hemû şêweyan şerê wan bikin. Ev şer; şerê man û nemanê ye. Bila her kes zanibe, ger Çiyayê Kurmênc têkeve bin destên wan talaneke ku tucarî di dîrokê de çênebûye wê bê kirin. Yanê tenê dîwarên hin malina belkî sax bimînin. Ji berê û başê de karê van kuştin û talankerî ye.

**Bijîşk:** Em dizanin ku karê wan her tiştekî ne baş e. Lê tevlî wê jî çênabe ku birîndarên wan bi destên bijîşk û nojdarên me bên kuştin. Ji hemû aliyan de karê me karekî mirovatî ye.

**Tolêstîn:** Tu rast dibêjî. Lê kesên ku kuştina zarok, jin û hemû Kurdan û herweha mal û mewalê me ji xwe re rewa dibînin û me milet nabînin û mafê me yê jiyanê jî napejirînin. Ma tu wan çi dibînî?! Ma gelo çi cudatî di navbera wan veyrosên wêranê heye?! Wekî ku çawa ji erk û karê bijşkan ne ku wan veyrosên wêranê bi dermên ji govdyê mirov rake û wî ji wan veyrosina veterisîne, herweha divê govdeyê mirovahiyê jî ji van veyrosên tundrew û kujer were paqijkirin. Berî du rojan heft zarok, du şîrmij, çar jin û sê kalemêrên ku bi destên wan birîndar bûbûn, di vê neweşxanê de şehîd bûn. Ma gelo gunehê wan çi bû?!

**Bijîşk:** Ew tiştekî din e. Di şer de helbet sivîl jî jiyana xwe ji dest didin. Yanê şer e û şer bê sinc e.

**Tolêstîn:** Baş e. Bi hemû çek û hêza xwe bi ser xelkê Çiyayê Kurmênc de hatine û kiryarên ne mirovane bi gelê me dikin û em jî li hember wan doza mirovatiyê dikin!!! Ma gelo ev mejî li kîjan bazaran tê dîtin?!

**Rohêv:** Bijîşkê hêja! Dema ku çete derbasî bajarokê Reco bûn, wan termê şervanên me yên ji xort û keçên Çiyayê Kurmênc bûn dişewitandin. Ma tiştê ku bi termê Barînê kirin emê çawa karibin bi wan kesina re bi mirovatî bidin û bistînin?!

**Bijîşk:** Nojdarên hêja! Dîsa ez dibêjim çênabe em Kurd karên li dijî mirovatiyê bikin û çênabe ku bijîşk û nojdar birîndaran bikujin. Ev ne karekî sinciyane ye.

Piştî ku kargêriya nexweşxanê û ligel a şervanan bi Tolêstîn û Rohêvê re darijtin kirin, herdu ji karê nojdariyê bi dûr xistin. Lê berpirsiyarê nexweşxanê ji wê biryarê ne razî bû. Ji ber ku Tolêstîn di karê xwe yê nojdariyê de pir jîr û jêhatî bû.

Tolêstîn û Rohêvê xatirê xwe ji hevalên xwe û ji hin birîndaran xwestin û ji nexweşxanê derketin. Hîngê dengên topbaran û bombebaranê ji navçeyên Reco, Cindirês, Şêrewa û Şera dihatin. Ezmanê Çiyayê Kurmênc ji dengê balefirên kujer û kînê dinalî. Tolêstîn

sekinî û li nexweşxanê mêze kir û ji Rohêvê re got: Karê ku me bi serê wan terorîstan kirî qet ez ne poşmam im û hîn jî hêrsa min daneketiye. Lê her bawer bike ku kargêriya nexweşxanê wê li biryara bidûrxistina me ji karê di nexweşxanê de poşmam bibe.

Rohêvê jê re got: Tolêstîna hêja! Ez jî ne poşmam im û qet poşmam nabin. Lê tiştê ku niha min mijûl dike, piştî dûrxistina me ji karê nojdariyê emê çi karî ji bo xelkê Efrînê bikin?

Tolêstînê destê xwe xiste destê Rohêvê û jê re got: Berî ku em biçin mal, de ka em biçin li cihekî rûnin û vê mijarê gengeşe bikin.

Tevlî ku şer û êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê li ser Çiyayê Kurmênc giran bûn, lê kolanên bajarê Efrînê ji xelkê mişt bûn. Tolêstînê ji Rohêvê re got:

- Tu vîna Efrîniyan dibînî? Miletê ku ev vîn li ba wî heye tucarî ji bilî serkeftinê napejirîne. Lê em nizanin ku di pişt perde û di bin maseyan de çi bazar dê çê bibin?

**Rohêv:** Bazarên çi?

**Tolêstîn:** Rohêva hêja û dilsoz! Bi xwedê ez nizanim. Lê her ku ez diçim mal bapîrê min vê gotinê ji xalên min re dibêje. Ji ber wê jî hema ji xwe berê ew gotin min bilêv kir.

Rohêva hêja…! Tu dizanî ku dewleta Tirk berî ku dest bi

êrîşa li ser Çiyayê Kurmênc bike, bi hezaran kon li aliyê pişt sînor amade kiribûn. Li gor pilanên wan ji hev re digotin: Dema ku em Çiyayê Kurmênc bombebaran û topbarn bikin, xelkê Efrînê bi koman wê berê xwe bidin sînor, li ber me bigerin ta em wan derbasî kampan bikin û hîngê di du-sê rojan de emê ligel hevalbendên xwe serûberê Çiyayê Kurmênc dagîr bikin. Lê wan nizanî ku vîn û pêdariya Efrîniyan ji hemû pilan û pîlanên wan bi hêztirîn e. Wan nizanî ku Efrînî ji pişt keç û xortên xwe yên şervan venakşin û wan bi tenê nahêlin. Vêca tiştê seyr hin ji me dibêjin, divê em ji van terorîstan re ferişteyên dilovaniyê bin!!!
Berî ku Tolêstîn û Rohêvê bigihînin cihê ku diçûnê, hevala wan Rojîn a nojdar rastî wan hat. Wan silav dan hev, Rojînê ji wan pirsî: Hûn bi kû de diçin, ma qey we karê xwe li nexweşxanê bi dawî kiriye?
Tolêstînê jê re got: Rojîna hêja…! Eger dem bi te re heye, tu jî bi me re biçe Emê li qada bazara kevin hinekî rûnin.
Rojînê jê re got:
- Dibe, hîn demjimêrek li pêş min heye ta ku ez biçim nexweşxanê.
Qada bazara kevin ji xelkê ku ji gundên li ser sînor hatibûn bajarê Efrînê mişt bû. Her çend kes ligel hev rûniştibûn û çîrokên êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê ji

hev re hewal didan. Li wê Qadê Tolêstînê çîroka xwe û ya Rohêvê ji hevala xwe ya nojdar Rojînê re hewal da. Rojîn li biryara kargêriya nexweşxanê seyr ma û ji wan re got:

- Piştî ku ez karê xwe li nexweşxanê diqedînim, ez ligel Dr. Azad diçin birîndarên ku li gundan bi cî bûne derman dikin. Eger hûn bixwezin ezê ji Dr. Azad re bibêjim hûn jî bi me re kar bikin.

Gotina Rojînê pir li kêfxweşiya Tolêstînê hat, lê berî ku biryara erêkirinê bide, Rohêv ji Rojînê pirsî: Ez tênegihîştim ku çawa birîndar li gundan hene?

Rojînê jê re got: Şervanên ku birînên wan sivik in, li hin gundan di malan de tên dermankirin, lê tu kes cihê wan nizane.

Hîngê Tolêstînê ji Rojînê re got: Zor baş e; ez li benda bersiva te me. Xwezî Dr. Azad razî bibe. Rojînê xatirê xwe ji wan xwest û çû nexweşxanê.

Piştî du demjimêran di riya mobayilê re Rojîn li Tolêstînê gerî û jê re got: Pîroz be Dr. Azad dibêje bila Tolêstîn xwe amade bike û siba li danê nîvro were kîlînka min.

Li danê nîvro dema ku Tolêstîn çû kilînka Dr. Azad, wî sedema dûrxistina wê ji nexweşxanê jê pirsî. Tolêstînê çîroka xwe jê re hewal da.

Dr. Azad serê xwe hejand û jê re got:

- Baş e; Rojane li danê pişt nîvro emê derkevin û birîndarên li gundan derman bikin.

Rojane li danê pişt nîvro Tolêstîn û Rojîn ligel Dr.Azad diçûn li gundan şervanên Efrînê yên birîndar derman dikirin.

Dema ku li gundê Turindê çend birîndar derman dikirin, Tolêstînê ji şervaneke birîndar pirsî:

- Tu çawa birîn bû?

Wê şervanê di ber dermankirina birîna xwe re got:

- Li dema êvarê em li ser girekî li nêzîkî gundê Çeqela bûn û dewleta Tirk û çeteyên wê bi balefir û hemû çekan êrîş kirin. Wan hewil didan ku derbasî gund bibin. Tenê em çar şervan bûn û vîn û morala me ya Barînê bûn. Ta danê nîvê şevê me li ber xwe da, lê mixabin hevaleke me ya şervan şehîd bû. Li wê şevê me deh çete kuştin. Li danê berbangê hevlê me Rêzan birîn bû, tenê ez û hevala xwe Asiye man.

Du roj û du şevan min û Asiyê li ber xwe dida û Rêzên jî di bin zinarekî de hem birîna xwe derman dikir û hem jî qurşîn ji me re amade dikirin. Ji aliyê gundê Erendê ve şervanên me baş alîkariya me dikirin û derbeyên baş li çeteyan didan û rê nedidan wan ku derbasî gundê Çeqela bibin.

Dema ku me hewil da em ji ser wî girî vekşin û xwe bigihînin girekî din, hîngê Rêzan li ser piyên min bû. Piştî ku em gihîştin tenişt girê ku berê me lê bû, topeke li nêzîkî me ket û Asiye jî şehîd bû. Belê; li tenişt wî girî tenê ez û herdu pakrewanan Asiye û Rêzên li wir bûn. Min herdu şehîd xistin navbera du zinaran, bi hin şaxên dara zeytûnê nixumandin û min jî xwe di navbera wan de dirêj kir.

Belê; li kêleka min a rastê şehîd Asiye û li ya çepê jî şehîd Rêzan bû. Gelek caran qurşînên çeteyan li wan herdu zinarina diketin û carina jî li tenişt me diketin. Belê; zinar û şaxên dara zeytûnê yên Çiyayê Kurmênc jî sozdar û parêzvan in û wan em parastin.

Di bin tariya şevê de min hewil da ku ji wir derkevim û xwe bigihînim nav şervanan. Lê du qurşînên çeteyan li lingê min ê çepê ketin û di nav kelemekê de ez ketim. Piştî du demjimêran sê şervan gihîştin min, dudiyan şehîd Asiye û şehîd Rêzan rakirin û şervanekî ku navê wî Rojdar bû, wî ez hilgirtim û anîm cihekî bi ewle. Lê bila mala dewleta Tirk a faşist hilweşe, topek li nêzîk me ket û Rojdar birîn bû. Belê; hîngê Rojdêr navek bilêv kir û got: - Bêrîvaaaan û di pişt re bêdeng ma, lê şervanan ew rakirin û ez bawer im ku Rojdar di nexweşxaneya Evrînê de ye.

Dema ku wê şervanê wisa got, rondikan dêmên Tolêstînê şuştin, darivîn ser lêvan û wê got:

- Ax Rojdarooo! Xwezî ez jî şehîd bibama û bi te re biçûma gorê. Wê li ser hev gustîlk maç kir û digot:

- Rojdar şehîd bû, lê ew di dilê min de dijî. Hîngê wê şervana birîndar ji Tolêstînê pirsî:

- Ma Rojdar şehîd bû?!

Tolêstînê got: Belê destgirtiyê min Rojdar şehîd bû. Herdiyan dest di stiwê hev re birin, rondik barandin û gotin: Şehîd namirin.

Dr. Azad ji nojdaran re got: Divê em ji vir biçin gundekî din û birîndarên li wir derman bikin.

Berî ku bi rêkevin wê şervanê ji Tolêstînê re got:

- Xwîşka hêja û delal! Diyariyeke te li ba min e, divê ez bidim te. Wê şervanê zincîreke zêrîn pir zirav ku tîpa (B) pêve bû ji beriya miltanê xwe derxist û dirêje Tolêstînê kir û jê re got:

- Dema ku Rojdar birîn bû, ev ji stiwê wî qetî û kete erdê, min rakir û xiste beriya xwe û hîngê tenê wî serê xwe hejand.

Tolêstînê zincîra zêrîn xiste nav tiliyên xwe û bi hemû hest, çoş û kela dilê xwe bîn kir û çend caran ramûsand. Hîngê Dr. Azad, nojdar û birîndaran jî rondik barandin.

Piştî ku Dr. Azad, Rojîn û Tolêstînê ji wê malê derketin,

dengê mobayila Tolêstînê hat û bijîşkekî ji nexweşxana Avrînê li wê digerî. Tolêstînê mobayil vekir û tavilê bijîşk jê re got:

- Xwezî tu bi lez xwe bigihînî nexweşxanê. Dewleta Tirk bi gazeke jehrî di ser gundê Erendê de barandiye û ta niha şeş sivîl gihîştine nexweşxanê.

Tolêstînê ji Dr. Azad re ew nûçe got û wan bi lez xwe gîhandin nexweşxanê. Tolêstîn di karê xwe yê nojdariyê de pir jîr, jêhatî û zana bû.

Piştî ku bijîşk û nojdarên nexwexana Avrînê ew kesên ku tûşî "Gaza Jehrê" bûbûn derman kirin, Dr. Azad got:

- Cîhan bê wijdan e û saziyên mafê mirovan dereweke cîhanî ye. Eger wijdanê cîhanê heba û baweriya wê bi mirovatiyê heba, nedihîştin ku çekên kîmawî bên çêkirin. Ji ber ku hertim sivîl dibin qurbanî.

Rojînê kesereke kûr kişand û got:

- Ma ji bilî kîndar, faşist, tundrewên tarîperest û terorîstan kî van cureyên çekan bikar tîne?! Belê; dewleta Tirk jî yek ji wan e.

Bê ku hevalên wê û Dr. Azad haydar bibin Tolêstînê gustîlk û zincîra zêrîn bîn kirin, di pişt re sê caran maç kirin û got:

- Faşist bi hemû awayan dijîtiya mirov û mirovatiyê dikin. Dema ku kefkopika hovîtiyê bi devê wan dikeve û

gilîzê hovîtiya wan di ser çenga wan re diherike, hîngê qet ji xwînrijandinê têr nabin. Lê hertim faşist, terorîst û dijminên mirovatiyê bi destên azadîxwez û şoreşgeran bi dawî dibin û di nav serguyên dîrokê de vedigevizin.

Bijîşkê nexweşxanê ji Tolêstînê re got:

- Îro 16. 02. 2016an e. Ligel Dr. Azad kar bike û li roja 19. 02. 2018an bi şêwakî fermî vegere ser karê xwe yê li nexweşxana Avrînê. Em ji biryara bidûrxistina te û Rohêvê ji kar vekşîn.

Tolêstînê spasiya wî kir û ji çavên wê rondikek di ser gustîlka Rojdêr de ket. Wê keserek kişand û got: Di şerê hebûn û nebûnê de kuştina dijmin bi hemû awayan rewa ye.

Rojeke bê ewr û bê mij bû, li seranserî sînorê Çiyayê Kumênc êrîşên kîndar û tarîperestan ji aliyê şervanên Efrînê ve têk diçûn û nameyên moral û vîna berxwedanê hemû serberjêrên cihanê vediciniqandin. Ji danê sibehê de balefirên dewleta Tirk li ezmanê Efrînê digerîn û hovîtiya hovîtiya di ser Efrîniyan de dibarandin.
Tolêstînê çenteyê xwe yê nojdariyê rakir û di bin wê bombebaranê de çû nexweşxaneya Avrînê. Li danê nîvro balefiran hawîrdora bajarê Efrînê, taxa Eşrefiyê û gundê Turindê bombebaran dikirin û dengê tirumbêlên hawarçûnê ji kolanên bajêr dihat. Hîngê balefirekê malên gundê Basûtê ji xwe re kire armanc û kîna xwe di ser serê zarokan de rijand.
Li gundê Basûtê Dîlber a sêzdehsalî vepekî û di hemêza Henanê yazdesalî de xwîna wan tev hev bû. Dîlberê bang kir û got:
- Anêêêê û dengê wê qut bû!
Ava ya yazdesalî û Dijwar ê heyştsalî vepekîn li dîwarê malê ketin û xwîna wan di ser a Şivanê heftsalî û ya Mihemed ê Nehsalî de herikî.
Bejna Xelîl ê çel û dusalî û hevjîna wî ji xwîna zarokên wan mîna kulîlkên çiyayê Lêlûn sor bûbûn. Girî, xwîn, hawar û qêrîn bûn yek û di guhên gundê Basûtê de dibûn sirûda bêgunehiyê.

Belkî çavên ezmên xetimî bûn, guhên wî ker bûbûn û yan jî paytexta wî bi vedengine ji wê sirûdê bi hêztirîn mijûl bû!

Hêva ya sêzdehsalî li ser piştê dirêjkirî, çavên wê berve paytexta ezmên vekirî bûn û ew bêdeng bû. Xwîna zaroktiyê miltanê Hêva yê sor û xêzreş sortir kiribû. Belê giyanê Hêva bi hilma kaniya Basûtê re xatirê xwe ji hemû hevalên xwe yên zarok xwestibû û li ser baskên ferîştan berve bihuştê difrî. Di dawa deşta gundê Basûtê de darên hinar, gûz, xox û sêvê ji giyanê Hêva ya sêzdehsalî re nimêja oxirkirinê dikirin.

Dema ku zarokên birîndar ên gundê Basûta dilbirîn gihîştin nexweşxaneya Avrînê, Tolêstîn û hevalên wê yên nojdar bi lez birîndar hemêz kirin û xistin odeya dermankirinê. Hîngê Hêva ya sêzdehsalî di hemêza Tolêstînê de bû. Lê çavên Hêva hîştin ku rondik ji çavên Tolêstînê biherikin. Wê du ramûsanên oxirkirinê li ser dêmên Hêva çandin. Tolêstînê zincîra zêrîn ji beriya xwe derxist, xiste stiwê Hêva û got:

- Hêvaaa…! Barînê û hemû hevalên wê silav bike û ji wan re bibêje:

- Efrîniyên rojperest bi vîna xwe çîk didin, çîk didin û çîk didin…

Hêvaaa…! Ehmedê Henên[1] û hemû hevalên wî silav bike û ji wan re bibêje:

- Ta dilopek xwîn di govdeyê Efrîniyan de hebe, nahêlin jînistana pîroz ji tarîperestan qirêj bibe û em tola wan li erdê nahêlin, nahêlin û nahêlin…

Hêvaaa…! Eger bi destê min ba, minê giyanê xwe diyarî te bikira û lîstokên te sêwî nedihîştin. Ezê ji navê her zarokeke/î Çiyayê Kurmênc ên pakrewan tîpekê li ser dendikeke zêtûnê bikolim, bikim gerdenê rûmetê û têxim stiwê xwe… Hêvaaa…!

Hêvaaa…! Silavên min bigihîne Rojdêr û jê re bibêje:

- Ta mirin an şehîdbûnê ez gustîlka wî ji tiliya xwe ya nîşanê dernaxim. Ji Rojdêr re bibêje:

- Siba li danê sibehê ji bo evîna wî û ya Efrînê Tolêstînê wê tivinga te rake û biçe çeperên şerê li hember hovîtiyê.

Belê gundê Basûtê gelek bûyerên êşdar dîtine, lê ya "Roja Kuştina Zarokan" êştirîn bû.

Li herêma Çiyayê Kurmênc dem xwîndigirî… Ba ji bêzariyê giraaan giran pêl vedida… Pelên darên zeytûnê ji êşdariya xelkê Efrînê şahiya baranê ji bîr kiribûn. Tomargehên koka daran ji çîrok û evsaneyên Efrînpereweran mişt bûnbûn.

Sibehên herêma Çiyayê Kurmênc di ser bûyerên şevê de

*1- Ehmedê Henên: Navê şervanekî Efrînê ye. Piştî ku şehîd bû terorîstan termê wî birin û li kolanên bajarê Ezazê dest, ling û serê wî jêkirin.*

digriyan… Şevên wê li ber xwe diketin û lêborînên xwe ji sibehan dixwestin… Reşmehê berve Avdarê gav dikir û tûrê wê ji êşan dagirtî bû.

Tolêstînê li ser dêmê her zarokî/e birîndar ramûsanek li pey xwe hîşt û ji kargêriya nexweşxanê re got:

- Ezê sê rojan biçim mala bavê xwe li ba diya xwe bimînim û di pişt re jî derbasî nav refê şervanên Efrînê bibim.

Hîngê Dr. Azad li wir bû û jê re got: Xwezî piştî sê rojan tu dîsa vegerî nexweşxanê û karê xwe yê nojdariyê berdewam bikî.

Dema ku Tolêstîn di tirumbêlê de diçû mala bavê xwe ya ku li gund bû, wê nêrînên xwe li nav zeviyên darên zeytûnê digerandin û carina jî di bejna çiyayên pêdar re hildiperikandin û ji xwe re digot:

- Dêmek tarîperest dixwezin jînistana me bikin mexelgeha mejîzingaran?! Na; ew ji wan re xewn û xeyal e.

Li pêş deriyê malê Tolêstînê gotina bavê xwe"Wey tu bi xêr hatî Tolêstîna min, nojdara xweşik" nebihîst. Çend rondik ji çavên wê herikîn û dêmên wê yên sêvî şil kirin. Hîngê diya Tolêstînê keça xwe hemêz kir û jê re got:

- Wey tu bi xêr hatî keça min! Lê ez çi bikim, îro bavê te pêşwaziya te nekir.

Tolêstînê got: Dayê megrî! Ne tenê bavê min, lêbelê berî du rojan ez çûm mala Rojdêr wî jî pêşwaziya min nekir. Pakrewan rûmeta gel û welêt in.

Hîngê gelek gundî û mervên malbata Remoyê Şivan li mala bapîrê Tolêstînê bûn û dengê topbaran û bombebaranê ji hemû aliyan ve dihat. Piraniya gotinên xelkê ku li mala bapîrê Tolêstînê bûn, şerê dewleta Tirk û serpêhatiyên lehengiyê yên şervanên Efrînê bû. Hin jî li ser sincên Bavê Tolêstînê dipeyivin.

Li danê êvarê dîsa hin xelk li mala bapîrê Tolêstînê bûn û gengeşe li ser rewşa Çiyayê Kurmênc bû. Xortekî ji civatê re digot:

- Îro yên ku nav li xwe kirine (Encûmana Îsalamî ya Sûrî) ya ku girêdayî çeteyên bi ser dewleta Tirkiyê ve, fetweke nivîskî dane û tê de dibêjin:

- ((***Xwîn, rûmet, mal û erdê Kurdên Efrînê li gor ola Îslamê ji bo çeteyên ku hewil didin Efrînê dagîr bikin rewa ye***)).

Dema ku wî xortî wisa got, bapîrê Tolêstînê yê heftê û pêncsalî got: Ma tu rast dibêjî?!

Wî xortî mobayila xwe vekir û ji wî xelkî re ew fetwe xwend.

Bapîrê Tolêstînê serê xwe hejand û got:

- Gelê dost û hogiran! Pir serê xwe bi gotinên wan

xwefiroş û xwedênenasan mijûl mekin. Ji berê û paşê de ev karê wan e. Ji ber wê jî hertim welatên Misilmanan hêlûna kuştin, nexweşiyên civakî û hemû derd û belan e. Mejyê wan qet ji zingara serdeman paqij nabe û dîroka wan naskirî ye ku ji roja roj de ew xwînrêj in.

Wî xortî xwest ku bi bapîrê Tolêstînê re gengeşê li ser wê mijarê bike û xwe bide naskirin ku ew bi dîrokê dizane. Lê bapîrê Tolêstînê jê re got:

- Kurê min! Yê ku Xelîfetên Raşidî kuştin, ên ku serê neviyên pêxember jêkirin û bi ser şûran ve kirin ne Kurd bûn. Yên ku keçên xwe bi zindî binax dikirin û yên ku talana miletan dikirin û hîn jî wî karî dikin ne Kurd in. Hîngê û li dema niha jî yên ku karên ne mirovatî û hovane dikin ev qirêjina û bav û bapîrên wan bûn. Yanê em pir dema xwe bi wan tarîperestina derbas nekin. Ya rast ew e, ku em her yek û li gor kanebûn û zanebûna xwe li berxwedana Efrînê xwedî derkevin û nehêlin ku dewleta Tirk û çeteyên wê derbasî nav xaka me ya pîroz bibin.

Piştî ku bapîrê Tolêstînê gotina xwe bi dawî kir, Hesoyê Mihê destûr ji civatê xwest û got:

- Birakino…! Çima em a rast nabêjin?! Rojane gundên Çiyayê Kurmênc dikevin destên dewleta Tirk û xelkê wan gundan berê xwe didin bajarê Efrînê. Di baweriya

min de dewleta Tirk dê derbasî serûberê Çiyayê Kurmênc bibe û li dawiyê partiyên Kurdî wê li hev vegerin û îxaneta hev bikin. Yanê xwezî di destpêkê de kesên ku xwe berpirsiyar dibînin, bi hişmendî nehîştibana ev şer çêbiba. Lê mixabin xuya ye ku hin bazar li serê me tên gerandin.

Piştî ku Hesoyê Mihê wisa got, bapîrê Tolêstînê ji wî pirsî: Ma Heso bi ya tebe, divê me li hembera dewleta Tirk a ku dixweze Çiyayê Kurmênc dagîr bike, xwe kerkiriba û berxwedan nekiriba?!

**Hesoyê Mihê:** Na bira na; çîrok ne wisa ye. Bêguman divê em berevaniyê ji ber xaka xwe de bikin. Temenê min şêst û heft sal in. Bapîrê min Xwedê giyanê wî bi dilovaniya xwe şa bike, wî ji me re digot: " ***Bi hiş serkeftinên rast têne meydanê***".

Di baweriya min de em nikarin di vî şerî de bi ser kevin. Vêca çima? Penda kurdî dibêje: "***Siwarê li hespê xelkê hertim peya ye***". Hinan ji me digotin ku Emerîka û Rûsiya piştgirê me ne. Lê ya rast dema ku miletek ne li ser hev be û tevgera wî ya siyasî jî mîna gilokek ji deziyê li hevketî be, hîngê kesek jê re nabe piştgir. Bila em xwe û miletê xwe nexopînin. Li hember hêza dewleta tirk a ku hemû dewletên mezin piştgiriya wê di vî şerî de dikin, herêma Çiyayê Kurmênc bi tena xwe nikare bi ser keve.

Dema ku Hesoyê Mihê dipeyivî, xortekî ku di civatê de rûniştibû çavên xwe di Heso de beq dikirin û xuhdan di ser eniya wî re diherikî. Piştî ku Hesoyê Mihê gotina xwe bi dawî kir. Wî xortî bê ku destûrê ji civatê bibe û bi zimanekî sert got:

- Bila her kes hişê xwe û yê bapîrê xwe ji xwe re bihêle. Birastî hin kes di nav me de hene, ew dixwezin ku dewleta Tirk Çiyayê Kurmênc dagîr bike û qet ne xema wan e. Lê bila ew zanibin ku emê bi ser kevin û li dawiyê em dizanin ku kê û çawa wan seza dikin. Tenê tiving dikare serkeftinê wîne.

Dema ku wî xortî wisa got, Hesoyê Mihê rabû ser xwe û ji bapîrê Tolêstînê re got:

- Xwedê Rehma xwe li giyanê Remoyê Şivan bike û derket çû mala xwe.

Dema ku Tolêstîn li mala bapîrê xwe bû, jinekê ji diya Tolêstînê re digot:

- Ez tênegihîştim ku çima hevjînê te tiving rakir û çû çeperên şer, ma ew karê wî bû?!

Tolêstînê mirûzê xwe tirş kir û dixwest ku bersiva wê jinê bide, lê diya Tolêstînê ji wê jinê re got:

- Nazo! Ma te li telefizyonan temaşe nekir, ku wan terorîstan çi bi serê jinên Şengalê kirin?! Ji ber wê jî kesên ku tevlî berxwedana Efrînê nabin û tenê temaşevan

in, sixama reş li serê wan be. Vêca çima Remo tev şervanan bûye…!!! Ev çi pirs e? Ma welat bê xwîn rizgar dibin?!
Tolêsînê li ser gotina diya xwe temam kir û got:
- Eger di civakê de hatiye naskirin ku jin rûmeta mêr e û herweha mêr jî rûmeta jinê yê, lê welat rûmeta gel e û Efrîn jî ji rûmeta Kurdistanê ye. Kesê ku li Efrînê xwedî dernekeve, rastiya wî wek benîştê di devê xelkê de ye. Yanê ew benîşt zû pûç dibe û tê çekirin.
Nazo berkenî bû û ji diya Tolêstînê re got:
- Xwîşka xwîşka Heyat! Hevjînê min Hesoyê Miho ji roja destpêka vî şerî de dibêje:
- Xwezî siyasetmedarên me hebana û nehîştina ku ev şer dest pê bibe. Xuya ye ku dewletên mezin li gor berjewendiyên xwe bi me dilîzin û em ne bi qaserî vî şerî ne. Yanê şerekî ku zirara wî ji kara wî bêtir e.
Dema ku Nazo wisa got, jineke ku li wê civatê bû, wê bi dengekî stûr ji Nazo re got:
- Bila tu û Hesoyê te baş zanibin, ku ji roja yekem de ji vî şerî em bi ser ketine. Ma serkeftin çi ye? Serkeftin ew e, ku em li hember dewleta Tirk şer dikin.
Dema ku wê jinê wisa got, Nazo serê xwe hejand, rabû ser xwe û ji diya Tolêstînê re got:
- Xwedê dilovaniya xwe li giyanê Remo bike.

Berî ku Nazo bi rêkeve, wê jinê jê re got:
- Pir ne dûr e, yên mîna te dê zanibin ku em kî ne û çawa bi ser dikevin.
Piştî ku Tolêstîn û diya wê bi tenê li mal man, diya wê jê pirsî:
- Çima gustîlka Rojdêr di tiliya te ya nîşanê de ye?
Tolêstînê li gustîlkê mêze kir û ji diya xwe re got:
- Dayê! Ta ez hebim divê ez hertim tola Rojdêr û bavê xwe ji tarîperest û faşistan bistînim.
Piştî wê gotinê, Tolêstînê serûberê çîroka xwe ji diya xwe re hewal da. Hîngê wê eniya keça xwe ramûsand û jê re got:
- Belê keça min! Efrîn ji rûmeta Kurdistanê ye û divê her Kurdek lê xwedî derkeve.
Li roja ku Tolêstîn vedigerî bajarê Efrînê û diçû nexwşxanê, xelkê gundên li nêzîkî sînor berve bajarê Efrînê û gundên li hawîrdora wê diçûn. Lê wan nêrînên xwe berve gundê xwe rêz dikirin û keserine kûr dikşandin. Tolêstînê li wan mêze dikir û di tirumbêlê de ev helbest nivîsand:

*Vir Ne Lînîngirad e*
*Mirin li pey wan digrî*
*Lê wê li pey xwe dihêlin*
*Rê…*

*Hawaran li pey wan berdidin*
*Lê ew li wan dilikumin*
*Diçin…*
*Lê bi dil û giyanê xwe dizêvirin*
*Di dilê wan de*
          *Hîn gelek hêvî dikenin*
*Hinan ramûsanên vegerê*
*Li ser deriya malan*
*Û li ser koka darên zeytûnê*
*Belv dikirin û digriyan*
*Dayîkan…*
*Çavên xwe*
*Li goristanan digerandin*
*Xatirê xwe ji dê û bavan*
*Ji dêpîr û bapîran dixwestin*
*Hinan jî…*
*Xatirê xwe*
      *Ji gorên axşil dixwestin*
*Ji nav gundên hilweşî*
*Ji nav bihuşta ku tê dizîn*
*Mîna çemekî ji bêzariyê*
*Berve newaline ne diyar*
*Rojine bê navnîşan*
            *Pêl bi pêl diherikin*

*Efrîngirad e?*
*Na.. bira na*
*Êş girantir e…*
*Birîn kûrtir e…*
*Pîlan mezintir e…*
*Û wijdanê cîhanê*
*Di nav şeqên qehpikan de*
*Bûye bîneke genî*
*Dibêjin Vêtnamistan e*
*Lê herdu serdem li hev nabanin*
*Tarîperestên serdemê*
*Wek komên kelmêşan*
*Ji sergûyê dîrokê derdibin*
*Û Efrîna jînistan*
*Talan…*
*Wêran û dagîr dikin*
*Û zimanê cîhanê*
*Bûye dêrxûna bêdengiyê*
*Li vir pakrewan…*
*Tavên êşan…*
*Sîmfoniyên lorandinê…*
*Mirina ne rewa…*
*Sanciyên derd û kulan…*
*Û vedengên xatirxwestinê*

*Lê hîn jî berxwedan jiyan e*

*Li vê jînistanê*
*Neviyên Mad…*
*Lawên Kurdoxiyan…*
*Ronahîperest in*
*Li ser gora welatê xwe*
*Qet nizanin rondikan bibarînin*
*Ne jî dizanin*
*Nimêja radestkirinê bikin*
*Belêêê… belê*
*Vir jînistan û Evînistan e…*
*Belê Efrîn berxwedanistan e…*

Dema ku Tolêstîn gihîşte nexweşxanya Avrînê, dît ku gelek birîndarên sivîl ji aliyê bijîşk û nojdaran ve tên dermankirin. Wê bi lez xwe amade kir û alîkariya wan kir. Piştî ku wan karê xwe bi dawî kirin, Tolêstîn çû oda kargêriyê û ji berpirsyarê nexweşxanê re got:

- Ez karê nojdariyê li nexweşxanê berdidim û diçim tev refê şervanan dibim. Hêvîdar im, ku hûn daxweza min bipejirînin.

Berpirsiyarê nexweşxanê ji Tolêstînê re got:

- Nojdara hêja û çalak! Ji bo çi te ev biryar standiye? Ma

hîn ji kuştina wan çete û tarîperestina tu têr nebûyî?!
Tolêstînê li gustîlka ku di tiliya wê ya nîşanê de bû mêze kir û got:
- Eger terorîst di nava axa Çiyayê Kurmênc de bimînin, hîngê mirin ji jînê çêtir e. Yanê çîroka min ne tenê tolêstandin e, lêbelê çîroka hebûn û nebûnê ye. Her çend rojan karwanê pakrewan ji vê nexweşxanê derdikeve û dilê dayîkan dibe wargehê êş û keseran.
Hîn Tolêstînê gotina xwe bi dawî nekiribû, Dr. Azad derbasî odeya kargêriyê bû, silav da û ji Tolêsînê re got:
- Hêvîdar im, ku tu ji biryara xwe ya çûn şer vegerîbî. Karê li nexweşxanê ew jî berxwedan e. Ya din îro li danê êvarê ez, tu û nojdareke din emê biçin birîndarên li gundan derman bikin.
Dema ku Dr. Azad wisa got, Tolêstîn dudilî bû û ji wî re got: Ma birîndarên wan terorîst û tarîperestina jî hîn hene?
**Dr. Azad:** Na; em tenê birîndarên sivîl û şervanên ku li gundan derman dikin.
Tolêstînê ji Dr. Azad û berpirsiyarê nexweşxanê re got: Ez hêvîdar im, ku hûn daxweza min bipejirînin û nema ez karê nojdariyê dikim û…
Nojdarek kete hindurê odeya kargêriyê û ji Dr. Azad re got: Dr. Azad! Balefireke dewleta Tirl li nêzîkî gundê

Berbenê tirumbêleke sivîlan bombebaran kirine û komek birîndar gihîştin nexweşxanê û pakrewan jî di nav wan de hene. Hîngê bîst û yek birndar gihştibûn nexweşxanê û piraniya wan zarok û jin bûn.
Dema ku bijîşk û nojdaran ew birîndarina derman dikirin, jinek ku du zarokên wê jî di nav wan birîdarina de bûn digrî û digot:
- Dijmin dijmine û ew ji malzaroktiya bêwijdaniyê jidayîk bûne, lê ez nizanim çima Kurdên me em xistin nav agirê ev şerê bê pîvan? Ma keça min Elende û kurê min Baranê biçûk çi kiribûn, ta ku îro xwîna wan li jêrî gundê Berbenê herikî û bavê wan jî li pêş çavên wan bi bombebara balefirên kînê şehîd bû? Li wê rojê nexweşxaneya Avrînê bûbû cihê girî û hawaran. Giriyê dayîkan û hawara zarokan dibû sîmfonya bêgunehiyê, wê sînorên ezmên derbas dikir û li paytexta Xwedê dibû vedenga lomê.
Piştî ku bijîşk û nojdaran ew birîndarina derman kirin, Tolêstîn çû mala Diya Rojdêr û mervên diya Rojdêr jî li wir bûn. Piştî ku Tolêstînê silav da wan û rûnişt, apê Rojdêr Dêrsim gotina xwe berdewam kir û got:
- Roj bi roj dewleta Tirk a dagîrker hewil dide ku bajarê Efrînê dorpêç bike û piraniya gundan ji xelkê hatine valakirin. Birastî rewş ne baş e.

Birayê Dêrsim yê mezin Şehîn mirûzê xwe tirş kir û got:

- Divê em van gotinina ji xelkê re nebêjin û morala xelkê xwe lawaz nekin. Ta dawiyê emê li ber xwe bidin û dijmin bişkînin.

**Dêrsim:** Bira! Min negot ku emê li ber xwe nedin, lê divê rastiyê û wek heye em ji xelkê xwe re bibêjin. Çiyayê Kurmênc bûye qurbaniya hin bazaran, lê dawî çi ye tenê yên ku ew bazarina kirine dizanin. Vêca ez tênagihêm ku çawa çênabe em gotina rast û wek heye bibêjin? Ma hûn nabînin ku piraniya gundên Çiyayê Kurmênc ji xelkê hatine valakirin û ew gundina niha di bin dstên leşkerên dewleta Tirk û çeteyên wê de ne? De ka bibêje, vêca gotina rast çi ye?

**Şehîn:** Bira! Eger bajarê Efrînê bi tenê jî bimîne û bi mehan jî dorpêç bikin, emê bi ser kevin. Em ji vî şerî venakşin.

**Dêrsim:** Bira! Ya rast ew e ku em bi navê berxwedanê bajarê Efrînê jî dûzî erdê nekin. Yanê bila komkujyên mezin çênebin.

**Şehîn:** Hahooo… haho!! Keko çima tu dixwezî gotinên bê sûde bikî? Serkeftin para me ye.

Dema ku Şehîn tengijî, Diya Rojdêr ji wî re got: Şehîno! Siyaset ne sergermbûn û gotin in. Hemû cîhan bêdeng e, ango bi wê bêdengiyê piştgiriya dewleta Tirk dike. Ya

din bi tivingan şerê balefiran nabe. Ya rast ew e, ku bi karê diblomasî Efrîn hatiba parastin. Eger dewleta Tirk derbasî Bajêr bibe, serûberê bajêr wê ji aliyê wan çeteyan ve were talankirin. Rojane bajarê Efrînê tê topbarankirin û sivîl şehîd dibin û ji aliyê asayêşan de jî hemû rê li pêş xelkê hatine girtin…!!! Birastî ez tênagihêm çima û çi ji xelkê ku di bajarê Efrînê de ye tê xwestin?

**Tolêstîn:** Belê Diya Rojdêr rast dibêje. Tiştekî din jî heye, partî û martiyên ku niha li Efrînê hene tenê li berjewendiyên xwe yên partîtiyê digerin. Xwedê neke ger Efrîn bikev, ewê gel li pey xwe bihêlin û her hin wê bi derekê de birevin. Bi Xwedê riya revê nadin kesekî.

Dema ku Tolêstînê wisa got, Şehîn rabû ser xwe û bê ku xatirê xwe ji wan bixweze ji malê derket û çû.

**Dêrsim** got: Bi mejiyê Şehîno û yên wek wî em bi ser nakevin. Tenê dibêjin a me rast e û kesî din jî li pêş xwe nabînin. Ma çend navên nezanebûnê hene?!

Diya Rojdêr rabû ku xwerinê ji Tolêstîn û birayê xwe Dêrsim re dîne, di wê pênê de balefireke kîndar bajarê Efrînê bombebaran kir û hemû camên derî û pencereyên mala wan şikestin û herweha yên piraniya malên ku li hawîrdora mala wan bûn jî şikestin. Di hindurê malan de giriyê zarok û hawara dayîkan zêde dibû û dûmaneke reş bajarê Efrînê dinixumand.

Di wê pênê de deriyê mala Diya Rojdêr hate lêdan û Tolêstînê bi lez derî vekir. Du-sê jin û bi zaroên xwe ve li pêş deriyê malê bûn û tirsê dêmên wan zer kiribûn. Bi vekirina derî re hemû derbasî hindur bûn û tavilê diya Rojdêr ji wan re got:

- Hûn ji kû tên? Şalê tişt bi serê we nehatibe? Çima zarokên we dilerizin? Zêneb, Fîdan, Gulê bibêjin hûn ji kû tên?

Gulê kesreke kûûûr kişand û Zênebê rondikên xwe bi desmala li serê xwe paqij kirin û Fîdanê got:

- Diya Rojdêr! Li bajarokê Cindirêsê malên me hatin hilweşandin û em ji topbarana balefirên dewleta Tirk çûn gundê Kefersefrê. Piştî çend rojan gundê Kefersefrê jî mîna bajarokê Cindirêsê kirin û em ji wir hatin bajarê Efrînê. Şeş roj û şevan em û zarokên me li taxa Eşrefiyê di bin çadireke kevnar de bûn. Îro ji danê sibehê de xelk bi hezaran li ser rêbenda gundê Turindê ne ku derkevin û ber bi gundên Şêrewa biçin, lê Asayîş nahêlin û rê li pêş wan girtine. Em jî di nav wî xelkî de bûn. Berî demjimêrekê balefirekê li nêzikî wê rêbendê xist û em nizanin ku çend kes mirin. Lê dîsa jî asayîşê nehîştin ku xelk ji bajêr derkeve. Ma em bi kû de biçin?

Diya Rojdêr rabû xwerin ji wan re made kir, lê tenê zarokan xwerin, ji ber ku Diya Rojdêr kir û nekir ku

Zêneb, Fîdan û Gulê jî bixwin, lê wan gotin: Xwerin di ber me de nare.
Diya Rojdêr ji wan pirsî: Ma mêrên we kanîn? Li kû ne? Çima ne bi we re ne?
Fîdanê kesereke kûr kişand û rondikan mijangên wê şil kirin û got: Berî sê mehan asayîşê bi şev hatin ew ji mal birin. Lê çima û ji bo çi em nizanin û ta niha jî em nizanin ku ew li kû ye.
Dema ku Fîdan dipeyivî û çîroka hevjînê xwe digot, rondik di ser dêmên Zênebê re rêz dibûn û lêvên wê şor dikirin. Ji ber ku hevjînê wê jî li bajarokê Cindirêsê bi bombebarana balefirên dewleta Tirk şehîd bûbû û termê wî di bin avahiyeke ji çar qatan de mabû.
Dema ku Zênebê û berî wê jî Fîdanê çîrokên xwe hewal didan, agirê ku di dilê Gulê de, dihîşt ku rondikên wê mîna dilopên ji memikên kevirî yên şikefta Çêlxanê ji hev nediqetîn û di ser dêmên wê re bê destûr dadirivîn û fîstanê wê yê reş hêdî hêdî av didan. Ji ber ku hevjînê wê jî ji salekê de ji aliyê rêjîma Sûrî ve hatibû girtin û ta wê rojê jî salxên wî ne diyar bûn.
Belê; li roja çardehê Avdarê beşek ji tirajîdiya xelkê Efrînê li mala Diya Rojdêr bi teşiya xemgînî û şînê dihate ristin. Herweha di piraniya mal, kolan û li ser rêbendê gundê Turindê jî tirajîdiyên curbecur di hev de vedidan.

Li rêbendê gundê Turindê û di bin topbaran û bombebarnê de, xelkê Efrînê hewil didan ku zarokên xwe ji mirinê birevînin û ber bi cihine ku mirin lê kêmtir e biçin. Lê Asayîşê nedihîştin. Vêca çima nedihîştin ew bi xwe jî cihê gumana xelkê bû.

Li wê rêbendê û di wê rewşê de Hemoyê Zaydê ji Asayîşekî re got:

- Ma ne bes e ji we re?! Ew berpirsiyarên we yên veşartî ku van biryarên riswabûna xelkê Efrînê didin kî ne? Ma hûn çi ji vî xelkî dixwezin? Eger we Efrîn û xelkê wê firotiye ji me re bibêjin.

Dema ku Hemoyê Zaydê wisa got, sê-çar asayîşan turimbêla wî bi keviran xişxişî kirin, serê wî jî şikandin û hemû sixêfên pîs ji wî xelkî re gotin. Hîngê bi hezaran xelk li ber rêbendê gundê Turindê bûn û tev gihîştibûn baweriyê ku bazareke mezin li ser wan hatiye kirin. Tiştê seyrtir hemû kesên ku xwe wek berpirsiyarên Çiyayê Kurmênc didîtin tev bêdeng bûn û tenê dûredûr li wî xelkî temaşe dikirin û piraniya wan jî di riyine taybet re bi tirumbêlên xwe ji Efrînê direvîn.

Di nav wî xelkî de Bêrîvna Şêxo ya şêstsalî dengê xwe bilind kir û got:

- Ma gelo hîn hiş nehatiye serê we?! Ta ji destê xelkê Efrînê hat wan piştgiriya keç û xortên xwe yên ku li

eniyên şer bûn kirin. Bi hezaran jî şehîd û birîndar bûn. Îro jî li ber vî rêbendî çend asyîşên xwe hîştine ji bo vî xelkî zêdetir riswa bikin. Hîngê xelkê xwe ajotin rêbendê û ber bi çiyayê Lêlûn der bûn.

Erê… dîsa Avdarê wek pir caran parek ji rika xwe di ser serê Kurdan de rijand û hîşt ku xwînbigrîn. Efrîniyan gund, bajar û malên xwe li pey xwe hîştin, zarokên xwe hemêz kirin û ji kuştinê direvandin. Li aliyekî dûmana reş û sipî û kulxana ji hilweşandina avahiyên bajarê Efrînê ber bi ezmên hildikşî. Ji aliyekî din ve hinan rê li wan digrtin û li kolanên herifandî vedigerandin û ji aliyekî din ve jî balefirên kujer li nêçîra wan digerîn.

Riya Çiyayê Xewnan ji wan re dibû mîna xewna rizgarkirina ji destên mîrê mirinê. Çavên Efrîniyan li çiyayê Lêlûn bûn, lê bi rojan nêrînên bêzar di çavên wan de radiketin. Roj û şev dibûn yek û hilma xwînê bajarê Efrîna rengîn gêj kiribû.

Avdarê riwê xwe yê reş ji Efrînê re eşkere kiribû… Wê hevalbendiyeke bêbext û dilbikîn ligel tarîperestiyê gêrêdabû û rojên berî Newrozê bereniya şîn û bêzariyê girêdabûn.

Riya Çiyayê Xewnan bûbû wek rêçika mêriyan û Efrînî tenê bi aliyê gundên Şêrewan de der dibûn. Di wê riyê de dîmenên mirinê, girî, hawar û axînan kevirên şîn jî bi girî

dikirin. Kulîlkan rengê xwe veşartibûn û firkên riya Çiyayê Xewnan hêviyên Efrîniyan difirikandin û bi riyine ne diyar de têve didan.

Di hemêza hin dayîkan de şîrmij ji tîbûn û birçîbûnê çav di serê wan de beq bûbûn û geweriya wan ziwa bûbû. Hin dayîkan termê zarokê xwe berhemêz kiribûn û bi zimanê êş, derd û kulan dilorandin û hinan jî rondik di ser dêmên zarokên xwe de dibarandin.

Di wê riyê de kalemêr û pîrejinan nêrînên xwe yên ku ji bêzarî û êşan giran bûbûn, berve Bajarê Efrînê rêdikirin û hiş ji serê wan radigerî… Hinan bi nêrînên xwe yên kelogirî darên zeytûnê dişuştin, lê xatirê xwe jê nedixwestin.

Kalemêrekî kurê xwe yê sî û sêsalî ku li ser wê riyê miribû. Termê wî xistibû nav betaniyeke kevnar, li ber serê wî rûniştibû û digot:

- Ehmedoooo kurê min! Rabe çar zarok li pey te sêwî man. Ehmedo rabe.

Diya Ehmed dilorand û digot:

- Ehmedooo! Rabe rondikên keça xwe Dilovanê paqij bike Ehmedooo ez bi qurbanooo Ehmedooo! Çima te diya xwe ya pîr li pey xwe hîşt û tu çû. Piştî te ezê ji kê re bibêjim Ehmedo?

Birayê Ehmed digot:

- Birayooo lo Ehmedooo! Bê xem be ne zarokên te û ne jî Efrîna birîndar em sêwî nahêlin… Belê Ehmedooo! Ezê te vegerînim gundê me yê ku di koka girê Bajarokê Bilbilê de ye û termê te li bin dara zeytûnê ya ku bapîrê me bi destên xwe çandibû binax bikin.
Xwîşka Ehemed dilorand û digot:
- Birayooo looo Ehemedooo! Emê vegerin bajarê Efrînê yê birîndar û careke din wî bikin jînistan û ezê keça te ya biçûk Efrînê di hemêza xwe de mezin bikim. Belê biyayooo emê te li tenişt hevjîna te Gulîzarê binax bikin.
Li tenişt firka jorîn a riya Çiyayê Xewnan Tolêstînê û çend hevalên wê yên nojdar kozikek ji kevirên çiyayê Lêlûn çêkiribûn û kesên ku li riya Çiyayê Xewnan birîn dibûn, tê de derman dikirin.
Piştî ku derman li ba wan nema, Tolêstînê pişta xwe da zinarekî, nêrînên xwe di deşta Cûmê de meyandin û got: Waaax li min! Hin mirin û nema birînên heval, dost, merv û zarokên xwe dibînin… A niha em tev birîndar in. Hin mirin û gelek birîn bi xwe re birin gora reş û tarî… Hin mirin û gelek birîn li pey xwe hîştin… Hin bi birînên xwe û hin jî bi yên welêt koça dawî kirin… Hin birîn derman dibin û hin jî ta dawiya temen bê derman dimînin… Hin ji bo welêt, hin ji bo azadiyê û hin jî ji bo mirovatiyê dilbirîn in… Hin birîndar in û mirin giyanê

wan dipelîne, lê çi bikim derman nîne… Îro em tev birîndar in.

Waaax li min ez çi bikim!? Ezê çi tomar bikim û çi tomar nekim!? Ezê kîjan birînê derman bikim û kîjanê derman nekim!? Yên ku ji gundên xwe derketine ew jî birîndar in… Yên ku bîranînên xwe li pey xwe hîştine û berve dem û cihine ne diyar diçin, ew jî birîndar in… Yên ku bi zimanê bêdengiyê di ser êşên xwe de dilorînin û yên ku zarokên xwe ji kuştin û mirinê direvînin ew jî birîndar in… Yên ku parek ji nêrînên xwe li nav darên zeytûnê dihêlin û keseran dikşînin ew jî birîndar in… Birîn, birîn û birîn… Efrîn tev bûye birîn.

Tolêstînê nêrînên xwe bi hêdî ji deşta Cûmê berve bajarê Efrînê rêkirin, kesereke Kûûûr kişand û berda û got:

- Niha birîna mezin û kûr Efrîn e û dermanê wê tenê rizgarkirin e. Belê; EFRÎN destane û birîn e.

Li ber dîwar, sênc û tenişt riyên çiyayê Lêlûn roj û şevên Efrîniyan bi êşan dihatin pêçandin. Li danê sibehê berî ku pertavên royê bi bêzarî eniya çiyayên Kurmênc ramûsin, nêrînên xelkê Efrîna birîndar ji dûr de li seranserî deşt,newal, gelî û darên zeytûnê yên ku li pey xwediyên xwe hawar dikirn, dihatin belavkirin û çavê Efrîniyan tijî rondikên sar û germ dibûn.

Li ser zimanê zarok, dayîk, pîrejin û kalemêran pirsên tûj

û tengijî li hev siwar bûbûn. Lê bersiv di berîkên êş, derd û dilbirîniyê de li zimanan digerîn. Şev û roj mîna hev bûbûn û bayê Avdarê ji kovanên Efrîniyan giran giran di nav wan de diçêwirand. Di wan rojê û demên mirûztal de xwedîlêderketin li ser darbesteke ker û lal mirî bû.
Li ser sînorê bajarokê Niblê sinc hatibû nişkekuştin û mirov dihatin bazarkirin. Her seriyek bi sed hezarî û her du zarok bi seriyekî. Hîngê mirovatiya cîhanê di bin lingên zarokên Efrînê de dihate pelçiqandin. Belê; li ser wan sînorina û di bin tariya şevê de, bi hezaran çîrokên bêbextî û diziyê dihatin hûnandin. Li bazara wan sînorina hin Efrînî berîrût û bê hêvî derbasî bajarokê Nibilê (kişwera dizan) dibûn û di mizgeftên bêbextî û bêwijdaniyê de xwe dikumişandin hev.
Bazarên ku li ser wan sînorina çêdibûn û xelkê Efrînê hemû talî û tirşî didîtin, têgeha "welêt û welatparêziya Sûrî" bi du dolarên Emerîkî dihate firotan. Lê hin serok û merokên partiyên kurdî û li nêzîkî wan bazarina çavnexel bûn û li hêviya çend rojan bûn ku "welatparêziya xwe ya Sûrî" ji dernexûn û dizperestan re nîşan bidin…!!!?
Erêêê… erê; li wan çolan û li (kişwera dizan) birçîbûn, derd, bêzarî û êşan roj û şevên Efrîniyan dicûtin û jiyana wan di navkelên demê de kulek dibû.
Li Çiyayê Lêlûn û li ber her zinarekî bi dehan çîrokên

êşdar dihatin ristin. Li şevên sar mitêla zarok, pîrejin û kalemaran ezman bû. Doşeka wan erd û balgiyê wan kevir bûn. Zikê wan ji çîrokên birçîbûnê têr dibûn û ji bilî xelkê Şêrewa kesek li wan xwedî dernediket. Belê bobelata serdemê bû…
Li navbera gundê Bircik û Beradê û li ber şikêreke[1] ji keviran qîreqîra jinekê zinar û kevirên çiyayê Lêlûn dêşandin û dengê qêrîniyên wê digihîştin paytexta ezmên.

Belê li ber wê şikêrê û li wê çolê sanciyên Kurdê keça Heso li ser hev pêl didan. Bi sanciya dawiyê re û bi alîkariya pîrejinekê zarokekî Kurdê bû û dengê bi gewriya wî ket. Lê mixabin çav di serê Kurdê de zelal bûn û xirtîniya dawiyê bi gewriya wê ket û çû ber dilovaniya Xwedê. Hîngê diya Kurdê bi dengekî bilind bang kir û got:
- Ew Kurdên ku dibêjin em rûmeta we diparêzin, ew li kû ne? Îro li ber şikêran û li çolan zarokên me jidayîk dibin û sêwî dimînin û wê dilorand û digot:
Çima wisa bi serê me kirin
Ji bo çi em bi van çolan de der kirin
Nenî Kurda min nenî
Nenî cîgera min nenî

*1- Şikêr: Qûç. Komeke ji keviran.*

Bila ez miribama
Û min Kurda xwe ya çavreş
Di vê rewşê de nedîtiba
Nenî Kurda min nenî
Nenî dêmgula min nenî

Di ber lorandina diya Kurdê re jineke sî û çarsalî bi tijî dengê xwe digot:

- Ma qey cîhan me wek mirov nabîne?! Ma gelo saziyên mafê mirovan di xewa korbûnê de sermest ketine?!

Kalemêrekî jî pişta xwe dabû zinarekî, rondik ji çavên wî diherikîn û wî digot:

- Waaaax û sed carî heyf… Îro jinên me li çolan zarokên wan dibin!!! Xwezî ez îro miribama û min ev riswabûna nedîtiba. Kanî cîhan? Kanî mirovatî? Kanî rûmeta cîhana pêşketî?

Dema ku diya Kurdê dilorand, hîngê gelek turimbêl di nêzîkê wê û jinên ku li hawîrdora termê Kurdê bûn re derbas dibûn û ber bi gundên Bircikê, Kilotê, Kibêşînê, Gundê Mezin û bajarokê Niblê û Elzehra ve diçûn. Di nav wan turimbêla de turimbêla berpirsiyarê partiyeke Kurdî jî ku çend hevalên wî jî tê de bûn, di wir re derbas dibû. Lê turimbêla wî ji hemû turêmbêlan bi leztir bû. Ji ber ku sozê wan hebû ku xwe bigihînin bajarokê Niblê û her yek ji wan bi çarsed hezar Lîra Sûrî xwe di bogacên

teksiyan de veşêrin û derbasî bajarê Helebê bibin.
Dema ku wî kalemêrî turimbêla wî pepirsiyarî dît, rabû ser xwe û ji wî xelkî re got:
- Ta berî çend rojan xwediyê vê turimbêlê derew li xelkê dikirin û digot:
- Ez fedekarê Efrînê û doza gelê Kurd im. Ma hûn dibînin ku çawa bi lez ber bi bajarokê Niblê de diçe û berçavkên reş dane ber çavên xwe ji bo kes wî nas neke?!
Xelkê li wan çolan li hawîrdora termê Kurdê kom bûn û kalemêrekî ji diya Kurdê re got:
- Keça min! Kurd keça me hemiyan e. Hîn em nizanin ku çi li pêş me heye û çi wê bi serê me were?
Diya Kurdê ji wî kalemêrî re got:
- Tu wek bavê min î. Tu çi bibêjî ezê bi ya te bikim.
Hinan ji wî xeklî gotin emê termê Kurdê bibin li goristana gundê Bircikê binax bikin û hinan gotin çêtir e ku em bibin li goristana gundê Beradê binax bikin. Hîngê diya kurdê ji wî kalemêrî re got:
- Ezê keça xwe li ber vê şikêrê binax bikim û li ser kêlika gora wê binivîsim: (***Pakrewana roja bobelata Efrînê***). Ya din, bila dengê min bigihîne hemû cîhanê nemaze Kurdên ku nav li xwe kirine serkirde, ez navê kurê Kurdê dikim ÇOLO.
Hîn xelk li ser gora Kurdê bûn, li ser riya gundê Bircikê û

gundê Meyasê dengê girî dibû vedengeke pir bi êş û dengê lorandina keçekê pir bi şewat dihat û wê digot:

Bavo ez bi heyranooo…!
Bavo ez bi qurbanooo…!
Çima te xwetirê xwe ji me xwest
Li van çolan
Li gelî û newalên çiyayê Lêlûn
Te em sêwî hîştin bavooo…!

Hinan ji wî xelkî berê xwe dan cihê wî girî û wê lorandinê. Li wir mirovekî sî û çar jiyana xwe ji dest dabû. Çar zarokên wî hebûn û keça wî ya mezin çardehsalî bû. Hevjîna wî jî berî bîst rojan li bajarê Efrînê, li taxa Mehmûdiyê û di encama topbarana balefireke dewleta Tirk de jiyana xwe jidest dabû.

Jinekê ji keça wî mirovî ya çardehsalî Xemlînê pirsî: Keça min! Ji dêpîra xwe re bibêje, çi bi serê bavê te hat, ta wî jiyana xwe ji dest da?

Xemlîna porzer û çavkesk di ber girî re ji wê pîrejinê re got:

- Îro du roj û du şev in em li ber van zinarina bê xwerin in. Bavê min bê pere ji bajarê Efrînê derketibû û em hatin bi van çolan ve derketin. Ji danê sibehê de bavê min digriya û tenê digot: Efrîn. Belê; bavê min ji nişkê ve ket

û mir.

Dema ku xelkê li wê çolê li ser termê bavê Xemlînê kom bûn û piraniya wan digrîn, hîngê ji nişkê ve xwîşka Xemlînê ya biçûk Perwîn hiş ji serê wê çû û li erdê dirêj bû.

Erê serûberê herêma Şêrewa bûbû şanogeha hemû cureyên tirajîdiyayê. Serma, birçîbûn, nexweşî, jidayîkbûna zarokan li ber zinar û şêkêran, bazara mirovan û mirin.

Şeva bîst û nehê Avdarê şeveke pir sar bû… Şeveke bi hêrs û mirûztûj bû. Li wê şevê, li şopewarê Kokebê yê ku di navbera gundê Soxaneka Îzoliyan û Zene`rîtê dikeve, penaberên Çiyayê Kurmênc kozik ji keviran çêkiribûn, şaxên darên merxê di ser re rêxistibûn û bê cirêx[1] tê de rûniştibûn. Di wan kozikina de zarok bê nivîn razabûn.

Li wî şopewarî, li nîvê şevê jineke ku diya du zarokan bû, wê bi sîngê xwe girt û li ser hev digot: Aaax sîngê min... Bira ez mirim. Belê kirîza dil bi wê re çêbûbû.

Ji ber ku hîngê hatibû qedexekirin ku turimbêlên xelkê Çiyayê Kurmênc derbasî bajarokê Niblê (kişwera dizan) nebin, Hevjînê wê jinê û birayê wê yê mezin ew li kerekî siwar kirin û di bin tariya şevê de berê xwe dane bajarokê Niblê yê ku (6 k.m) li dûrî şopewarê Kokebê dikev.

*1- Cirêx: Tiştên ku di malan de rêdixin. Mîna cil, kulav H.W.D.*

Berî ku ew bigihînin rêbendê ku li bakurê bajarokê Niblê bû, leşkeran hin qurşîn di ser wan re avêtin. Birayê wê jinê ji wan re got:

- Em xelkê Çiyayê Kurmênc in û nexweşek bi me re ye.

Li wê şevê berpirsiyarê wî rêbendî sed hezar Lîrayê Sûrî ji wan xwest ta ku wan derbasî bajarokê Niblê bikin. Hevjînê wê jinê û birayê wê li çavên hev mêze kirin û bêdeng man. Ji ber ku ewqas pere bi wan re tune bûn.

Hevjînê wê jinê pir li ber wan gerî ku bihêlin derbas bibin, lê bê çare bû. Berpirsiyarê rêbendê ji birayê wê jinê re got:

- Baş e; ger ewqas pere bi we re nînin, tekek bazin di destê xwîşka te de ye. Bi wî bazinî hûn dikarin derbas bibin.

Ji neçarî hevjînê wê jinê tekê bêzin ji destê hevjîna xwe derxist û da wî bêwijdanî ta ku derbasî (kişwera dizan) bin.

Li wê şeva ku rêbendên bajarokê Niblê bazanên zêrî ji destê jinên Efrînê yên nexweş dibirin ji bo biçin nexweşxanê. Hîngê bi dehan endamên partiyên Kurdî û hin rêvebirên wan partîna û herweha dewlemendên Çiyayê Kurmênc li bajarokên Niblê û Elzehra malêne xweşik û rêxistî bi pereyên pir bi kirê biribûn û bê xem wan û zarokên wan di nav nivînan de xwe dirêj kiribûn.

Avdarê têra xwe giyanê Efrîiyan cût û li gelî, newal û li nav zinarên çiyayê Lêlûn ji memikên êşan, bêzarî û bazarên bêwijdaniyê mêjandin. Ji aliyekî din ve, Avdarê pir kesên ku xwe wek rêvebirên gel didîtin, ji kirasên sexte û derewîn rût kirin.

Li bajarokê Niblê (K.D) û li pêş mizgefteke xapînokiyê sê kesên Tat bi tirumbêlekê hin nanê sar û şûşeyên avê li penaberên Efrînê belav dikirin. Hîngê zarokeke Efrînî ya heftsalî destê xwe gîhande cama wê turimbêlê. Tatê ku di tirumbêlê de bû, daket sîlak li wê zarokê da û jê re got:

- Xuya ye tu keçeke bê sincî. Eger tu careke din destê xwe bigihînî cama tirumbêla me, ezê destên te bişkînim.

Dema ku wî Tatî wisa got, jineke Efrînî ku li wir bû û navê wê Fato bû bi dengekî bilind û stûr ji penaberên ku li wir bûn re got:

- Efrîniyino…! EFRÎN birîndar e û birîn kûûûr kûr e, lê vegera me li hêlûna şaristaniyê û landika dêpîr û bapîran berxwedan û rûmet bi xwe ye. Îro Tatên Niblê sîlan li zarokên me didin, lê siba tiştine jê pîstir jî wê bi serê me bikin.

Piştî ku Fato wisa got, jinên ku nanê wan biribûn, wan ji nû ve li wan Tatan vegerandin û Fato ji wan Tatan re bi zimanekî `erebî ne zelal got:

- *Xêrkom we xubizkon Yakol raskom*. Yanê; xêra we û

nanê we serê we bixwe.

Bi gotina Fato re hersê Tat li tirumbêla xwe siwar bûn û bi mirûzekî mîna yê etarên kîlê ji pêş wê mizgeftê çûn.

Li dema êvarê û di hindurê wê mizgeftê de bi dehan malbatên Efrînî bi cî bûbû. Tolêstîn û Diya Rojdêr ligel herdu keçên wê, ew jî di nav penaberên di wê mizgeftê de bûn. Xortek rabû li ser xwe sekinî û ji wan penaberina re got:

- Ji danê piştî nîvro ve xaltîka Fato ji we re dibêje: Divê em û hemû penaberên Efrînê vegerin Çiyayê Kurmênc. Ma gelo xaltîka Fato ji ber gotinên xwe de berpirsiyar e?! Yanê tu hewil didî ku xelkê me bişînî nav dagîrkeran û dagirkirina wan li Efrînê rewa bike? Em nahêlin ku xelkê me vegere ta em Çiyayê Kurmênc ji wan çetena û dewleta Tirk rizgar bikin. Di vê demê de veger îxanet e.

Dema ku wî xortî wisa got, Fato rabû ser xwe û got:

- Vegera xelkê li Çiyayê Kurmênc li mal û milkê xwe dêmek îxanet e?! Ma ne bes e ji we re?! Hûn çi ji vî miletî dixwezin û hûnê berê vî miletî bidin kû? Dêmek riswabûna me di mizgeftên Niblê de li heza we hatiye?! Êdî bes e em têr gotin bûn bes e.

Ew xortê peyvfiroş li Fato vegerand û got:

- Beş e; ku hûn naxwezin di mizgeftên bajarokê Niblê de bijîn. Siba emê we bibin penageha berxwedanê. Belê li

Fêfînê me penagehek ava kiriye.
Fato ji wî re got: Zimanê xwe bigre. Penageha "Fêfînistanê" li we pîroz be. Berdêl ji jînistanê re nîne… Tenê Çiyayê Kurmênc ji bo me jînistan e. Ma tu têgihîşt?!
Wî xortî bi zimanekî tirş û tûj got: Na ez tênegihîştim û serê xwe hejand.
Fato bi tijî dengê xwe jê re got:
- Tu li cem kalkê min ê ku ji deh salan de miriye têbigihî. Vêca berê xelkê didin penagehan û dibêjin penageh berxwedan e!!?
Dema ku Fato û wî xortî ew gotin û dengkirin dikirin, Tolêstînê û diya Rojdêr û hemû penaberên ku di wê mizgeftê de bûn, baş guhdariya wan dikirin û di serê her yekî ji wan de pêlên pirs û bersivan rast û çep vedidan. Hîngê Diya rojdêr rabû û ji wî xelkî re got:
- Ji Bihna axa Çiyayê Kurmênc in em. Giyanê me ji pêdariya zinarên Çiyayê Kurmênc mêtiye… Çavên me ji xemla wê bihuştê fêrî nêrînan bûne… Rengê dêmên me ji yê wê axê hatiye wergirtin û dengê me ji xuşxuşa kanî, baran û çemên wê jîngeha pîroz fêrî awazên nazik bûye. Vêca li sertbûna me mepirsin. Xwîşka Fato rast dibêje. Divê em vegerin Efrîna xwe.
Piştî ku Diya Rojdêr wisa got, Tolêstînê jî got: Di berîkên

xaka Çiyayê Kurmênc de me nexşeyên biçûkaniya xwe ya têr û birçî veşartine, li ser pelên daran û di nav lêvên newalokên li hawîrdora gundên me yên ku ji ramûsanên rojê têr nabin, me wêneyên şivanên ku şîr bi çêja axê vedixwerin têr dîtine.
Hêviyên me di dilê wê axê de gol vedidin, rojên me yên berkenî ji hilma sibehên tazî tên keyandin û teşiya kenê dayîkên dilovan û hezkirina welêt digel hev tên hûnandin.
Piştî ku Tolêstînê gotina xwe bi dawî kir, Diya Rojdêr got:
- Carina em dixwezin xwe ji xwe vedizim, xwe xav bikim û mîna zarokekî biçûk demê bi gixikan derbas bikin, lê ev pirsa jêrîn: "Eger giyan ji govdeyê min revî, axa welêt dê razî bibe ku laşê termê me di hemêza xwe de veşêre?" Me ji wê xeyalê vedigerîne. Axa Çiyayê Kurmênc giyanekî rêxistî ye û her bosteke wê çîroka hebûnekê ye.  Carina em hejar dibin, carina zikê me jî loman dike, lê bayê Çiyayê Kurmênc çûkên ku bi kurdî distirên, sirûdên nîvazadiyeke teze û barana ku çîrokên tevizandina salan ji zeviyên hebûna me dişon, dibin vejandin û em li nav lêvên dîrokê de dibin çîkvedana hebûn û ronahiyê. Belê kî çi dibêje bila bibêje, lê divê em li axa xwe, mala xwe û li bayê Çiyayê Kurmênc vegerin. Penageh û Efrînî li hev netên. Efrînî tenê dikarin li Çiyayê Kurmênc bijîn.

Dema ku Diya Rojdêr wisa got, hemû penaberên ku di mizgeftê de bûn, wan serê xwe hejandin û bi dengekî hêdî gotin:

- Xwîşka hêja tu rast dibêjî. Belê wisa ye.

Xort rabû ser xwe û ji Diya Rojdêr re got: Biçin Efrînê û di bin alal dewleta Tirkiyê de, di bin ala dagîrkeran de bijîn.

Gotina wî xortî mîna birûskekê di serê Tolêstînê de jenand û tavilê bi dengekî tund ji wî re got: Bes e serê xelkê ji gotinên virde wêde dagrin. **Tu cudatî di navbera alên dagîrkeran de nînin…** Ma tu têgihîşt ku min çi got?!

Dema ku Tolêstînê wisa got, ew xort rabû ji mizgeftê derket.

Pîrejinekê serê Tolêstînê ramûsand û jê re got:

- Belê keça min! Tu ji pişta bavê xwe yî. Hemû alên dagîrkerên Kurdistanê ji bo me mîna hev in. Ma qey li vî bajarokî û Fêfînistanê ala Kurdistanê hatiye bilindkirin?!

Hîngê Tolêstînê destê wê pîrejinê maç kir û danî ser serê xwe.

Diya Rojdêr ji wî xelkê Efrînê yên ku di wê mizgeftê de bûn re got:

- Siba li danê sibehê emê vegerin Çiyayê Kurmênc. Emê kosteka rastiya xwe li bin darên zêtûnê bibirim û di nav

porê genimê bejî de xewnên xwe hene bikin... Belê; hîn bihna xuhdana dêpîran ji xaniyên qentirme tê, hîn bazingên sarincan hilekişên wan ji bîr nebûne… Hîn sêncên ji keviran wan rojên keraşiyan ji tomargeha bîranînên dêpîran ranekirine… Hîn pixareyên di malên axî de çîrokên dêpîr û bapîran li ezberkirî ne.

Weheweha çotkarên ku bi bîna axa Çiyayê Kurmênc mezin bûne, tu kes nikare di guhên zevî û baxên ku zarokan dikenînin de biçelmisînin.

Zinarên ku pişta leheng û welatperwerên dilsoz têr maç kirine û sonda wan li sîngê xwe nîgar kirine, di çavên wan de qurnefîl zîl didin û şîlava wan ji giyanê axa Çiyayê Kurmênc e.

Hîn nexşeyên ku pozê hevcarên darî li ser sîngê latên şîn wênekirine û ji dilopên xuha bapîran hatine avdan, me fêrî nestewirbûnê dikin. Çiyayê Kurmênc destpêka sirûda rastiyê, helbesta hevcêwîtiya rojê û naveroka romana jînê ye. Belê; siba li danê sibehê emê berê xwe bidin hêlûna hebûnê û çi dibe bila bibe.

Li sibeheke ji sibehên destpêka meha Avrêlê bi sedan tirumbêlên Efrîniyan ji herêma Elşehba, gundên deşta Robariyan, hin gundê Şêrewa û ji bajarokên Niblê û Elzehra berê xwe dan Çiyayê Kurmênc. Ta ew gihîştin rêbendê gundê Kîmarê, hemahema berîkên wan ji peran

vala bûn. Ji ber ku her rêbendekî li gor delxa dilê xwe pere ji wan dibirin û hinan jî tinaz bi wan dikirin. Yên ku tinaz dikirin û çavsor dibûn ne biyanî bûn, lêbelê ji kesên ku nedixwestin xelkê Çiyayê Kurmênc li mal û milkê xwe vegerin. Ji ber ku wan dixwestin Efrîniyan ber bi Fêfînistanê ve têve din.

Li ser rêbendê gundê Kîmarê neh rojan xelkê Efrînê diman û dewleta Tirk nedihîştin ku Efrînî vegerin gund û malên xwe. Li ber rêbendê gundê Kîmarê û li dirêjiya neh roj û deh şevan bi sedan çîrokên êşdar demên Efrîniyan dicûtin.

Karwanê tirumbêlên xelkê Efrînê yên ku dixwestin vegerin, ji gundê Kîmarê ta bi gundê Soxanekê û herwha ji gundê Soxanekê ta bi gundê Aqînê rawestî bû. Di wan neh roj û deh şevan de gelek zarok, pîrejin û kalemêrên Efrînî nexweş ketibûn û hin jî li wir mirin. Ne tenê wisa, lêbelê hin zarok jî li wê çolê û li ber zinarên ku li tenişt rê bûn ji dayîk bûn. Dayîkekê navê zaroka xwe ya ku li wê çolê bûbû kire (RETIL)[1].

Ma gelo eger RETIL mezin bibe û çîroka jidayîkbûna xwe zanibe, ji cîhana ku doza mafê mirovan dike re ewê çi bibêje.. Dê çi navî li wan bike? Bêwijdanên serdemê… Derewînên cîhanê... Yan jî rûreşên mirovatiyê?

*1- RETIL: Bêjeyeke bi `erebî ye. Yanê karwan.*

Pirsine giran li se zimanê Efrîniyan çîk didan. Dibe ku rojekê çemê demê raweste û deriyên xewna bêgunehan vebin…. Belkî erê û belkî jî na. Lê di navber "erê" û "na" de û çendî dem teres û dêmbadayî be, ronahî mîna xwe dimîne.

Bapîrên me rê û ba bûn û pirsên nalînan di nav lêvên axê de keriyê hawarên xwe berve deriyên ezmên rêdikirin. Lê hawarina ji pirsan dagirtî bûn.

Ji berê de siwarên bê û dostên baranê bûn, lê hin pirsên giran tozgirtî man. Rê bûn, lê şopên sor jî pir bûn. Ma gelo guhên ezmên jî dixetimin?!

Laboda[1] …! Ma ne win hevcêwî bûn? Berî ku win ji malzaroktiya wê dilovanê rizgar bibin û deriyek were girtin û heft vebibin. De ka bibêje çima te navika wî nebirî? Ma qey şîrê memikê te yê rastê tal û tûj bû?! Eger te bersiv li pey xwe hîştiba, îro pirs pir nedibûn û li bersivan nedigerîn. Lê belkî jî tu ne gunehkar bî. Belê; Laboda belkî!

Belkî pirs giran be û te nizanîbû ku hilma xwînê nabe xunav. Lê tê gotin ku şaşîtiya mezin a diya we bû. Belkî hîngê jî nêremejî hebû. Ji ber ku berîkên dîrokê bê derew namînin, lê pirs rewa ne.

Ma tu meraqdar bû ku çavên (Êklîma)[2] bibin kaniya

*1- Li gor jêderên olî (Laboda) keça Adem û hewa ye û hevcêwiya Qayîn e).*

*2- Li gor jêderên olî (Êklîma) keca Adem û hewa ye, û hevcêwiya Habîl) e.*

rondikên saregermiyê?! Ma gelo xwerina gênim bê qurbanî nedibû?! Ew jî belkî rast be û belkî jî çîrok be. Lê kê û çima ev çîroka peyda bû û hîn jî em nikarin mejiyê xwe ji nerastiyê rizgar bikin?

Giyanewer, niştecihên goristanan, kurmikên ku di bin pêyên hespê pêxemberan de hatibûn pelixandin û belkî (Amala)[1] ya pêrî jî tola xwe doz dikin. Eger şoreşa tolvedanê çîk bide, ma gelo kî û çi wê li dervî wê qadê bimîne?!

Belkî, rojek were û gerîndeya çerxan raweste, lê îro govdeyê gozemînê ji pirsên bê bersiv giraaan giran digere.

Habîl… giliyekî mezin di paşela (Nod)[2] de, li pey xwe hîştibû, lê hîn pênûsa dadweriyê pûç maye.

Ta kîngê deriyê dadê dê were kutan û xwîna "habîlan" wê di malzaroktiya axê de were rêtin? Ma gelo li ser kursiya pîroz jî razan heye?

Eger li wir razan nîne, ma gelo çima "Qayîn"[3] pir bûne?!

*1- Li gor hin çîrokên olî yên ku li ser bûyera kuştina Habîl bi destê birayê wî Qayîn hatibû kuştin, ku (Amala) pêrî bû, lê wê xwe weke keçeke xweşik kiribû û şerê Habîl û Qayîn li ser wê bû.*

*2- (Nod) li gor wan jêderan, ew navê cihê ku şerê Habîl û Qayîn lê hatiye kirin.*

*3- (Qayîn) di jêderên îsalamî de (Qabîl) e, lê di pirtûka pîroz Încîlê de (Qayîn) hatiye.*

Li roja heftê Avrêlê, li navbera gundê Kîmarê û Soxanekê Diya Rojdêr namak ji çîhanê re nivîsand û tê de weha got: (Me têr şivantiya kovan, birîn û êşan kir. Mehêlin dîrok hertim li me bizêvire… Bila tabloyên xwînî ji xwe û wê de herin û di bîra tariyê werbin.

Di gewriya geliyê Gênco de hîn vedenga keserê dinale û hîn di siha zinaran de çîrokên pêdariya gewremirovan zîldayî maye. Îro jî vedenga êş û nalînên me li eniya zinarên Şêrewan vedipekin û vedenga wê vepekandinê di guhên roj û şevên mirûztirş de diherikin.

Berîkên welatê me ji bîranînên zer û reş têr bûne. Mehêlin careke din qiralên hovîtiyê di dêmên zarokên me de zeviyên şahiyê bê ber bikin.

Qada Çarçiran hîn ji ken û girî venebûye û çemê paytexta xewna torînên Mîdiyan, hîn wesêkên lehengan di guhên Zagrosê rûmetdar de dilorîne.

Hîn werîsên rihdirêj û şaşikreşan[1] di stiwê xort û keçên me de tên şidandin. Li hember wê tirajîdiyê me wijdan û mirovatiya cîhanê di pişt siha tariyê de li gêjbûna xwe digerin?! Daristanên ku li ser doşeka çiyayên bêxew dêmên ezmên duxrînin, hîn bêzariyê dihûnin. Gelo emê çi demê wê teşiyê bişkînin?!

Birca Belek…. Dibistana Sor botaniyan bi sîngê demê

*1- Şaşikreş: Mileyên şî`iyan ên dewleta Îranê. Kofîreş.*

girt û serdemeke rast veçengandin û zêr bi navê Kurdistanê buha bû. Lê mîna pir caran nokeriyê mûm kire armanca vemirandinê û hîn jî kêlika Ezedîn Şêr nîşana wê dîrokê ye.

Êş û birînên me di hev de kul vedidin, dîrok ji xwe fedî dike û nîhadê cîhanê pir serdemên xwe xistin tûrikên gunehkariyeke ji ya kuştina kurê Meryemê[1] mezintir.

Belê, hîn bîna kuzûrê ji govdeyê roj û şevên deşta Raniyayê û Hîroşîma Kurdistanê nehatiye şuştin û sibehan giriyê dayîkan ji bîr nekirine. Îro jî vir Çiyayê Kurmênc e. Ma gelo çi me tê xwestn ta ku cîhana pêşketî Kurdan jî mirov bibîne?!

Dîbekê dîrokê ji qurbaniyên me westiya… Sed Diqliyanos û Nîron li me peyda bûn. Refê kuliyên xwe berve gulistana me têvedan û di bin navê "Elaho Ekber" talana neviyên Berhîmê Orfayî dikin.

Kesên ku dibêjin em oldar û xelîfetên Xwedê ne, belêkî wijdanê wan di sola gawiriyê de veketî be. Cîhana ku xwe hevalbenda mirovatî, azadî û aştiyê dibîne, ma gelo nîhadê wan li kîjan bazarê hatiye firotin?!

Pir caran em kirin çikçike û ji bo berjewendiyên xwe bi ser xefikan de têve dane. Ey cîhana pêşketî ma tu ji nêçîra me têr nebû?!

*1- Kurê Meyremê: Pêxember Îsa.*

Ey cîhana rûbadayî Kurdan çi nedîtin...!
Mirovên ku berve mirina xwe dibezîn… Yên ku bi êşên xwe kevirên sînoran hildikirin… Yên ku çeng di zikê xwe de daçikandibûn û berxwedêrên ku tovên jiyanê diçandin jî dîtin.
Ey cîhana rûbadayî Kurdan çi nedîtin...!
Dayîkên ku di nav hilweşandinê de li şîrmêjên xwe digerîn… Zarokên ku ji qurequra zikên birçî vediciniqîn… Meqesokên ku nalîna şaxan dinikilandin û bajarên ku ji lêmiştên xwînê hawar dikirin jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Rengên ku ji dîmenan direviyan… Hestiyên ku gora xwe diguhartin… Balindeyên ku riya hêlûnên xwe şaş kiribûn û kalemêrên ku ji nû ve porê wan reş dibû û li eniyên şerê rûmetê tivingên xwe dilîskandin jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Bîranînên ku di gewriya kolanan de raketî ne… Riyên ku ji gavên penaberan diqîrin… Termên ku bi êgir nedişewitîn… Tirsonekên ku ji hemêzên dilovan bazdidan û çavreşên ku tirs dixistin dilê zirtoneyên tundrew jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Govdeyên bê serî û xaçkirî… Kursiyên ji perasuyên perîşanan çêkirî… Pizdonekên ku bi windabûna xwe şa

dibûn û bejnên ku li qadên dîrokê bilind dibûn jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Devên ku ji bo pariyek nan ji bergeran xar dibûn… Serberjêrên ku diziya rûmeta xwe dikirin… Kabşikestiyên ku ji siha xwe ditirsîn û bejnên ku ji ronahiyê şewq didan jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Lîstokên ku li gixikan digerîn… Bermayên Buharên pîr û mirûzxwînî… Kesên ku qirêja bajarên kedîkirî ji rojên xwe dadiweşandin û yên ku dem ji porê rojê dihûnandin jî dîtin.
Kurdan çi nedîtin...!
Jinên ku di hîrehîra birûsk û bêzariyê de noq bûbûn… Jinên ku di nav mijangên xwe de ahengên girî li dar dixistin û yên ku roj û şev dikirin serpêhatiyên şanaziyê jî dîtin.
Ey cîhana rûbadayî…! Ma qey kuştin, koçkirin û bêzariya Kurdistaniyan li heza te tê?! Ta çi demê hûnê çavên xwe yên nexel ji xwîna birînên me kildin?!
Ma qey giriyê zarok, jin û pîrejinên Kurdan beşek ji sirûdên welatê we ne?! Ey cîhan…!Tenê carekê li pêş bîrînên Kurdan li ber xwe keve.

**25.04.2018**

**Efrîn: Şêrewa**

## Merwan Berekat

Ji Rojavayê Kurdistanê herêma Efrîn ye. Jidaykbûn 1964z.
Ji damêznerên Saziya Fêrkirin û Parastina Zimanê Kurdî ye. 2006.
Endamê sernivîser ê kovara PIRSê û Rojnama Newrozê ye.
Ji berhwmên wî yên çapkirî û ne çapkirî:

**Bi zimanê Kurdî:**
**Roman:**
1 - Awirên Royê – Roman.
2 - Romana Pakrewanekî Kurd.
3 - Nameyeyên Jineke Kurd.
5 - Penageh.
5 - Efrîn Destane û Birîn.
***
**Helbest:**
1 - Pêlek Ji Deryaya Viyanê.
2 - Çavlirêmayîn.
3 - Nameyên Azadiyê.
4 - Hestên Buharî.
5 – Dilrevînê…!
6 - Zîldana Hêviyan .
7 - Awazên Keseran.
8 - Evîna Zamdar.
***
1 - Wateyên Çîkdayî. Deqine wêjeyî.
2 - Pêkenokên Gelêrî.
3 - Gurzek Stranên Foloklorî.
***

**Ziman:**

1 - Gulistana Zimên ( Kurdî - Erebî ). 2008.

2 - Zimanê Kurdî Fêr Dibim – Asta yekem. 2009.

3 - Zimanê Kurdî Fêr Dibim - Asta Duyemîn - 2012.

4 - Ferhenga Biçûk - Erebî - Kudî - 2012.

5 - Jiyana Zimên ( hin mijar ). 2014.

***

**Bi zimanê erebî:**

**1** - شذا الأيام - شعر- دار عبد المنعم ناشرون، حلب. 2002 م.

**2** - من ذاكرة القلب - شعر - دار عبد المنعم ناشرون، حلب، 2007 م.

**3** - فوضى الرحيل - شعر - دار عبد المنعم ناشرون، حلب - 1010م.

**4** - همسات مملكة البراءة - قصص قصيرة - دار عبد المنعم ناشرون،